



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ

Kovara Dumehane
Sal: 9 Hejmar - 46
Adar - Avrêl 2013

Xwedî û Berpirsiyariya Nivîsaran
Mehmet Aydın ALÖKMEN

Editor - Redaksiyon
Omer FİDAN - Feratê DENGİZİ

Mizanpaj û Berg
Elixan LORAN

Wêneyê Bergê
Recep GULLER

Şewirmendê Hiqûqê
M. Nuri DENİZ

Çapxane
Berdan Matbaası:
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi
C Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 212 613 12 11

Navnîşan
Kalem Sk. No: 32/4 Huzurevleri
Kayapınar/DİYARBAKIR

Tel & Faks: +90 412 237 43 16

E-Mail
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

ISSN: 1309-1476

Şertên Abonetiye
Nava Welat, salek: 30 TL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Nimroya Hesabê PTT'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
590 24 36

- Ji editor / 2
- Pêwendiya zanyarî û felsefeyê - **Adar JIYAN** / 3
- Veger - **Şengul OGUR** / 5
- Mehmed Uzun - **Berken BEREH** / 7
- Xweziyên nêrgiza - **Evîn ŞIKAKÎ** / 8
- Apê Aram - **Îsmail ONDEŞ** / 9
- Rojeke biharî - **Şevger ÇIYA** / 13
- Kurtedîroka Tirkîyeyê - **Cemal SUREYA** / 17
- Helbesta qeşeng - **Fewzî BÎLGE** / 18
- Careke din pirsîyar meke - **Can ÊZÎDXELO** / 19
- Siyamend û Zînê - **Alî Aydın ÇÎÇEK** / 21
- Gîskê birîndar - **Selahattîn ÇAM** / 24
- Tîrsa xef - **Selamî ESEN** / 26
- Têkiliya min a wêga bi dîrokê re - **Mahîr BAGOK** / 29
- Di şerê Corunnayê de çalkirina Sir John Moore-Charles WOLFE / 30
- Rêya Hevrişim - **Rêzan NAS** / 31

- Dosye: **ZEND û Bendên Kovargerîya Kurdî** / 34
- Çarenûsa Zendê ji girêdayî çarenûsa gelê kurd e - **Samî TAN** / 35
- Berxwedana rohnahiyê - **Feratê DENGİZİ** / 37
- Kovara Çirûskê - **Asya GENİM** / 39
- Di kovargerîya Kurdî de cihê Nûbiharê - **Suleyman ÇEVÎK** / 41
- Di kovargerîya ciwanan de kovaroka xwendekarên zanîngehan a zanistî wêjeyî û hunerî "pênGAV" - **Kenanê NADO** / 43
- Di kovargerîya kurdî de rewşa kovarên zarokan - **Nesrîn NAVDAR** / 48
- Kovargerî yan kovarkujî - **Serwet DENİZ** / 50
- Sansur û kovargerîya Kurdî - **Bulent GEDİK** / 52
- Kovargerîya kurmançî û ranêzikîyên zimanî - **Dilawer ZERAQ** / 54
- Ajdanek nû li bexçeyê wêjeya Kurdî - **Hasan KAPLAN** / 56
- Kin û kurt bimire kovarmijî - **Mahmûd LEWENDÎ** / 57
- Du kovarên kurdî ji nava rûpelên fanzîn(Kulîl)ekê derketin; Kulîlka Ciwan û Kovara W - **Sidar JÎR** / 58

- Tiliyên cixiz - **Rûken PEL** / 60
- Hevpeyvîn bi Tongûç OK re - **Îsmail DÎNDAR** / 61
- Name ji bo Mulazim OZCAN - **Ezîzê CEWO** / 66
- Vîr - **Fehmî KOÇ** / 67
- Reşoyê çargurçik - **Cihan TÛRAN** / 68
- Mirovê hemû deman - **Nihayet TAŞDEMİR** / 72
- Navê te çi ye? - **Kurdjan SORÎ** / 73
- Folklorê Kurmancan - **Mehmet Şîrîn FÎLÎZ** / 75
- Ehmedê Xanî û banga tifaqa kurdan - **Cengîz NAMO** / 77
- Ro bû sî li Roboskê - **Songul KESKÎN** / 79
- Belgên hişk - **Jacques PREVENT** / 80
- Bersivên xaçepîrsa Arjen ARÎ - **Îmad BERNAS** / 80

*Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tên şandin, li xwediyên wan nayên vegerandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji edîtor

Dema we xweş be...

Bi hejmareke nû em li pêşberî we ne, bi ruhê Newrozî...

Halbwachs dibêje; bîra sosyalî ne weke tevlîbûneke mîstîk e, xwe dispêre vegotin, sêwirandin û veguherînan, bi kurtasî jî ragihînan pêk tê. Ligel bîra sosyalî bîreke kolektîf jî heye ku bîngeha xwe ne li ser danûstendinên ragihînî; li ser çand, hêma û nîşaneyan datîne. *Halbwachs* bi vê tîgehê balê dikişîne ser bîra komekê ango civakekê.

Em kurd weke civak îro bêhtir motacî bîra kolektîf in. Rojên dîrokî me dixin ezmûneke bêhampa ya pîroz ku encama wê hebûn û nebûne. Dorpêçkirina rikberên me jî her aliyê ve nîşaneya vê ye. Ji ber vê berxwedana me ya hemdemî ku sînor bê wate kirin hêjayî silavkirinê; baldarî, ked û xebatê ye. Bi vê hişmendiya em dixwazin tiştina parve bikin.

Ji girtîgehan nivîs, rexne û pêşniyaz tên ku ew hêzê didin me. Lê divê bê zanîn em nikarin pirtûkan çap bikin, em kovargeriya dikin û nivîsên zêde dirêj ne li gorî çarçoveya me ne. Dîsa helbest pir zêde ne û cî derfetê nade weşana hemûyan û em xwe dispêrin dilxweşiya we. Daxwazên zor, nexasim xwestina pirtûkan me dixê nava dilêşî û bêçaretîyê. Dîsa silav û hurmetên afirînkari li we be...

Hin nivîskarên hêja ligel şandina berhemê pîrsa "hûnê kengî biweşînin?" raserî me dikin. Ev me dixê tengasiyê. Rêgeza me; "berhema ku tê şandin divê li tu derê nehatibe weşandin û di kovare de bê weşandin an jî neyê weşandin ew êdî bi çêtirdîtina edîtorîyê re dimîne, ye". Kovareke nû ya bi Kurdî bi navê *Dîwar* derdikeve. Li gor amadekarên kovare dê kovar çandî, wêjeyî ya mehane be û kovar dê aktuel be. Ligel kêfxweşiyê em serfiraziya dixwazin. Nivîskar û bêjerê radyoya Kurdî ya Tehran û Kirmanşanê Şukrullah Baban di 89 saliyê de wefat kir. Em dibêjin ruhê wî şad be, wan hîmên zindîbûna hebûnê diyarî me kir û wê her bijîn di dilê gelê xwe de. Mehên zivistanê zêde dilê me êşandin mîna roja reş, lê bila ev herca hêza azadîparêziyê bin. Nivîskar, şair û wêjekarê kurd Arşevê Oskan jî, li nexweşxaneyê bajare Hamburgê, li Almanya wefat kir. Em çî bêjin mirina li xerîbiyê jana xwesteka axa bav û kalan e. Divê ev bibe rohnayîya jiyana me.

Li hember lîstika dewletê ya ku qaşo "Zazakî ne Kurdî ye..." hişyarî divê. Ligel şermezariya ku ev ê qet nebe astenga yekîtiya gel û xwesteka azadiyê; xebatên zanyarî û şênberî derdixê pêşberî me. Bi hêza dilsoziya zimanê dayikê; 21'ê Reşemiyê Roja Zimanê Dayikê ya Cihanê pîroz be...

Di 23'yê Berfanbara 2012'an de Kongreya Navenda Kurdî Derê li dar ket. Pîroz be... Em serkeftin, kedkarî û piştgiriya gel daxwaz dikin.

09.01.2013 Qetlîama Parîsê... Qetilkirina sê jinên kurd şermiya Cîhana qaşo demokrat û pêşketî ye... Em ê bi hebûn û berxwedana xwe vê yekê şermezar bikin.

Sê mûmên zîv û zêrîn diyarî SERSALA ME ne,

Sersalên Salnameya Azadiya Kurdistanê...

8 Adara 2013'an, Roja Jinên Kedkarên Cihanê diyarî wan e, bi ruhê Newrozî pîroz be.

Piştî 2625 salan jî bilindbûna ala Kawayê Hesinkar nemiriya gelê kurd e, bi hêza Kawayê Hemdem û Kawayên Jiyane ew ê jiyana gelê kurd bi ruhê azad biherike abadinê. Bihar bila bibe bihara azadiyê ku xwîna ciwanhêzî/ciwanhezî dikelîne.

Newroz/Newroza we/Newroza me Pîroz e, li jiyane û hebûnê Pîroz be...

Bi germiya jiyana azad ku bîra wêje, huner û çandê ye, em bi van dosyeyan li benda afirîneriya pênuşa we ne;

Ji bo hejmarên Gulan & Pûşper û Tîrmeh & Gelawêjê mijara dosyeyê 'Di Çîroka Kurdî de Sî (30) Salên Dawîn' e.

Heta hejmareke din her bimînin bi xêr û xweşiyê...

Pêwendiya zanyarî û felsefeyê Adar JIYAN



Felsefe, hewldana xwenasîn, lêgerîn, derbirîn, şîrove û têgihîştina rasteqîniyê ye.

Taybetiya felsefeyê ya giştî ev e:

Felsefe, ne xebata li ser zanînê ye; xebata lêgerîna zanînê ye. Di felsefeyê de ya girîng pirs e; ne bersiv e.

Felsefe, xwezayê bi tevayî hildide dest.

Felsefe bi xwe, ne zanîn e, belê hemû zanîn ji felsefeyê der dibin.

Azîneya felsefeyê azîneyeke bipergal û hevgirti ye.

Pergalên felsefî di nava xwe de hevgirtî ne belê ne xwediyê çawanîyeke misêwa ne.

Bikêrhatiyên felsefeyê çi ne?

Felsefe mirov dixê nava şik û gumanan û arasteyî meraq û erêna dike.

Felsefe, fikr û ramana mirov berfireh dike û zanyariya mirov zêde dike.

Felsefe, dibe sedema pêşketin û xebitandina demokrasîyê.

Felsefe, gelek şaxên zanînê pêk tîne.

Felsefe, dike ku mirov di her warî de fikr û ramana xwe derbibîre.

Wekî ku me li jor jî gotibû, felsefe ne zanîn e. Belê di navbera zanîn û felsefeyê û felsefe û zanyariyê de têkiliyeke xurt heye.

Zanyarî çawa pêk tê?

Zanyarî, di encama têkiliya obje (tişt) û subjeyê (kirdeyê) de pêk tê.

Ji bo ku mirov bikaribe zanê bi dest bixe, pêdivi bi du behreyên girîng heye.

Yek jê ramîn û ya din jî bîrbirin e. Ango fikirîn û têgihîştin e. Fikirîn û têgihîştin gelek cureyên zanyariyê derdixe holê.

Bi kurtayî mirov dikare cureyên zanyariyê bi vî awayî bisenifîne:

Zanyariya rojane

Zanyariya olî

Zanyariya teknîkî

Zanyariya hunerî

Zanyariya zanistî

Zanyariya felsefî

Zanyariya Rojane:

Ev cure zanîn, di encama ezmûn û tecrûbeyên rojane ên jiyane de derdikeve holê.

Taybetiyên vê zanyariyê ev in:

Bi bûyeran eleqedar dibe.

Xwe dispêre sehekîyan.

Zanyariyeke gelemperî ye.

Ji rasteqîniyê dûr e.

Encameke wê ya teqez û misoger nîn e.

Xwediyê xisleteke bêpergal e.

Zanyariya Olî:

Di zanyariya olî de, têkilya navbera tişt û kirde xwe dispêre hîmê baweriyê. Ji bo wê hewcetî bi çespandina rasteqîniyê nîn e. Taybetiyên wê ev in:

Heyn û hebûnê bi navgîniya baweriyê tîne holê.

Têkiliyên navbera Xweda, xweza û mirov di xwe de dihundirîne.

Ji rexne û nîqaşan re girtî ye; dogmatîk e.

Zanyariya Teknîkî:

Ji zanista bikaranîna tiştên xwezayî ku jiyana mirov hêsantir dike pêk tê. Taybetiyên wê ev in:

Ji sûdwerigirtina pratîk pêk tê.

Bi mebesta ku jiyana mirov hêsantir dike, tê bikaranîn.

Bi zanyariya zanistî re di nav hevhişkariyeke (hevbandoriyeke) xurt de ye.

Zanyariya Hunerî:

Li remz û dawerên (nîşanên) gewzîn û ciwankariyê (estetîzmê) digere. Li ser nîgaş û sehekîyan hûr dibe. Ji hêza behre û nîgariyan pêk tê. Taybetiyên wê ev in:

Xwe dispêre hêza nîgaş û afirîneriyê.

Subjektîv e.

Armanca wê, gewzîn û ciwankariyê.

Zanyariya Zanîstî:

Zanyariya tiştê yê. Objektîv e. Li ser rîknê rexneyê ava bûye. Ji bo misogerkirina giştî hewl dide. Xwe dispêre çavdêrî, dahûrandin û ezmûnan. Li berjeng û delîlan digere.

Zanyariya zanîstê ji sê biran pêk tê:

Zanyariya Formel : Tenê bi tiştê ku di ramanê de di hewê eleqedar dibe. Nirxên mîna bîrkarî (matematîk) mantiq, etîkê (sincê) tê de cî digirin. Azîneya talîlê (deduksiyonê) bi kar tîne.

Zanyariyên Xwezayê: Mijara wê heyîn û hebûnên rasteqîn in. Azîneya îstîqrayê enduksiyaonê bi kar tîne. Zanînen mîna fîzîk, kîmya, bîyolojî, bîjîşkî (tip) û zanîna erdzemînê di vê birê de cih digirin.

Zanyariya Mirovî: Mijara wê mirov û civak e. Derûnînasî, civaknasî, dîrok, ramyarî û erdnîgarî di vê qadê de cî digirin. Azîneya têgihîştinê bi kar tîne. Bi bûyerên civakî eleqedar dibe.

Zanyariya Felsefî:

Zanyariya felsefî, xwe dispêre ramanê. Tenê bi saya hiş û ramanê bersiva pirsan dide. Ezmûn û tecrûbeyên mirov li ber çavan nagire. Mirov aras-teyî hiş û hizirînê dike. Taybetiyên wê ev in:

Tevî (tevayî) û giştî ye.

Li ser kakilê tişt hûr dibe.

Hengirî û aqlane ye, ango rasyonalist e.

Xwedî rêbaz e.

Bi pergal û sistematîk e.

Xwe dispêre hêza nîgaş û pirsan.

Têkiliya felsefeyê bi qadên zanîstê yên din re.

Taybetiyên hevpar ên navbera zanîst û felsefeyê: Rêgezên hiş û mantiq bi kar tîne.

Xwe dispêre azîneyên hişmend û bipergal.

Ji bo ku xwe bigihîne rêgez û zagonan hewl dide.

Ji daxwaza meraq û têgihîştinê der dibe.

Cihêtiya navbera zanîst û felsefeyê

Felsefe, bi kirû û hêjahiyên eleqedar dibe. Belê zanîst, tenê bi kirûyan eleqedar dibe.

Pêşniyazên zanîstê tîne rastandin (tegezekerin). Belê pêşniyazên felsefeyê nayên rastandin.

Di zanîstê de pêşbînî tê kirin. Belê di felsefeyê de pêşbînî nayê kirin.

Taybetiyên hevpar ên navbera ol û felsefeyê

Mijar mirov û xweza ye.

Hebûnê bi tevayî rave dikin.

Cihêdatiya navbera ol û felsefeyê

Zanînen felsefî xwe dispêrên hiş. Belê zanînen olî xwe dispêrên baweriyê.

Di felsefeyê de ya girîng pîrskirina pirsan e, lê di olê de ya girîng bawerîya bersivan e.

Felsefe rexneker e. Belê ol dogmatîk e.

Taybetiyên hevpar ên navbera huner û felsefeyê

Hebûn, jiyan û mirov li gorî jîrayiyeke afirîner şîrove dike û têdigihîje.

Cihêtiya navbera huner û felsefeyê

Felsefe xwe dispêre rastiyê. Belê huner xwe dispêre hestyariyê.

Têgînên felsefeyê zanîne ên bingeîn

Rastî

Rasteqînî

Hîmdarkirin

Rastî: Lihevderketina raman û rasteqîniyê.

Rasteqînî: Ji hişmendiyê dûr e û rasterê bi he-yînen berbiçav (tiştê yê) re eleqedar dibe. Bo nî-mûne, bi tiştên mîna roj, hewa, ax û kevîran eleqedar dibe.

Hîmdarkirin: Divê ji bo pîrsa ku tê kirin spar-tek, sedem û bingeher were dîtin. Zanînen bi navgîna pîveran (krîteran) tê bidestxistin.

Arîseyên felsefeyê zanîne yên bingeîn ev in:

Pêkanî û bêmîmkûniya zanîna rastîn çi ye?

Çavkaniya zanîna rastîn çi ye?

Pîvang û sînore zanîna rastîn çi ye?

Pêkanî û nepêkaniya zanîna rastîn:

Dogmatîzm: Pêkaniya zanîna rastîn diparêze. Di dogmatîzmê de, ji rastî û misogeriya zanîne tu şik û guman nayê kirin. Dogmatîzm, zanîna misoger û neguherbar diparêze. Dahûrandin, lêgerîn û rexne qet nayên kirin. Her wisa misogeriya zanîne ji nayê nîqaşkirin.


Septîsîzm: Septîsîzm, gumankerî/şikberî ye. Û her gav bêmîmkûniya zanîna rastîn diparêze.

Kesên ku vê rêbazê diparêzin, bidestxistina wan a zanîna rastîn ne pêkan e. Lewra ew, her gav bêmîmkûniya rastiyê diparêzin. Kesên septîk (gumanker), angaşt dikin ku, mirov ji ber kêmanîya hest û ramana xwe tu carî nikare zanîna rastîn bidest bixe.

Berî ku bigihîjin rastiyê, şik û guman derdikeve pêş û bidestxistina rastiyê misoger tê astengkirin û gihîştina wê bêmîmkûn dibe.

Veger

Şengul OGUR



Tê li xwe vegerî, herçiqasî nizanibî jî bê ka tê xwe li ciyê hiştî bibînî yan na!..

Şevêk ji şevên heyva gulânê, nîvê şevê bû. Bakyekî hênîk di pencereyê re, perdeya rengqehweyî ya li ber pencereyê dihejand û dikete hundir. Carcaran rûpelên vala yê odayê ji aliyekî mezela wî, bi xuşîniyekê diçûn aliyekî dî.

Beriya bi kêliyêkê wî xwe li ber pêlên muzîkeke berdabû, ku wê muzîkê ew li peravên demeke bihurî ya xembar datanî. Hewl da helbestekê binîvîse ji bonî bîranînên xwe yê ku bi carekê re xwe li ber wî danîbûn û kiribûn ku çizênî bi dilê wî bikevin.

Muzîka ku lê guhdarî dikir ew biribû li ber çemekî ku dilopên baranê bi ser de dibariyan danî bû, ku wê dema ew li ber wî çemî, di biniya wê baranê de rûniştî, herwiha dilopên hêstirên germ jî, hêdî hêdî xwe di keviyên çavên wî re berdabûn û di ser dêma wî re digindirîn.

Gelek sal di ser wê bîranîna wî re bihurî bûn lê wê dema ku noqî nav xewn û xeyalan bûbû, wî rasterast dîsa xwe di wê kêliyê de dîtibû, çûbû, li ber wî çemî, li ser keviyekî şil yê ku li ber çem hatibû danîn rûniştibû û hêstir ji çavê wî rijiyabûn.

Ew bi xuşîniya rûpeleke ku ji defterê hatibû kirin ku bi ber bê ketibû, hay ji xwe çêbû ku niha ew ji wî zemanî, ji wî bajarî, ji wî çemî gelekî dûr e. Dema ku bi vê dûrbûna zeman, mekanî hisiyabû bi carekê re weke ku çiyayek bi ser de bihêrife, qidûmê wî şkestibû û ji dinyayê sar bûbû.

Wê kêliyê, wî bi hemû şaneyên xwe dixwest ku ew niha li wî zemanî, mekanî; li ber wî çemî be, di temenê xwe yê bîst û sê saliyê de be û li ber wî çemî, di biniya wê baranê de, hûrik hûrik bigirî heya ku çav lê sor bibin. Di dilê xwe de got; "heke bibûya û bi tenê saetekê ez dîsa biçûma wî zemanî, biçûma wî bajarî, li biniya wê baranê, li ser wî kevirê spî rûniştima bila ez bimirima." Lê dema fêhm kir ku ev daxwaza wî ne pêkan e, ji cihê xwe yê lê rûniştî rabû û ber bi pencereya vekirî ve çû.

Wexta ku di pencerê re dêhna xwe da derve û li

avahî û perqên li pêşberî xwe meyzand bêhna wî bi carekê re teng bû û di ber xwe de got; "Na, ez ne yê van deran im. Divê ez biçim ji van deran. Ev bajar, ev avahî, ev mirovên ku ku li vê parka han, li bin ronahiya vê çiraya han, li ser wê bankê rûniştî biyanî ne ji min re. Ev ezmanê di ser min re, ev stêrîkên zenûn, ev bayê di pencereya min re dikeve vê odeya min biyanî ne ji min re.

Divê ez biçim ji van deran. Divê ez biçim li biniya wî ezmanî bi cî bibim, ku min yekem car xeyalên xwe li biniya wê rêsabûn, yekem car min di xeyalên xwe de keleh lê ava kiribûn. Divê li şûna vî bayî, ew bayê ku di ser zozanan re dihat û bi xwe re bêhna kulîlkan dianî, di pencereya min re were, perdeya min bilebitûne û xişxişê ji van rûpelên min bîne. Ev bajar, ev kolana ku seraqet erebe tê re diçin û tên, ev parka ku yek dara lê ji bi min ne nas e, ev şewleyên çirayên kolanan ku tenê biyanîbûna min di çavê min re dîkin, hemû bi hev re, bi yekdengî ji min re dibêjin, 'biçe!'

Xwe ji ber pencereyê da alî, berê xwe da hêtê li rasta pencereyê, kêliyêkê çavên wî çûne ser yek xalê û wekî ku biryarek dabe, bi carekê re got; "Temam!", gavekê bê liv û tevger di ciyê xwe de rawestiya û wekî ku bi xwe re pev biçê, bi dengêkî bilind; "Ev tu li çî digêrî li van deran? Li çî!? Ez ji te re dibêjim, 'tê biçî û hew!' Qet dirêj neke. Sibehê, bi berbangê re, tê rahêjê bahola xwe, di vî deriyê re tê derkevî û hew li vê odayê, li vî bajarî, li vî welatî vedigerî. Ebeden tu êdî li vir venegarî!"

Rûyê wî ji qehra sor bûbû. Bûbû yekî dinê wê kêliyê. Te digot qey bi rastî jî yek li pêşberî wî ye û ew pê pev çûye. Bêhn lê çikiya bû. Çixare li ser çixareyê pêxist. Bi carekê re ji odayê derket û berê xwe da odeya li çepê odeya ku lê radiza.

Dolaba ji darê gûzê vekir, baholeke mezin î reş ku ser wê toz girtibû derxist. Bêyî ku paçekî di ser toza wê re bibe, destê xwe avêta xelîtka wê, ew vekir û hin cilên xwe yê di dolabê de avêtin baholê. Dema ku wî cilên xwe ji dolabê derdixistin û di baholê de bi cî dikirin, gav bi gav rengê wî vedibû, li

ser çavên wî şiliyek diçirîsî. Bi her tevgera xwe ya ku wî kincên xwe ji dolabê derdixistin û di baholê de bi cî dikirin, wî xwe gav bi gav nêzî welatê xwe didît.

Pêşî wî xwe di balafirekê de didît, piştî di ser behran re didît, dibihîst ku jê re tê gotin, niha ew li ser welatê wî ne, xwe li ezmanê welatê xwe xeyal dikir, wî ji jor ve, li welatê xwe dinerî, li çiyayên xwe yên bilind dinerî wî. Ew ji balafirê dadiket, baholê xwe diavêt deverekê, kabokên xwe dişikandin, destê xwe datanî ser axê, xwe ditewand, devê xwe digihand axê û ax maçî dikir, digiriya û ax maçî dikir. Ji ciyê xwe radibû, berê xwe dida ezman, li ewrên ezmanê xwe dinerî, kelehên ku di zaroktiyê de lê ava kiribû didît, ew bi per û bask dibû û difiriya ezmanê xwe, diçû ser bircên kelehê, ew û hevalên wî yên zaroktiyê, bi destên hev digirtin û ji xwe re dilîstin. Piştî ew ji ezmanan dadiket, li texsiyekê siwar dibû, berê wî dikete bajarê wî, bajarê zaroktî û xortaniya wî. Bajarê wî yê serhildanan, bajarê ku yekem caran li wir dil dabû yekê, bajarê ku tê de dirûşmeyên azadiyê diqêriya. Wî yê di wî bajarê ku di çiyê de lê kirî, awirek bidaya wê beriya bê ser û ber ku weke behrekê li biniya wî bajarî raxistî, ew ê di ber têlên dirêhî re biçûya, ku parçeyek welatê wî li pişt têlên direhî dima. Ew difikirî û digot; gelo bajarê min çiqasî guheriye? Wekî xwe ye? Lê çiqasî jî guherî be, wî yê mala xwe derbixista, ew ê biçûya, li wî deriyê depî bixista, ku beriya niha bi bîst û sê salan ew li dû xwe hiştibû, bavê wî, diya wî ku ev bîst û sê sal in tenê dengê wî dibihîstin, wê ew nas bikirana? Difikirî, gelo diya min, bavê min çiqasî guherî ne niha? Gelo yextiyar bûne? Dema ku min bibînin ew ê min nas bikin? Difikirî, heke yê ku dêrî lê veke bavê wî be, ew ê xwe bavêje hembêza wî, di kuçeyê de, bêtî ku li eybûnê bifikire, ew ê bigirî, wê bibêje, "bavo, ez hatim, min gellekî bêriya we kiriye" lê na, heke yê ku derî lê veke diya wî be, erê ku diya wî be, wê çî bike? Diya wî jê xeyidî bû, ev demek bû ku êdî pê re nedixavî, ji ber ku wî digot, ez nayê. Erê, digot, heke ya ku derî li min veke diya min be, digot, ez ê xwe bavêjim ber piyê wê, ez ê bibêjim, "yadê, va ez

hatim, min efû bike" ew ê ji xwe bavêje ser min, wê bi destê min bigire, wê min ji erdê rake, rûyê min wê maç bike, wê bigirî, ez ê wê ji giriyê wê maçî bikim. Wê rojê em ê bi hev re bin, heya derengê şevê em ê ji xwe re bipeyivin. Wexta ku roj çû ava, em ê biçine serê bîn, li biniya wî ezmanê mezin ku bêhijmar stêrik lê diçirîsin, em ê rûnin, em ê şîva xwe di bin ronkahiya stêrikan de bixwin, wekî ku em li bajarekî çîrokî bin, teqez, niha cêrek heye li serê bîn, ez ê xarûfka ku benê wê bi cêr ve girêdayiye di cêrê werkim, ez ê avekê jê vexwim wekî ku ji çemê bihiştê vexwim, derengê şevê, piştî ku çaxê xewê hat, ez ê biçim li ser texte xwe dirêj bikim, li stêrikan binerim, li wî ezmanê ku min dev jê berdabû, ez ê ji ezmanê xwe efûyê bixwazim, ez ê ji bîranînên xwe efûyê bixwazim, ew ê min efû bikin, ez ê razim, sibehî dema ku ji xewê rabûm ez ê biçim ber wî çemî, li ser wî kevirî rûnim, wê baranek bibare, ez ê li ber wî çemî li wê muzîkê guhdarî bikim, ew ê bi bîra min be, roja ku ew çûyî, ez ê bixwazim ku bîst û sê salî bim dîsa.

Di nav van xewn û xeyalan de şev lê bûbû sibeh û piça xewê bi çavê wî neketibû. Wî bahola xwe kiribû, cilên xwe, çend pirtûkên xwe tê de bi cî kiribûn û li bendê bû ku

roj bihile û ew jî ber bi balafirxaneyê ve bi rê bikeve.


Beriya ku roj bihêle cara dawîn çû ber penceryê, li ser kursiyekî rûnişt, sê çar çixare ji hev pêxistin. Hêdî hêdî tariyê ciyê xwe ji ronahiyê re vedikir, bêdengiya bajarê ku lê hêdî hêdî şûna xwe ji deng re dihişt. Wî cara dawîn li avahiyan li derdorê, li parka ku di nav bē-

dengiyeke hênîk de diponijî meyzand, li kulîlkên ku weke ku destê xwe jê re bihejinin ku li ber sira sibehî direqisîn dinerî, wî jî destê xwe ji wan re hilda, rahiştî bahola xwe ya reş û ji odeya xwe, ji mala xwe derket, da ku ji vî bajarî, ji vî welatî dûr bikeve, biçê welatê xwe, bajarê xwe, mala xwe, odeya xwe ku tenê giyanê wî dikarîbû li wir aşt bibe.



Mehmed Uzun

Berken BEREH



newayeke xemgîn çemê bi eşq diherike
û stêrka barê wê her evîn
ya li ser Çiyayê Sîpanê direqise

erê salek din bê te dest pê kir
hê war ew war e ya “Memdûh Selîm”
û “Hawara Dîjleyê” ter û teze
sînoran dibezîne, dilan dinexşîne
ew zar û zimanê
te welatek tê de bi cî kir

silavên dildaran radigihîne te
ew kewa ji “Siya Evînê” firî
ji çiyayên te her bêriya wan dikir

welatek tê serdana te
piştî du hezar salan



Xweziyên nêrgizan *Evîn ŞIKAKÎ*

di wê êvara bêguneh de
 janê ez hejandim
 xweziyên ku ji lêvên nêrgiza diherikîn
 bajarekî kurdunde ava dikir
 hêviyên ku ji sînorê xewna derbas dibûn
 xem koçber dikirin
 û bi hezeran êş diweşandin
 ew kulîlkên ku li dora min kom bûbûn
 soza bihareke dirêêj wergirtbûn
 êvar ber bi şevê diçû
 şev ber bi sibehê
 ne şev dibû hostayê avakirina dilê herifi
 û ne sibehê jî wêneyên şermiyê ji ser çavên xwe radikir
 di wê sibeha gunehkar de
 ez ber bi te dihatim
 weke cejnekê bi cilkên xwe yên nû
 weke mêweyekê
 weke sêwiyên
 ku di dumahiya şevê de
 ber bi mala xwe ve diçûn
 û lêvên wan bi ramûsan xemilandibûn

Apê Aram

Îsmâîl ONDEŞ

Vaye, dîsa digindirin li ser laşê min, lerizînên hestewar. Hozanê hêja, şahê bilbilan, Apê Aram...

Vaye, dîsa dikişkişîn min, bîreweriyên şîrîn ên bi te re, yanî bi behra hunera Kurdistanê re. Her bîrewerî ketine pey pênûsa min; ji peraza xweşikahiya te dixwazin yeko yeko biniqutin ser qaxizê. Lê bi min, tu têgeh nikarin bigihîjin wateya heyîna te; tu nivîs, tu stran têrî vê nakin. Heqîqet bi dengê te ji xewa giran rabû ser lingên xwe. Ji ber vê ye, tu dengê heqîqetê yî Apê Aram.

Di dîrokê de kê mînak hene ku bi dengê heqîqetê xewa mirinê çirandine.

Hîz. Muhamed, dema di şikefteke ku li çiyayê Hîrayê ye dengê efsûnî dibihîze. Ev deng jê re wiha dibêje: "Bixwîne!" Li ser vî dengî berxwedana dijwar a Hîz. Muhamed jî dest pê dike. Deng dibe hiş, hiş dibe doz, doz dibe rêxistin, rêxistin dibe civak û serkeftin jî pê re tê. Ango azadî pêşîn di DENG de veşartîye. Tiştê girîng ew e ku; "kî/ê dikare vê dengî bibihîze?"

Dîsa, Îbrahîm pêxember jî, bi heman awayî dengî seh dike. Dengê ku guhên wî mest dike, rastiya jiyana wê demê jî dide der. Deng, li gor warê ku lê ye olan dide. Dengbêj, li gor çanda wargeha xwe distirê. Her tişt bi hêlîna ku lê bûye ve forma xwe digire. Deng xwe jî pêxemberî re wiha ve dike: "EZ, Ez im!" Ango, hişa xwezaniyê (xwebûn) vedibêje.

Lêgerîna xwezaniyê, pîrsgirêkek nasnameyî ye. Civak dem him jî aliyê hişmendiye ve û him jî jî aliyê binyatiyê ve qeyranê dijî, pîrsgirêka nasnameyê xwe lê pêwist dike. Bê guman, çareserîya vê yekê jî di şoreşke civakî re dibore. Civak li benda dengî ye. Kesê/a ku ev deng bihîst jî, li pey lêgerîna jiyana azad e...

Payîz...

Di demsala payîzê de çavê min bi te ket. Di destê te de kopal, tu hêdî hêdî dimeşiyayî. Wekî ew ên ku barê dinyayê li pişt xwe kirine; te jî barê hesreta welatê xwe yê ji te dûr rakiribû. Min jî TVyê bihîstibû vegera te yî Amedê. Xewn û xeyalên te yên ku bi dehan salan in kolî dilê te bibûn, herikîbûn ber bi bircên Amedê ve ango paytexta welatê qedîm.

Dema ku tu li ber şibakê xuya bûyî, min te yê serî di ber de nas nekir. Dema ew kêlî tê bîra min, ez li ber heyfa ciwaniya xwe dikevim. Xwelî li serê min! Min te nasnekiribû Apê Aram. Mixabin, niha

têdigihîjim ku mirov piştî wînda dike qedir didê. Windakirin derî li ber watedayîne vedike.

Windakirin bedêla watedayîne ye li van deran; jiyana bi min wiha da nasîn.

Ku ne şaş bim, dawîya meha Tîrmehê bû. Ev du sê roj in tu hatibûyî. Kêliya ku tu ketî hundirê komaleyê, te serê xwe rakir û te got; "ROJBAŞ!" Ez jî ciyê xwe çeng bûbûm. Li Atînayê dibetîya hevdiîna me hebû, lê ma evqasî zû! Peroşeke şîrîn min ber bi xwe ve dikişand.

"ROJBAŞ!" Yanî êdî bes e ev xewa giran...

Tiştê ku tu bêtîrê vî/î nikarî, ew ên ku xwebûna te diyar dikin in. Xwebûn/nasname yekîtiya çend taybetmendiyan çandî dixwaze. Asta xwezaniyê jî hişmendî-binyatî (ziman, huner, politîka, hiş, erdnîgarî û hwd.) ya ku bêtîrê hev nikarin ve dibare. Dema zerik (binyatî) bişikê tu wateya avê (hişmendî) jî namîne. Ji ber vê ye çand yekbûnekê dixwaze; da ku xwe bi nasnameya xwe bide jiyîn.

Dergûşa mirovahiye Mezopotamya ango erdnîgariya ku Kurdistanê digire nav xwe, pêşîn car guhdariya çanda muzîka bi def û zirne kiribû. Lêgerîna civaka xwezayî wan jî deriyê hunerê derbas kiribû. Wate bibû deng û deng bi hemû gerdûnê re xwe dida naskirin. Êş û janên xwe, xweşî û kêfxweşiyên xwe, gazinc û hawarên xwe bi vî rengî parve dikirin. Dengê def û zirneyê (li gor lêkolînan koka van enstrûmanan digihîje Kurdistanê) hişmendiya civakê jî radixin ber çavan. Ku hîn jî dikarin xwe bidin guhdarkirin, sedema xwe jî vê yekê digire.

Ji do ve bîxew mabûm. Wê şevê nizanim ji bo çi, li komeleyê (Navenda Çanda Kurdistan-Atîna) mam. Dema bû sibe min deriyê komalê vekir û dest bi paqijiyê kir. Pişt re min ji çaya "qaçax" (li penaberiyê weke ava jînê ye, lê wisa tê) qedehek tije kir û ez bi kompîturê mijûl bûm. Di wê kêliyê de tu hatî apê şîrîn...

Me hal, wext jî hev pirsî. Te ji min re rewşa welêt vedigot. Min jî te re çaya welêt dianî. Te vedixwar û digot; "Ez ê dîsa vegeim Kurdistanê; bes e penaberî." Dema tu diaxifî ji peroşa çavên te kenên zarokî dirijîyan. Carinan dihat ew nêrîn dewsa xwe jî nêrînen kewgirî re dihişt. Tehma welêt nîvco mabû li ser zimanê te. Te digot qey bircên Amedê hîn jî têrî dengê te nebûne; te êşên bi dehan salan nedotîbûyî hîn jî. Ji ber vê ye tu dîsa nîvco mabûyî, Apê Aram.



Çavên min ji lêrizînên destên te bi dûr nediketin Min di dilê xwe de digot; “Çiqasî extiyar bûye.” Nexweşiyê dev ji te bernedida. Êşên ku te ji emeliyata dil dikşandin xwe didan der. Li ber çavên min/me dirok diheliya, lê haya mejê tunebû. Ancax îro dikarim têbighîjim; bêteyî mamosteya herî mezîn e niha. Ez jî şagirtê wê bêteyiyê...

Paşê heval jî tevli sohbeta me bûn. Ew jî yeko yeko herikîn komeleyê. Yên ku hatina te dibihîstin, xwe çeng dikirin te. Yekî rewşa te ji te pirs dikir, ê din rewşa Amedê. Yekî Amedî li dost û nasên xwe dipirsî. Pirs pir bûn lê bersiv bêpertav... Dema te behsa cimbişa ku diyariya NÊÇÎRVANÊ HEQÎQETÊ ye, ji me re dikir, ne êş ne jî jan xuya dibûn ji çavên te. Carinan jî tu diketî nav bîreweriyên xwe yên bi “wî” re. Xuyaye ku te pir bêriya rêhevalê xwe kiriye.

Tu ji ciyê xwe rabûyî û ber bi min ve hatî. Ez jî ji ser kompîtura xwe rabûm, min ciyê xwe da te. Piştî ku tu rûniştî te got; “Ka dîmenên min veke, em lê temaşe bikin.” Ez jî bi lez û bez li cem te rûniştim, min got: “Ser sera Apê Aram.” Min dîmenên te yên li Amedê, yên li her ciyên cuda hatine kişandin ji bo te vekir. Dema te li dîmenên xwe temaşe dikir, min jî li te temaşe dikir. Te hemû dîmen yek yek şirove dikir; “... ev jî bernameya pîrozbahiya 50 saliya sala min a hunerê ye, li Belçikayê, di studyoya Roj TV’yê de hatibû lidarxistin...” Tu diaxifi, ez ê wekî te mihacir jî li pey gotinên te digindirîm. 50 sal... Gelo

niha çend sal bihurî ji ser berxwedana te ya ji bo xwebûnê? Pêncî û pênc, pêncî û şeş...?

Vaye, tu nîv sedsalî qîriyayî hest û hawarên welatê xwe Kurdistan. Nîv sedsalê ku çi gotin têrî dîkin çi jî awaz dikarî vebeyînin. Te li ser rengên mîrata Eyşe Şan, Hesên Cizrawî, Mihemed Arif û hwd. xemilandibû dengê xwe. Kevneşopiya ala rastiyê ya berxwedana çanda Kurdistanê te bi vî rengî rakiribû; îro em bi dengê te şad in Aramê dilan...

Bisteke din bang li te kirin; kêliya xatirxwestinê xwe gihandibû ber deriyê komeleyê. Di wê kêliyê de min daxwazek ji te kir. Min dixwest wêneyeke me bu hev re hebe. Armanca min bêmirinkirina wê kêliyê bû bêguman; lê ez e ji ku bizanim ku tu her û her nemir î di bîranînên min de. Ji wê ye qasî wê demê hin jî zindî yî tu.

Me bi hev re wêne kişand û tu bi rê ketî. Li pey te du çavên ku dê carek din xweşikahiya rûyê te yê paqij nebînin mabûn. Ma min ê ji ku bizanibûna, ev hevdiîna min a bi te re him a pêşîn û him jî ya dawî ye. Îro di nav gola xwezîtiyê de diperpîte dilê min. Xweziyên derengmayî û yên bêhêvî...

Muhamed û Îbrahîm pêxember bi dengên ku ji ku de tê ne diyar e ji xewa xwe (civakê) rabûbûn û pêwistiya wî dengî bi cî anîn. Ewan careke bihîstin ew deng û heman car bi pey ketin. Digihîştin Heqîqetê ango Xwedayê xwe. Deng kirin welatekî rizgarbûyî û bi efsûniya wî dengê saz kirin civak.

Ev hezar sal in, “DENG” ji vî welatî dûr neket. Jixwe, tiştê ku civak û ev welat li ser lingan hişt ji deng e. Ne tune dibû ne jî azad. Ne diqediya ne jî rizgar. Bi nakokiyeke mezin birîbûn navika kurdan. Nakokî bûbû rastiyeke ji jiyane. Jiyana ku li pey azadiyê ker maye...

Belê, ker bûbûn kurd ligel dengê kilamên dengbêjên xwe yên awazxweş. Ne carekê, milyon carî olan dabû li her derê, dengên wan ên qîrînêr. Milyon carî deng bû kilam û stran, milyon carî stranan berê xwe da dil û mêjiyên wan. Mixabin kêma car, bûn mêvan di dil û hişên kurdan de. Hinên ku bihîstin jî, têr nekir jiyana. Piştî heman tiştî dagir kirin jîn; mirin, koçberî û ew ên malwêran...

Deng, dema ku kesê/a bihîstî hebe dibe rastiyeke. Bêyî ku bê bihîstin deng bi tena serê xwe tune ye ango ne rastiyeke. Ji ber vê ye hewceyî bi kesê/a ku bibihîze heye. Deng dema tê bihîstin wateya xwe radixe ber kesê/a lê guhdar. Ew kêlî deng dibe hiş û hiş li benda formê ye; da ku bibe rastiyeke. Formbûn jî di rêxistinê re dibore. Divê ew deng bê rêxistinkirin ku êdî dikaribin her guhên ker vî dengî bibihîzin.

Di salên 60'în de NÊÇÎRVANÊ HEQÎQETÊ bi xwendevaniya xwe ji bo dengê Aram DÎKRAN wiha dibêje;

“Divê ev deng azad bibe! divê ev deng nemir e!”

3'yê Gelawêjê bû. Ew roja ne bi xêr. Ez dîsa heman ciwanê penaber, li ber deriyê komeleyê me. Dengin dagir dîkin guhên min; dengên bêdeng! Li dora xwe dinêrim her kes bi yekî/ê re mijûl e. Ji nişka ve xeberek diçirîne vê sehneyê. Ez ê xwelîliser hîn jî bê hay im. Dest diçin telefonan, dora komeleyê vala dibe. Lê ez hîn jî heman ez ê nezan. Pise pis dirîjin ji devan, lê ez kesê jênevexwar im.

Diçim gel ciwanekî ji Rojava jê dipirsim; “Xêr e, çi bûye?” min dibersivîne; “Ew ê ku li cimbişê dixist miriye.”

Mirin? Mirin û kî hatine cem hev? “Ew ê li cimbişê dixist.” Ev çi bersivêk erzane wiha. Kî ye ew ê mirî? Min tenê Apê Aram dîtibû bi cimbişê. Lê na ne ew e. Ku ew bûya wî dê ji min re bigota Aram e. Lê, ku ne ew be kî ye ew ê kurd û him jî li cimbişê dixist. Pirs zêde dibin di mêjiyê min de; guman jê zêdetir in. Dikim nakim nikarim xwe xelas bikim ji vê gumanê. Ji min nayê ku ez ji yekî/ê din re jî bipirsim. Belkî jî, ji bersiva ku guhê min naxwaze bibihîze direvim. Lê rev jî neçar e li ber rastiyan.

Di saetên nîvro de min rakirin ji xewa gumanan. Bi telefonê jê hay dibim ku te rakirine nexweşxaneyê. Bi aliyekê hilmek kûr dikşînim, ji aliyê din ve jî xwe dîsan davêjim behra gumanan;

guman xwe diguherînin pirsê û ez bi lez û bez ji hevalê ku li ser telefonê ye dipirsim: “Çawa bûye? Niha rewşa wî di çi astê de ye? Çi çax ev bûyer pêk hatiye?” Hevalê li ser telefonê, min bi vî rengî agahdar kir;

“Di saetên serê sibê de li mala xwe qeyrana dil derbas dike. Li ser ciyê ku lê ye ji xwe ve diçe. Wî wisa bê liv dibînin û pelepê radikin nexweşxaneyê. Niha li nexweşxaneyê navendê ya Atînayê ye. Wî bi cîhazê ve girêdane. Rewşa wî giran e. Hin heval çûne gel wî.”

Telefonê digirim. Gotinên ciwanê ji Rojava dîsa tînin bîra min. Him li ber xwe/me dikevim, (her çiqas ne hedê min be jî) him li ber te Aramê hêja. Mirov çawa ewqas nezan dibe? Ji nezaniyê wêdetir, çima her tim xemsarî dikevin para me? Ligel wê ciwantiya xwe jî min pir xemgîn kiribû nenaskirina te. Tu bêjî, biqîrî, jiyaneke nîv sedsal raxî li ber û dûvre tê bê jibîrakirin. Ew ê navê te bibe, “Ew ê ku li cimbişê dixist!” Nikarim vê rewşê şîrove bikim. Bi min tu wateya şîroveyê jî nîne.

Li xwe mikur tîm; Ev e rastiya me ya trajîk. Rastiyeke wisa ye ku nîv sedsal e diqîre hin jî nikare bibihîze. Ligel ewqas pêşveçûnê civakî ji nexweşî dev ji me neqeriyaye.

Nexweşiya herî mezin a hişmendiyê ye. Nasname, xwebûn yekemîn pirsgrîkên civakî yên hişmendiyê ne. Deng, rê ye li ber hişmendiyê. Him rê ye him jî rêbaz. Ango rê-rêbaz bûne yek. Rê ye; li pey heqîqetê te dikişîşîne. Rêbaz e; rastiya civaka te diikare li te vebeyîne. Ji ber vê ye mirov bêyî deng winda ye.

Li Kurdistanê deng hezarsal in olan daye. Îro kurd çanda xwe (ango xwe) bi van dangan radikin vê rojê. Yek deng, yek çiya. Ev in ku kurd bêyî van nikarin. Ji ber wê ye heta ku deng û çiyayên erdnîgariya qedîm azad nebin, em jî ne azad in. Nexweş in. Ew nexweşên ku li jînê wekî miriyan in. Ji ber wê ye mirov du car dimire li vî welatî. Ji ber wê ye Ezraîl hemwelatîyê vê erdnîgariyê ye...

Roj 6'ê Gelawêjê bû. Di saetên nîvro de ji mal derketibûm. Dîsa min berê xwe dabû komeleyê. Heman fikarên min ên di derbarê rewşa te de xwe dadîqurtandin ber bi dilê min ve. Gelo tu çawa bûyî? Bi hişmendiya xwe ya îro tediğihîjim ku, ez li ber dengê ku hêdî hêdî ditemirî diketim. Deng, yanê tu yê awazxweş. Tu yê ku him bi hunera xwe him jî bi girêdayîbûna xwe ya bi Tevgera Azadiya Kurdistanê re bûbûyî dengbêjê azadiyê. Û tu ew deng î ku li pey te gelek şervanên vê doza birûmet bûne rêvan; Hozan Mizgîn, Serhad, Şiyar, Delîla û gelek şehîdên mezin ên qehreman.

Min ev du rojên dawîn bi kilamên te barandibû. Dilê min bi te tijî bibû û min dixwest dîsa tu bibêjî

Aramê nemir. Da ku em bi awaza te xwe berdin behra Wanê û şevên Cîgerxwîn ên bêyî lawê xwe; em bibin ew bilbilê bavê te Melîkyan û her û her li pey dengê te biherikin behra hunera te ya dîrokî...

Hîn jî zindî ye di bîreweriyên min de; çawa ku ketim komeleyê, rûyên qehrdar min pêşwazî kirin. Tu peyv nedihat gotin lê pistepisa qîrînan ker dikirin dilê mirovî. Ez jî ketim pey vê atmosfera hestewar a strana Ermenîkî ya bi navê “Sari Gelîn” bi dengê te pêl bi pêl belav dibû. Min berê xwe da TVyê; di kanala Rojê de dîmenên te yên rûken dilîst; di binê dîmenan de nivîseke ji tûjahiya xîngerê tûjtîrîn; “tu yê her û her di dilê me de bî.”

Li vir çî binivîsînîm jî dizanim tu tişt nikarin têrî wateya wê kêliyê bikin. Jixwe tu car, tu gotin negihîştîye wateya heqîqî. Ancax dikarin di qiraxên hêjahiya te de bigerin peyv. Li gel vê jî her gotina ji bo te bi wate ye.

Di sed sala 20’în û 21’emîn de Deng xwe li ser zimanê Aram DÎKRANÎ dabû der. Ligel hemû siyasetên piştaftin û qirkirinê ku li ser gelê kurd dihat meşandin jî; wî çirand tîrsa hebûniyê. Rê ew bû, rêvan jî ew. Dixwest rastiya penaberîya kurdan û welatê wan Kurdistan bide bihîstin. Berxwedan, dema li axirê azadî hebe xweş e. Azadî jî ji berxwedanê dibare. Bi vê rastiye re, li welatê bindest yek jê çira ew bû; îro çiraya xwe bi Tevgera Azadiyê mezin kiriye û bûye agirê azadiyê.

NÊÇÎRVANÊ HEQÎQETÊ jî bo rastiya dengê Aram Dîkran wiha dibêje:

“Min ji zaroktiyê ve kilamên Kurdî guhdar kiribû. Meyremxan û birayên Cîzrawî pêşîn dengên ku dihatin bihîstin bûn. Lê belê, di şert û mercên Enqereyê de pêşîn car bihîstina min a dengê Aram bandorekî cuda li ser min çê kir. Piştî, dema ku min şîrove kir, ez gihîştim wê encamê ku ev dengêkî nêzikî rastiya kurd, bi taybetî jî rastiya gelê kurd e û heqîqeta wê dianî zimên. Bi vê sedemê min pejirandibû ku huner awayê rastiya heqîqetê ye. Di naveroka wî dengî de him bangêk ji rastiya kurd re hebû, him jî wekî naverok “evîna bêhêvî” dianî zimên” (MŞK)

“Evîna bêhêvî” dişibe jîna mirovên bêgiyan. Dişibe dara hişk a stûxwar... Kok lê ye, lê nikare hêşîn bibe. Mirov li jîne ye lê nikare bi azadiyane bijî. Wekî gelê kurd ê bextreş û jî qedera xwe re dilkirî... Wekî guhên ker ên ji dengên re girtî. Ji bo vê ye “BIHÎSTIN” şoreş e li vê erdnîgariya evîna bêhêvî. Bihîstin wekî Muhamed û Îbrahîm pêxember bilivbûyîn û tevgerbûyîn e. Pêwistiya dengî jî ancax bi vî rengî dikare bi cî be. NÊÇÎRVANÊ HEQÎQETÊ jî wekî Muhamed û Îbrahîm pêxember ev denga bihîst; lê ji dengê wan ê temirî wêdetir, dengê “wî” hîn jî zindî ye û ew ê

her û her zindî be...

Heman roja ku tu gihîştî mertebeya nemirtiye. Pêl bi pêl hatin dost û hezkiriyên te. Me dixwest daxwaza te ya dawîn binin cî. Her çiqasî di jîna te de em nebûbûn layiqê te jî, fersendek ketibû destê me. Te dixwest tu li Amedê werî veşartin. Hemû sazî û tevger ji bo vê daxwaza te ya dawîn ketibûn nav liv û tevgerê. Hevala Sakîne Cansiz, hunermen Kawa û berpirsiyara têkiliyên derve ya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê hatibûn Atînayê û li komeleyê ji bo vê berpirsiyariya girîng bi awayekî serkeftî binin cî çî ji dest dihat dikirin. Tu cî, tu saziyên fermî (ji Ewropa heta Tirkiyeyê) neman ku wan serî lê nedan. Lê ligel hemû peyaman jî deriyên dewleta Tirkiyeyê li ser me dihatin girtin.

Belê Apê Aram; îro ne hebûna te “tunebûna” te jî tirs dixist dilê pergalê. Nikaribûn barê gora te jî rakin. Mirina me jî “tehlîkeli” ye li gor vê hişmendiya faşîst. Qaşo “belge yetersîz” e. Wey li halê me kurdan; heta cesedê me ya bînketî jî dikişîne êşa hesreta welêt.

Ne şaş bim, roja 9’ê Gelawêjê darbesta te anîn ber komeleyê. Tu bi rengên kesk, sor û zer xemilî bûyî; wekî her û her tu bûyî. Rengên ku di jiyana te de te hembêz dikirin, îro jî dest ji te bernedidan. Jixwe tu bûbûyî reng û dengên hemû Kurdistanê.

Beriya ku darbesta te were bi qîrînen hevîna te tîjî bibû taxa komeleyê. Dema ew jî erebeyê peya bû, dest bi kilama te ya bi navê “Behra Wanê” kir. Him hêdî hêdî dimeşîya û him jî stran dilorand li ser çûyîna te. Min xwe çeng kir destên wê û em bi hev re ber bi komeleyê ve ketin meşê. Ev kêlî nediqediya, te digot qey em li ciyê xwe asê mane û dem li xwe qulipiye... Zor û bela dimeşîya, di destê min de. Ew jîna bargiran, dayika zehmetkêş, li gel êş û keserên dilên xwe vala dikir jî, dîsan sewta wê sar nedibû.

Belê Apê Aram, duyemîn hevîdîna min a bi te re li ser darbesta te pêk hat. Me ji bo te rêzgirtin pêk anî; yeko yeko me gul danî ser te yê bi ala azadiyê xemilî... dû re tu çûyî. Tu çûyî û êdî ev bîreweriyên hêja man di kîsikê min de. Ez ê nezan, niha ancax têdigihîjim ku tu ew Deng î.

Tu car ranabe dengê te yê pîroz ji ser vê axa qedîm. Ji ber ku dengê te, vedibeyne rastiya me. Dengê te, me bi xwe û Heqîqeta me hesand.

Ew deng e, nayê jibîrakirin; da em azadiya gelê xwe bibînin...

19.09.2012 / Girtîgeha Tîpa D ya Amedê

Jêrenot: Ev nivîs bîreweriyên min ên bi Aram Dîkran re ku li Atînayê hatine jiyîn digire nav xwe.

Rojeke biharî

Şevger ÇIYA



Rojeke biharî bû, sihara sibê bi dengê mela şiyar bû, mela telqîna yekê dixwend. Çû tuwaletê, vege-riya ser nivînên xwe, li ser rûyî wî kenekî konetî hebû. Hêviya roniye ma, çavên xwe girt, xwe gevi-zand lê ne xewa wî hat ne jî hewiya. Di nav xeyalan de winda bû, bi dengê diya xwe şiyar bû. Cilên xwe li xwe kir, bêyî ku taştê bixwe berê xwe da dikana xwe. Di rê de çend poxaça stendin ji pastaxaneya serê rê. Sira bayê hinavê wî ricifand, pêşiya saqoyê xwe girt, kumê saqo kişand ser serê xwe, bi hilma xwe destên xwe germ kir. Wexta gihîşt ber dikana xwe, şagirt hatibû, derûdor paqij kiribû, çayê da-nibû ser êgir, Qado hê dikana xwe venekiribû. Kur-siya xwe avêt ber derî, tavê li nav çavê wî dixist, çavên xwe kurkusand, bêxewbûnê xwe anî bîra wî, bi bêhemdî çavên wî çûn ser hev. Siyêk hat roja wî asteng kir, yekî lingên xwe li lingên wî xist. Çavên xwe vekir, Qado bû.

-Bacenax tu çi dikî?

Ji peyva bacenax pir sil dibû, Qado ji bo wî hêrs bike her dem wiha digot.

- Tiştêkî nakim, min xwe dabû ber tavê. Te taştê xwar?

- Na

- Baş e, em bi hev re taştê bixwin.

Çaya xwe anîn, poxaçayên xwe xwarin. Tîna rojê her ku diçû zêdetir dibû, kolan her ku diçû qereba-lixir dibû. Îro roja dawîn bû. Dê ew kar êdî bihata kirin, an serkeftin an na, an zengînî yan na, an mê-ranî yan na, îro dê her tişt kifş bibûya. Ne wî jî Qado re tiştêkî got ne jî Qado ji wî re. Dîsa kenek hat li ruyê wî rûnişt. Qado çûbû hindurê dikana xwe, tezgeha xwe sererast dikir, ser tezgehê paqij dikir. Ew jî çû hindur, aliyê rastê yê saqoyê xwe rakir, demançaya xwe bi Qado nîşan da, Qado kenîya got;

- Tu dizanî biteqînî?

- Hê te ji nan re digot epo me demançe diteqand bacenax.

Bi bihîstîna peyva bacenax re Qado bişirî. Ji nîşkê ve destê xwe bir pişt xwe demançeya xwe der-

xist, gule da devê demançeyê got;

-Çardexwir e ha, mejiyê mirov belav dike.

Dîsa bi lez û bez, bi pisporî û hinêkî quretî fişeka devê demançeyê derxist, demançeyê kir pişt ke-mera xwe.

Qado hinekî dînik bû, pir wêrek bû, belkî jî ji ber wêrekiya wî xellkê jê re digot dînik. Ew û Qado cîran bûn, ew berber bû, Qado jî araqqiroş. Li din-yayê weke hev dinêrtin, herduyan jî hezdikir ku qala mêraniya xwe bikin, qala wêrekiya xwe, qala pevçûnên xwe bikin. Her ku qal dikirin zêdetir li ciwanmêriya xwe sor dibûn. Pîrî caran hêvî dikir ku li kolanê, li qehweyê, li aşxanê angû li ciyêkî rastî neheqiyê bihata, rast bihata ku mêrikê qerase li za-rokekî dixê, dizek diziyê dike, xortek keçikekê aciz dike û li yê neheq bixista, dawiyê bihata fortên xwe bikira, yek bikira sed, xwe bipesenda lê mixabin ev bûyer pir pêk nedihatîn, angû ne wî ne jî Qado fer-send nedidîtin ku mêraniya xwe nîşan bidin. Herdu jî dihiziriyên ku mirov nikare bi karê rojane zengîn bibe, lewra hewceye mirov tiştêkî bike, an bacê jî zengînan bistîne, yan narkotîk bifroşe, yan jî ban-keyekê bişelîne. Ya dawî ya wan bû, bû sê meh e ku plana xwe çekiribûn, demançeyên xwe stendibûn, kifşa plana xwe kiribûn. Tirs ne karê mêran bû, tirs li ber dilê wan tune bû, heke bitirsîyana jî li xwe mikur nedihatîn. Her du jî xemsar bûn, qet şik li ber dilê wan tune bû, fikara pişt bûyerê, tiştên xirab nedihat bîra wan.

Dana êvarê piştî banga melayê esrê, wî dikanê xwe li hêviya şîrikê xwe hişt, Qado jî ba birayê xwe kir. Li otomobîla xwe siwarbûn, ji Deriyê Çiyê, berê xwe bi aliyê girtigehê ve kirin. Li koşeya jorîn a gir-tigehê li aliyê çepê zivirîn, kuça duyemîn li ser destê çepê dîsa vegeriyan, li nav sikaka ku erebeya bankê dihat ji wir derbas dibû derdiket ser papûra mezin, sekinîn. Li wê esra teng zarokên Diyarbekirî yê feqîr bi kincên qetandî, bê pergal, ên mezin û biçûk tevlihev bi gogê dilistin, jin ketibûn tatêla nanê te-nûrê, li ser her tenûrekî sê çar jin li hêviya dora xwe bûn, wexta xatirxwestina rojê dihat, siya bîneyan

dirêj bûbû, bi windabûna tavê sermayê zora mirov dibir. Li saeta xwe nihêrt, erê wext bû, erebeya xwe bir li nava rê sekinad, devê qapûtê vekir, Qado hat kapaxa qapûtê vekir, sekinîn. Transita reş, bi lez û bez ku dixwest bigihîje kargoya balafirgehê li serê kûçeyê peyda bû. Her duyan demançeyên xwe, ku gule di dev de amade, di bêrikê wan de bû, pelandin. Çavên Qado ket nava çavên wî, kenek hat li ser rûyê wî venişt. Ev ken kena teqezîyê bû, kîngê baweriya xwe baniya ku êdî tiştêkî bike nemaye, baş xirab êdî çî dibe dê bibe, tiştê ji destên wî nayê, dev ji fikrandinê berdida, bi vê devjêberdanê kenêkî mirûzî li ser rûyê wî peyda dibû. Transita reş hat li pişt wan bêgavî sekinî lewrarê hatibû girtin, Qado çû ber ajoker û got;

-Hun dikarin aliyê me bikin, erebeya me xerab bûye?

Ajoker bi nêrînên şikbar û tirsok li Qado nihêrt, deriyê transîtê vebû, parêzvanê transîtê di dest de tivînga wî peya bû, li dora xwe nihêrt li pişt stûyê xwê pêjna hesin hîs kir, hêdika berê xwe vegerand demançeyê li pişt stûyê xwe dît. Ajokerê ku ji neynîkê demançeyê dît, ji nîşka ve pê li gazê kir, transît li erebeya wan qelibî, erebeyê xêz kir, dehfêk li erebeyê xist û çû. Qado çend gule li transîtê reşand lê derba xwe negirt, bi dengê çekê qarewarek bi jinan ket, zarokan dev ji listika xwe berdan, di nav kêliyê de kûçe vala bû. Ew, Qado û parêzvanê bankê man bi serê xwe, ewlekarê bankê li ciyê xwe mat bûbû, Qado hat demançeya xwe da nav çavê mêrik, hê nû Faris varqilî ku dê Qodo mêrik bikuje. Mêrik bi çavên lavekar li Qado dinêrt, Faris hat bêtî ku tiştêkî bibêje demançeya Qado jê stend. Ji Qado re got xwe bavêje erebeyê, li erebeyê siwar bûn, winda bûn. Parêzvanê bankeyê hê jî li wir sekinîbû, xwîn ji laşê wî kişiyabû, rûyê wî bûbû weke siwaxa dîwêr, nola ji ser hişê xwe biçe, bi çavên nenas li dora xwe dimeyzand.

Bayekî sar ku bi tarîbûnê sartir dibû nava otomobilê tije dikir, nêzîkî du saetan bû ku di rê de bûn. Piştî ceribandina têkçûyî, hemû polêsên bajêr li wan digeriyan. Wan jî bi vê rastiye dizanibûn, pê li xaza erebê kiribûn, di nav çend deqîqeyan de Seyrantepê, Tilelo derbas kiribûn, niv saet piştî qereqola Karazê li pişt xwe hiştibûn. Tarî ketibû erdê, riya wan hindik mabû, tarî hem baş e hem jî xirab e lewre dewlet jî ji tariyê ditirse, lê ev tirs jî hem baş e hem xirab e. Baş e, tu nekevî ber çavê dewletê tu ji menzîla dewletê dûr bikevî dewlet te ji dûrî ve bibîne jî têkilê te nabe, xirab e, di vê tariya hanê de tu bikevî dehîka dewletê tu bibî lawê azraîl jî tu nikarî xelas bikî, çiqas çekên dewletê hebin hemûyan li ser te diceribîne. Bi banga melayê îşayê gihiştin gund. Sira bayekî cemidî hinava mirov

dicemidand. Muroyê pisxaltiya wî tenê li gund bû, Muro yekî hîlebaz, qurnaz, diz bû. Li ber apê xwe li Diyarbekir ajokerî dikir, par havînê ku apê wî mehekê ji bajêr dûr ket çû derveyê welat ji bo karê xwe, Muro xasilat hemû berhev kir, çû bi wan pereyan eşyayên spî stendin. Piştî ku ew eşya buha bûn, ew firotin û çend caran wiha pere qezenç kir. Apê wî vegeriya, xasilatê xwest, Muro îrosibê kir, ha îro ez dê bidim te, ha sibê ez dê bînim, qeyrana aborî rû da. Welat li binê zikê hev ket, devalûasyon, topavêtin, bêkarî, xwepêşandan, jiyana aborî li bajêr sekinî. Muroyê ku eşyayê spî kiribû dê derba dawî lêxista dûre pereyê apê xwe vegeranda, lê ket ber diranên qeyrana aborî. Malên stendibûn hemû di dest te teqiya, ji bêgavî bi nivbûha mal firotin bêtî ku xebera kesî pê bixe, bîst berxik stendin û berê xwe da gund. Gundê talankirî ku kes lê nedima, dewlet her çiqasî weke berê tund nebe jî, bi awayê fermî destûra çûna gund nedabû lê pir jî eleqeya çûn û hatinê nedikir. Xaniyê bavê Muro yê du tebeq, bi şewatê tebeqeya jor rûxiyabû, axûr û kadîn sax û saxlem bûn. Muro berxikên xwe kir ka dînê ew bi xwe li axur bi cî bû.

Ew û Qado li binya gund peya bûn, êdî şevê dinya pişavtibû, li asîman heyveke birqoq, stêrên cur be cur ên mezin ên biçûk ên dûr ên nêzîktir dinya ronî dikirin. Liv û tevgerek li gund tune bû, li ser kaniyê rûniştin. Ava kaniyê ji dinyayê germtir bû, dest û rûyên xwe şûştin, têr avê vexwarin. Dengê pişkîna berxikan hat, piştî çend deqîqeyan Muro, di dest de kodika avê berê xwe da kaniyê. Du qeretûn li ber kaniyê li ser tehtên nimêje sekinî bûn, Muro tirisî, hêdika kodikên destên xwe danî erdê, xwe xûz kir bi gavên bêpejn xwest vegere ciyê xwe lê Qado ew dît. Bi qasê Xwedê deng dabû pê got 'Murooooo' can li Muro tevizi, hiş ji ser çû, benz avêt, dinya li dora wî gindirî, weke bivirekî bê li orta piştê wî bikeve û ew bike du parçe destên wî lerizin ji ser hişê xwe çû. Muro anîn axurê, ango mala Muro, ew kirin nava nivînan, axur germ bû. Niv saet şûnde Muro hat ser hişê xwe, rastir li xwe varqilî, çavên xwe vekir, ji nav nivînan pekiya, piştê xwe da dîwêr, ji bêrika xwe qutiya cixareyê derxist, çend cixareyên qalind lefandibûn, yek bêtî ku peyvekê bibêje direjî Faris kir, yek dirêjî Qado kir. Çavên Muro bûbû nola gola xwînê, car caran bêhemdê xwe çavên wî dihatin girtin, serê wî dileriziya, ji nîşkê ve serê xwe radikir, çavên xwe beloq dikir, weke li cihaneke din be, bi xerîbî li dora xwe meyzand. Qado û Faris cixareyên xwe pêxistibûn, bi hilma ewil her duyan jî fêr kirin ku Muro esrar pêçabû. Bişîrîn, cixareyên xwe kişandin. Muro cixareya xwe ya nivco avêt ber lingê xwe bi sola xwe cixare xar kir. Ji xeynê kuxîna berxikan deng tune

bû, Muro ji nîşkê ve got;

- Hûn dizanin apê min ê Kero şair e

- Çiye?

- Şair

- Şîrên quzê diya xwe çêdikir qey, ji ber vê yekê tenê kalê te ji şîrên wî fêm dike!. Qado got û kenîya, Faris dewam kir:

- Mirov tiştên nebîne nikare fêhm bike. Yê dîtîyê zana ye. Ha quz ha şîr, çi ferq e! Me tu şîr mîr nedîtîyê heta niha.

- Na na min şaş got, dengbêj e.

- Erê tu, bavê xwe, diya xwe, apê xwe hûn hemû dengbêj in, na na min şaş got hûn şair in. Got Faris. Qado û Faris bi hev kenîyan.

Bi kişandina esrarê xwîn li laşê wan germ bû, damarên canên wan sist bûn, bawîşkên rehetîyê hatin wan, dinya hê zûtir li dora wan geriya, di zilamata nîvê şevê bi xeyala rojavetînê, bîranînên bi-çûkiyê, bi xeyala rojên dilşahiye xweşhaliyek hat li nava axûrê wan konê xwe veda. Muro dîsa çavên

xwe ji nîşkê ve vekir, destê xwe yê rastê bir ber guhê xwe û kir qîrîn;

“Ez dê ji derdê dilê xwe re bibêjim Têlî, gundo vê sibeyê gava dimirim bibêjim Têlî, ez şûstîm vê sibê bibêjim Têlî, kefen kirin bibêjim Têlî, tu dêhna xwe bide vê sibehê dame ser dar û darbestana bibêjim Têlî, bi rê xistin bibêjim Têlî, bêrê min dane qebr û qebriştanan bibêjim Têlî, danî me qebra reş û tarî bibêjim Têlî, siwala ekil û nekil de bibêjim Têlî, telqîna mele de bibêjim Têlî * ”

- Lawo, mirov dibêje qey Şakiro kalê Muro ye.

- Têlî jî pîrika wî ye.

- Ne tenê ez, gundî hemû qal dîkin dibêjin wexta apê min ev kilama digot ev çiyayên asê dihejiyan kuro, herin ji mezinê xwe bipirsîn.

- Heke tu ewqasî ji apê xwe hez dikî çima te pereyên apê wî xwar.

Muro bersivand;

-Pereyên wî pir in.

Her sê bi hev re di xewê re çûn. Bi bêhna vere-



şînê Faris çavên xwe vekir, bilqebilqa Qado bû, ve-direşiya. Faris got

- Bacenax mirov dibê qey cara ewil e tu dikişînî û keniya. Qado dengê xwe nekir. Dîsa got bilq vereşiya, piştî hat ciyê xwe rûnişt, dinya sartir bûbû, Qado li saeta xwe nihêrt. Saet sisê û çarîkek bû.

Muro li ciyê xwe nebû, deh deqîqe şûnde Muro bi kelecana ket hundir, got;

- Werin em herin nêçîra kîvroşkan.

- Çi?

- Kuro, derûdor tije kîvroşk in, werin em herin nêçîrê. Em dê sibê çi bixwin?

Bi çavên tinazî, nezani, şikbarî Faris û Qado li hev nihêrtin. Muro ji bo wan qanih bike got; "Ez her şev diçim, werin hûn dê bibînin ka çawan her çar aliyê gund ji kîvroşkan mişt e."

Hersêyan saqoyên xwe li xwe kirin, derketin nêçîra kîvroşkan. Nêzîka 200-300 mîtro ji malê wêdetir Muro tiliya xwe ya eşhedê bir bir ber devê xwe îşareta hişbûnê da, Muro xwe xûz kir ji erdê kevirekî mezin bilind kir, bêpejn meşiya, kevirê destê xwe ji nîşkê ve li kevireke din xist û xwe avêt ser kevir, kir qîrîn

- Zû zû werin min ew girt, Qado te kêr anî, lawê kehpikê çi dikenî? Bazde here kêrê bîne, bazde, a niha mirar dibe, Qado lawê qûndeyê here kêrê bîn..

Qado û Faris ji kenan ziko piştî bûn. Muro dev ji kevirê xwe ango kîvroşkê berda, hat li hember Qado û Faris sekinî got

- Qado, çima tu kêrê naynî, lawê kîrquzde.

Qado destê xwe kir bêrika xwe kêra xwe ya şehsî derxist got;

- Yeka din bigir, vêca bi sozê Xwedê ez dê kêrê bidim te bila mirar nebe. Bi serê apê te kim ez dê kêrê ji te re bînim.

Muro dîsa xwe xûz kir, çavên xwe kurkusand li dora xwe meyzand got na, ji vir çûne divê em hinekî wêdetir biçin. Sê camêr di tava heyvê de, di seqema sibê de ku teqrîbî saetek şûnde dê dinya ronî bi-bûya, bi bayê ji çiya ku bîhna tenêtiyê jê dihat meşiya. Qado û Faris hêdî hêdî ji bandora esrarê xilas dibûn lê Muro hê jî serxweş bû. Qado bi dengê pis-tepist got;

- Muro, li pişt wê deviyê binêr xîstexîst tê. Ez dibêim li wir kîvroşkeke mezin heye.

Muro careke din îşareta hişbûnê da, xwe dîsa xûz kir, kevirek ji erdê bilind kir, bi faqên bêdeng meşiya, Qado û Faris ji li dû bûn. Kevirê ku bilind kir bi hemû hêza xwe dîsa li kevirê erdê xist, xwe avêt ser kevir di wê kêliyê da dengê megafonê hat;

-Teslim olun**

Her sêyan li hev nihêrtin, fişekeke ronîkirinê hat teqandin, heman deng dîsa dubare kir;

- Teslim olun**

Ji tirsan, ji nezaniyê Qado û Faris ji xwe avêtin erdê, Muro hêjî kevirê ku digot kîvroşk e girtibû hinekî din xwe bi kevir ve dijidand. Deng biliya, tu tevger tune bû, bayekî sar hat weke wan şemaq bike li rûyê wan xist, Qado û Faris hatin ser hişê xwe. Ev tiştên dîtibûn xeyal bû yan rast bû bi çavên şikbar li hev nihêrtin. Qado bi tirsonekî hinekî serê xwe ji bin deviyê rakir li dora xwe meyzand, bû şeşşeşa G-3'yan. Li dora wan weke baranê gule dibariyan, guleyek hat di ber çavên Muro re derbas bû, li ber serê Muro li erdê ket. Muro bi tevgereke lezgîn xwe ji ser kevirê da alî, xwe li ser piştê dirêj kir, saqoyê xwe, qazaxê xwe derxist, îçlikê xwe ji xwe kir, destê xwe bir nava deviyê, peland, çovêk ji nava deviyê kişand, îçlikê xwe li ser çov lefand, çov bilind kir û kir qîrîn;

- Teslîm, em teslîm dibin.

- Lawê kehpikê, çima kurmançî xeber didî.

- Min bi kurmançî got? Tiştêkî nabe bila me ne-kujin bes e.

- Teslim, teslim oluyorum***

Dîsa deng li dinyayê biliya, dengê xwezayê tenê dihat. Tava heyvê tunebû. Van demên pêşiya rojavêtinê demên herî tarî yê rojê ne. Li ciyê xwe bê-pejn sekinîn. Dîsa fişeka ronîbûnê avêtin, dinya ronî bû. Firokeyek hat li dora wan geriya, li jorê wan leşker danî. Lembekeke destan ku qasê lem-peya sikakan derûdorê ronî dikir, ciyê wan ronî kir. Weke leşkeran ji wan dixwest yeko yeko rabûn, her du destên xwe dan piştî stûyê xwe, bi livên hêdî herket kirin. Bi aliyê leşkeran ve meşiya. Nêzîka 20 mîtroji ji leşkeran wêdetir sekinîyan, bi fermana leşkeran xwe çipuryan kirin. Teslîm bûn.

Ji klama Têlî ya Şakiro

** *Teslîm bibin*

*** *Em teslîm dibin*

Kurtedîroka Tirkiyeyê

Cemal SUREYA

Wergera ji Tirkî: Rêdûr DÎJLE

I.

Katikê Zeytûnê
Dafilîne
Sûlavkê;
Celalî me
Celalî yî
Celalî ye.

II.

Tu di nava
sê makezagonan de mezinbûyî:

Yek jê darcêwî
Yek jê gul
Yek jê rûl.

III.

Navê Tirkiyeyê,
Ji zagona paşnavan û bi vir ve
Tu carî ji navê Ataturk
Vedernebû:

Di salên 1930'î de
"Etîrtirkiye";

Di salên 1940'î de
"Atetirkiye";

Di salên 1950'î de,
"Ûdîrtirkiye";

Di salên 1960'î de
"Otetirkiye";

Di salên 1970'î de,
"Atatirkiye";

Di salên 1980'î de,
Aditirkiye;

Û rêwîtiyên şîn jî hene,
Di wan rêwîtiyên Yewnanî û xweşik de,
Hema her tim:
"Adatirkiye."


IV.

Di wan salan de,
li welatê me
Bi hikmên têvel
Ji heftê û du zimanan
Dudu jê hatibûn qedexekirin:

Yê duyem; Tirkî.

V.

Li qehwexaneyê efser tune,
Ev çi kar e!



Helbesta qeşeng

Fewzî BÎLGE

Ji bo Arjen Arî

Di şevên şoreşê de şevçirak
destbirak
Li ser xakek windabûyî dilçak
Kenê me û te xwe ji pêşerojê re vedişart
Kes ne bê kes
Zeman dereng dima li wan diyaran
Bindestî pir zeman
zahferan
Di bin hişê me de bîrên kûr bi gir vedane
serdestan
û
Dilekî qirîstal rawestiya
Çavên te li hêviya hezarên hêstên wan jî hatine
dizîn
Şikest!
Wê roja ji zêr zertir
Li der û dorê payîzokên zexm mîna polayê têrav
Min dizanîbû
Tu ne mîna min hogirî tenêtiyê bû
Te xwe avêt hembêza bayê payîzê
Xatir nexwest ji Amedê
ji me
û zeman
min dizanîbû
li wan deran
stêrk
hîv
erd û ezman heye yan na
bêhna pirêzeyên şewitî nayê
şikestine dol
û nexuyane çiyayên zadegan
ne jî di bin ezmanekî bê dawî de diherike pir av
tu yê bikaribî
berê xwe bidî jor

eniya xwe bidî ezman
li ser kefa destê xwe
hema wê gavê
helbesteke qeşeng
leheng
bideng binivîsî
di rojê bédeng de
ji rêzê ya payîzê
erebî bazar
kê diwêrîbû xatir bixwestaya
mîna te ji bajarekî keleh ferfûrî
lê bida û biçûya
dibê me zanîbû te xwe filitandiye
ji mirineke ebedî
ma ne bes e gidî
dilê te yî qirîstal
wê bikaribe bê helbest nederize

navê te li xwe kiribû bajar
wê roja reng genimî
polî poşman
tu bixwazî vegere
ji bo hêrsa xwe bikî bedewî
ditirsim
zebaniyan wira jî dagir kiribe
mîna welatê me
bê fedî

“Careke din pirsiyar meke!”

Can ÊZÎDXELO



Ji destpêka xebata neteweyî ya kurdan, diruşmeyên azadiyê û parastina rûmeta kurdan têne bilindkirin. Kurd û Kurdistanîyên ku beşdarî şoreşan dibin, li dijî bindestî û bêrûmetiyê têdikoşin, lê xuya ye di warê pratîkî de hîn jî bawerîya beşeke mezin ji kurdên (şoreşger) bi van mafan nîne. Ji ber ku ev mijareke dirêj e, ez ê bi tenê çend pirsan bikim ku nifşa pey me agahdar be.

Dema ku ez sala 2009`an neçar mam ji Rojavayê welêt derkevim, min wek evdalekî ziman û çandê berê xwe da Başûr ku bêhtir li pey deng û peyvên kurdan bigerim û li gorî wê lêkolînên xwe berdewam bikim. Li herêma kurdan a azad jî, her tişt serobinî bû, her kesî daxwaziya belgeyan dikir, min wek kurdekî Rojava tevî belgeyên xwe yê heyî nikarîbû mafê rûniştinê bidest bixim. Wê demê li Başûr tu neçar bû ku (piştgiya) partiyeke Rojavayî bînî, lê ya herî girîng ew bû ku divê te bizanîba belgeyê ji cem kê jî bînî. Hewlêra zerkirî piştgiya partiyên nêzîkî xwe dipejirîne, Silêmaniya keskkirî jî tenê ya alîgirên xwe, ji xwe piştgiya partî û rêxistinên ku niha di bin sîwana Tev-Demê de tevdigerin, nedihatî pejirandin.

Di nava van tengjiyan de tiştê zelal nedibû. Her alî girtî bû, bê belge, rê wenda, bê piştgirî, bêxwedî û bê derfet. Diviyabû (siyasetmedarên kurd) yê ku li Sûriyê karmend û mamûr bûn, mûçe û meşa xwe ji deselatê werdigirtin û niha jî ji her du partiyên werdigirin, bigotana ev kes “welaparêz û ciyê baweriyê ye.” Dema hevalên min ên xebata hundirê Rojava dimeşandin dihatin bîra min, min qet nikarîbû tiştêkî wiha bikira, di encamê de jî Silêmanî li min bûbû zîndan, li min qedexa bû ku biçim derveyî bajêr, bê nasname, bê belge û herî dawiyê jî bê pasaport mam.

Piştî derbasbûna çend mehan, ez li herêma desthilata azad hatim girtin, wan ez avêtim zîndanekê ku min hîn jî xirabtir nedîtibû. Li wir, niha nabêjim di wan çend rojan de çi anîn serê min, lê piştî min zanî ku ew zîndana dersînorkirinê bû

ku piştî çend mehan min radestî Sûriyeyê bikin. Hevalên min ên çalakvan û hin mamosteyên zanîngehan ku sedema hatina min a Başûr dizanîbûn, mudaxeleya rewşê kirin û piştî destmaçkirin û kefaletan, piştî 3 rojan ez hatim berdan. Êdî beriya girtinê û piştî girtinê çi hat serê min wê di dema xwe de bê gotin. Piştî 3 salan ku piraniya rewşenbîr, nivîskar û siyasetmedarên Başûr karê min baş nas dikin jî, piraniya çalakiyên rêveberî û navendên çandî li Silêmaniyê bi alîkariya min tînin kirin jî, dîsa mafê rûniştinê zû zû nadin, piştî dehan pirs û pirsyarên, kefalet û îmzeyan rê didin.

Naxwazim niha wan xalan gotûbêj bikim, xala ku divê bê gotin ew e ku hemû kurdên Rojava yê di sînorê fermî re derbasî Bakur dibin, li vegerê divê li ser deriyê Başûr formeke dûr û dirêj li ser hemû jiyana xwe dagirin, ew form tevî ku belge li ber destên asayîşê bin jî, divê her car hemû zanyariyan ji nû ve binivîsî da ku wekî kurdekî Rojava vegerî herêma Başûr ya azad.

Ez jî wek hemû Rojavayîyan, dema di deriyê Başûr re vedigerim, wan zanyariyan ji min werdigirin, wê formê bi min dadigirin û gelek pirsan dipirsin. Lê meha borî hinekî cuda bû. Beriya çend rojan, dema vegeriyam, li ber deriyê Başûr wek her car û her Rojavayîyekî, pasaporta min hîştin dawiyê û ji misafiran re gotin “hûn biçin ev ê nîvsaetekê li ba me bimîne.” Her car jî nihêrtina ajovan/şofêr, alîkarê wî û awirên çavên misafiran şerm dikim, di awirên wan de pirsên wek; “te çi kiriye” dibînim. Bi rastî jî ez her car li ser deriyê Xabûrê û piraniya navendên asayîşa herêma azad heman pirsê ji xwe dikim; “Gelo dibe min tiştê kiribe?”

Wek her car, hemû gotinên ku ji çavên ajovan û misafiran bariyane li dilê min ketin, lê min got tişt nabe, ew ê derbas bibe. Dema bang kirin “Sûrî”, min ew dijûn jî daqurtand û çûm hundirê odeya wan. Asayîşa herêma azad got “Tu ji Sûrî yî ne?”



Min got “bi zorê bûm.” Wek her car, pir biacizbûn li min nihêrî û bi desta got formê dagire. Min got, “çima dîsan vê formê dadigirî, ji xwe min berê çend caran dagirtiye û vaye rewşa Rojava jî xuyaye.” Gotin; “Ev jî bo berjewendiya we ye!” Dîsan wek her car tenegehîştîm, piştî bang li zabetkî din kirin, wî jî li odeya din pasaporta min kontrol kir, wî jî bang li berpirsê giştî kir, berpirs jî hin pirs ji min kirin, bi dehan pirs di mejiyê min de digeriyan û mejiyê min pirsên xwe dixwar. Min got; “Keko hûn çima wisa li me dikin? Ma me çi kiriye?” zabitê asayîşa herêma azad awirên tûj berdan, te digot agir ji çavan dibare, bang li min kir, got; “were.” Nêzikî wî bûm, wiha got; “Careke din pirsyar neke, başe? Careke din pirsyar nekey, têgiheştî?” Min got; “baş e, ser çavan.”

Belê ez nabêjim ku gotina wî zabitî, gotinên kîjan zabitan anîn bîra min, nabêjim pirsên pîraniya zabitên asayîşa herêmê, kê bi bîra min tinin û naxwazim bêjim erkê kurdên parçeyên din çi ye, lê dixwazim ji wî zabitî, berpirsên wî û hevalbendên wan re bêjim ku, “hûn jî careke din pirsyar mekin.” Vaye hûn dayîk û zarokên me bê nan û bê gaz li çilê zivistanê, di nava serma û seqemê de dihêlin, nexweş û birîndarên me bêderman dihêlin û dikevin rêza wan desthilatan ku ambargoyê datînin ser Rojavayê welêt. Berê jî

me dengê we li hember êrişa li dijî kurdên Ezdî yên Efrînê, li hember êrişa kurdên Helebê û hewldana dagîrkirina Serê Kaniyê jî nebihîst. Kesên ku nexwestin perwerdehiya leşkerî li kampa we berdewam bikin, ta niha wek lûtî û gêyên binavkirin, li bajarên we jî navê Rojavayiyên penaber bi diz û parsekiyê derketiye! Erê zabitê min, “careke din pirsyar nakim,” Lê ji sedî sed dîrok wê pirsayaran bike.

31/12/2012

Sîyamend û Zîne

Arêkerdax: Alî Aydin ÇÎÇEK

Beno nêbeno zemanêke Sîyamend û Zîne benê. Zîne waya hawt birayan bena, Sîyamend kî verê ap û najna xo de seyî beno. Rojêke najniye Sîyamendî yê ra vana;

“Sîyamend şo lojine bigîre bê.”

Tever ra aşme bena. Sîyamend şino lojine gêno tabî hemverê keyî de ko beno, o verê xo dano koyî û vano;

“Ez derdê na najniya xo û apê xo êndî nêşikena bancî.”

Serê xo gêno şino. Şino çi şoro rast ro çewres firariyan yeno, şino reseno yîne. Şino reseno yîne, yîne vanê;

“Ti kam ê, qey amey îta?”

Vano;

“Ez Sîyamend a. Ez xo rê ameya lewê şima karêke bide mi ez xo rê destanê şima ver a yena-şina.”

Qebul kenê vanê;

“Şo ma rê kavire sare bibirne.”

Kavire ano sare birneno, verê daye gêno keno serê xo serê xo keno keçelok. No lewê dîna de maneno rojêke qayt keno ke Serbarzingan verd ra. Nê şonê virniya Serbarzinganî danê piro tabaxe, şuşe, çî-mîyê werdena anê.

Zemanê henî, aşme bena tamam Keçelok vano;

“Ju estore bide mi nafa kî ez şorî verniya Serbarzinganî.”

Vanê;

“Ero ecelê nê bîyo tam ju estore bide nê wa şoro.”

Anê estore danê ci. ewleyhiye xo pê nêno, pê lex kenê. Sîyamend beno aspar şino. Şino serê raya Serbarzinganî yeno nat-şino wet. Serbarzingan yeno nê vînenê vano;

“No tek pîya wo ke nîya yeno nat-şino wet pers kerê hela o kam o?”

Şinê pers kenê yenê vanê:

“Sîyamend o, raye nidano ma.”

Qese kenê no raye ci nidano. Danê jubîn ra Sîyamend serbarzinganî kişeno karkerê serbarzinganî remenê. No çî-mîyê dîna keno top gêno yeno. Yeno nê vanê;

“Lo wile no ma ser ra yo. Nê na wo serbarzingan ardo. Vanê “Her juyê ma çiyê bikero ma xo rê biremîme. No kokê ma ano.”

Nê kulî ju bi ju remenê Sîyamend vano;

“Yaw şima rê se bîyo şima qey remenê? Ma xo rê se rindek na mixara de derbaz kenê.”

“Şima qey şinê?”

“Ca verdanê şinê.”

Paşa beno lajê paşayî zerra xo keno Zîne. Zîne waya hawt biran a. Waya hawt biran a, nê ci nidanê. Waya xo gênê, bar kenê şinê welatêke bînî. Namê Sîyamendî ke vejîno, na Zîne jî namê yê heşnena.

Rojêke Zîne mektûbe nûsnena dana pîyayê xo vana;

“Bere bide filan pîyayî.”

Sîyamendî ra ê mektûbî ruşnena. Sîyamend ko ser a wo qayt keno cêr ro pîya yeno. Pîya yeno Sîyamend vano;

“Ti pîyayê xêrî ya şerî ya?”

Mêrik vano;

“Ez pîyayê şerî nîya, ez pîyayê xêrî ya. Ez qasidê mîyanberê tu û Zîne ya.”

Yeno verê Sîyamendî. Sîyamend vano;

“Na Zîne çik a, çi tawa ya?”

Vano;

“Waya hawt biran a. Lajê apê daye cira hes kerdo nê hawt birayî nidanê lajê apê xo. Xora Zîne zî nêwazena lajê apê xo. Nê bira waya xo gureta arda no welat. Nika kî seba Zîne kewtê herb koka jubînî anê waya xo nêdanê.”

Sîyamend vano:

“Tamam, ti şo ez meşte beno aspar yeno.”

No roja bînî urzeno ra sarê-marê xo şuno, tifangê xo gêno beno aspar şino lewê Zîne. Pers-mers kenê Zîne vana;

“Sîyamend estorê xo uja girê de birayê mi herb ra yenê. Î silam danê to ti tewr silamê dîna megî. To ke silame dîna bigîrê ê girm danê to ra to kişenê çimke herb ra yenê.”

Vano;

“Tamam.”

Vindeno qayt keno wet ra estorî yînê, nê Sîyamendî vînenê vanê;

“No kam o, çik o, nê namê ma niheşno?”

Yenê Zîne ra persenê vanê;

“Kam o?”

Vana;

“Wile nêzana ez amo ha wo uja ronîşt. Ez nêzana!”

Nîşenê ro non-mon wenê birayê Zîne vanê;

“Ti cin ê, perî yê, çik ê, çi tawa yê?”

Vano;

“Ez ne cin a, ne kî perî ya. Ez Sîyamend o.” Vano “Şima kotî ra yenê, se bîyo?”

Vanê;

“Hal û meselay ma na ya; Lajê apê ma zerra xo kerda waya ma. Xora tek ju waya ma ya. Waya ma bêzerrîye bîya ma kî ci nêdana. Yenê ma şinê konê herb û lec êndî ma hela bîme.”

Vano;

“E ma şima vindê meşêrê ez şina

Vanê:

“La-lawo ma hawt tenê no jukek o, no se nîterseno?”

Neyse kunê ra. Sîyamend şodir urzeno ra xo pîşeno tera vano;

“Qe kes mi de meyero ez ke ama kîştene hona şima bêrê lecê xo bikerê.”

Vazeno ra tekneno şino.

Şino kuno ci kişeno, pîyawo ke weş mendo, çê xo ra nîyamo. Dano piro tedîne kişeno tekeneno yeno, nê vanê;

“Lo no çi pîya yo, no Xizir o, no çik o nîya afat o?”

Sîyamend vano;

“Ez na yo şino çê xo meşte reyna yeno.”

No tekneno şino. No ke şino, lajê apê Zîne teba eskerê xo hebê şewe erzenê ser. Erzenê ser dest û payanê biranê Zîne girê danê a şewe uja Zîna xo gênê şanenê raye. Waxto ke nê erzenê çêyî ser Zîne ana dizdiye mektube nûsnena kena binê kuça adirî.

Roja bîne Sîyamend yeno nata-weta qayt keno binê kuçe de kaxite vînenno. Kaxite waneno ke hal hêkat na yo “Lajê apê mi ez berda felan şehêr, bitekne bê.” Beno aspar şino. Şino ke nalîne yena. Vindeno şino lewê ke birayê Zîne pîl o. Dest û payî girê de henî ca verdo. Sîyamend şino lewê vano;

“Silamê mi pîyayê hewlî ro.”

Birayê Zîne nalenno vano;

“Pîyawo kotî timûtim nîya hard der o.”

Dest û paya keno ra vano;

“Birayê tu yê bînî kotî yê?”

Vano;

“Wile ez nizano.”

Dê ra wet şino birayê dê yê bînî kî aynî qey de, ê kî keno ra. O qey de hawtmîne kena tamam vano;

“Şima şorê ez teyna şino.”

Vanê;

“Ana meke waya ma berda heyfê to yo. Pîyayê dîne zaf ê, juyat ê, to kişenê!”

Sîyamend vano;

“Ez şona. Xora ez amo kîştene mireno; nîyama kîştene ez Zîne gêno ano.”

No şino. Şino uja şehêrêde vejîno. Şino çê ju pîre de beno meyman vano;

“No çik o hetê şin o, hetê şîwan o, hetê dawil û zura yo?”

Pîre vana;

“Too qese meke lajê paşayê ma çêna apê xo arda hawt birayê daye kîştê waya dîne kî kewta oda çêverê oda xo ser o kilît kerdo.” Destê ju kardîye ju de zeher o vana “Sata ke lajê apê mi bêro verê mi ez xo kişeno.”

Sîyamend vano;

“Pîrê nêbeno ke ti ena kaxiti bere Zîne rê?”

Vana;

“Bawo serê mi danê piro!”

Zernê dano ci vano;

“A nê zernî bigî şo vaje.” “Ti axîna ke pê cira hes kena hebê çêverî rake ez to ra çîyê vana reyna çêverî bide ca.”

Roja bîne pîre şona dana çêverî ra Zîne vana;

“Ti kam a, çik a?” Vana “Uja ra şo qaytê zeher weno, kardîye dano xo ra.”

Pîre vana;

“A axîna ke to pê hes kena ayna hebê çêverî rake ez çîyê to ra vana.”

Zîne se çêverî kena ra destê pîre ra kaxite gêna kaş kena bena zere. Kaş kena bena zere wanena vana;

“No pîya kotî yo?”

Pîre vana;

“Haniko kê mi de.”

Vana;

“Ê pîyayî ra vaje meşte xo terapîşo bêro xas baxçe. Şo lajê apê mi ra kî vaje meşte çewrêş carîya bido mi ez şino xas baxçê, şino gezî şan de ke amo veyve xo bikero.”

Pîre şona lajê apî vana. Lajê apî ra vana, o jî xulamanê xo ra vano;

“Meşte tede pîya xo bixemelnê teba Zîne ra bixemelnê şorê xas baxçî, şorê geyr.”

Roja bîne Sîyamend tifangê xo gêno, estorê xo ra aspar beno tekneno şino. Şino xas baxçe beno pîya çênî hama henî cade manenê. Zîne gêno erzeno pê xo şino verê saraya lajê apî. Şino verê saraya lajê apî vano;

“Ti ke camêrda mi dima kuye! Ez na wa Zîne gêna şina.”

Lajê paşayî hatan pîyanê xo keno top hatan natwet, Sîyamend û Zîne xeylê ca şonê. Nê kunê dimê. Waxto ke resenê ci danê jubînî ra Sîyamend Zîne ra vano;

“Ti şo ko. To cayê mi diyo şo uja ez û dîne kumê herb.”

Zîne bena aspar şona êndî nê danê jubînî ra jubînî helak kenê. Peynîye de Sîyamend dano lajê apî ra sere keno cira. Sere keno cira keno zerê haqîbê xo gêno şino. Şino serê beno erzeno uja. Tabî lajê apî yo, Zîne mirozina. Sîyamend vano;

“Zerê to bi mi vêşeno ya lajê apî rê?”

Zîne vana;

“Zerê mi to rê vêşano.”

Vano;

“Zerê to bi mi vêşeno ez keçel nîyo!”

Verê kavire serê xo ra erzeno. Uja jubînî ra hes kenê, benê maşiqê jubînî tabî. Veyvê xo kenê Sîyamend Zîne gêno şino Koyê Sîpanî.

Şinê koyê Sîpanî de vindenê. Rojêke kome gakuviyan verêna ra. Dimay gakuviya maye, ju gakuviyo nêrî, zaf girs nîyo, qijkek beno. No nêverdano ke ju nîzdê na manga bo. Sîyamend hewn de yo. Zîne zaf berbena. Zaf berbena hesirê Zîne guneno ruyê Sîyamendî ra. Sîyamend o taw beno hêşar vano;

“Zîne ti qey berbena? Hala derdê xo mi ra vaje ti bîya poşman?”

Zîne vana;

“Wile Sîyamend gakuvi amay-şî gakuviyêde qijkek dima manga bî niverdêne ke ê bînî nîzdê manga bê.” Vana “O gakuvi yo qijkek ti bîya ê bînî kî birayê mi bî.”

Sîyamend qahrîno vano;

“Zînê gere ez ê gakuviyê qijî bikişî goştê dê bi to bidî werdene.”

Zîne vana;

“Sîyamend meşo!”

Zaf jubînî anê-benê Sîyamend urzeno ra şino. Şino ke gakuvi ha yo serê zinarî ra mexel o. No yeno ke pirodo gakuvi qoç dano piro Sîyamendî cor de zinar ra erzeno. Sîyamend ke zinar ra erzîno yeno guneno bele ra. Namê a dare kî dara benîşteke a. Zîne vindena, vindene, vindena Sîyamend nîno. Sîyamend nîno Zîne urzena ra şina. Şina qayt kena ke heya, no cayê pezkuviyan o. Na şina serê zinarî qayt kena ke nalîne yena. Şina dîyar ke Sîyamend o. Sîyamend o, Zîne berbena. O taw Sîyamend vano;

“Meberbe ti êndî mi ra nêxelesnena.

Zîne berbena vana;

“Wille ez to xelesneno ra.”

Sîyamend vano;

“Zînê nika ke to ez cêr ro bele ra onta ez mirena.”

Vano “Zînê şo estorê mi raverde estor bero mi ser a bifiro şoro. Bero mi sar a bifiro şoro wa asparê serê xo henî bibo ke hena mi ra juyat bo.

Zîne şina estorî verdana ra estor yeno ke Sîyamend naleno estor vano;

“Wey Xwedê yo li ti berka beran ke

ti se şewe se roke qed ra neke

Ti kesî pîştâ xwe de espar nake”

Estor şino Zîne berbena vana;

“Dar dara benîstoke

binê de rabe çelo koke

Sîyamendê min mimanê te

zawayê ro û dane.”

Zîne xo cor de erzena a jî kunena ayni bele ra, a jî mirena. Vanê mezelê xo kîştâ jubîn de, koyê sîpanî de yê. Vanê mezelanê dîna ser a çiçegî benê kewe cor a êndî yenê ke biresê jubînî gakuvi yenê wenê niverdanê ke biresê jubînî.*

** Na şanike Gimgim ra dewa Keça ra Amoja Gulşehere (Gulşehar Atça), tarîxê 29.12.2011 de Taxa Gazîyî Ya İstanbulî de mi rê vate.*

Gîskê birîndar Selahattîn ÇAM

Vê sibehê laşê wî giran bûbû; doşek û lihîf mîna ku wî bi xwe ve bizeliqînî û balgîf û nazbalgîf jî serê wî bi xwe girêdin; çavên xwe vekiribûn û zoq li qatiyan dinêriya.

Diviya bû ku, îro sibeyê zû rabûya û biçûya ber pez. Bi zor û zehmetî rabû ser xwe. Bi zor û zehmetî rabû, piştî qedemgehê serçavê xwe bi ava sar a wek qeşayê şûşt. Ava sar hinek hişê wî anî serî û bîn hate ber. Diya wî jî bînavber digot: "Hadê berxê min hadê! Xwarin amade ye." Wî jî, bo xatirê daka xwe li ser sifrê rûnişt. Lê qet dilê wî nedîçû xwarinê. Parek nan bi rûnê malê avêt devê xwe; mîna ku dev li canê xwe bike, loxme di gewriya wî de nedîçû xwarê. Bê dil û bê xwestek pez jî axurê derxist û di Tehta Pehn re ber bi Diyarê Malan ve ajot.

Wexta ji diyar de li Kaniya Zeynikê û li Binê Gozê nêrî; zarokatiya wî hat bîrê wî. Hêj pênc salî bû, berpîrsiyarê keriyek kar û berxan bû. Ji Binê Tihokan dema ku heta Gomikan dihat û li pey xwe dimeyîzand; ev dem jê re mîna du roj berê dihat. Li jêr bi newala Dirêjîkê, li Xerabeya Reşan, li Guwara Hebîban kûr kûr nêrî. Xwezayê xwe bi kesk, sor û zer xemilandibû. Bihîv, sêv, xox û mişmişan bi kulîlkan reng bi reng, dîsa ew ber bi zarokatiya wî ya dema dibistanê bir. Bi lorîna bilûra şivanek ve jiyana wî ya kurt mîna filmê Sinemaya Dilanê bi lez di ber çavê wî re derbas bû. Newaya bilûrê ew biribû salek berê: Li dibistanê ew û hevalên xwe bi kêfa dilê xwe bi çirê û bi gogê dilîstin. Gomlegê wî yê naylonê spî yê bi gul û kulîlkan xemlandî lê bû. Wî jî vî pîrehînê xwe pir hez dikir û her roj ew li xwe dikir. Li ser ava sekan radiwestiya û bi saetan bi kêfxweşî û ji xwe razî li xwe mêze dikir. Heta ku rojî mamoste jê re gotibû: "Qey ji bilî vî gomlegê te, tiştê tu li xwe bikî qet nîn e." Gotina mamoste mîna tîrê di dilê wî de jan da. Lê nedixwest kincek din li xwe bike. Xwest ku ji vî gomlegê yekî din jî bikire. Êvarî dema serê xwe da ser çoka diya xwe û diya wî porê wî dimizand, got:

Dayê ez dixwazim tiştek ji te bixwazim.

Bêje berxê min! Pez û rezê min di oxura te de.

Dayê, ez ji vî gomlegê xwe pir hez dikim; naxwazim qet ji xwe derxim.

Bila her tim li te be.

Lê ew tenê ne bes e! Yekî din jî dixwazim. Tu yê karibî yekê din bikirî?

Berxê min! Tu zanî niha destê me teng e. Ne

wexta mazî û dendikan û ne jî dema firotina rûn û penîr e.

Xwezî me karibûya!

Bila bimîne havînê; bexê diya xwe. Stuyê xwe xwar kir û ew bêhemdî qebûl kir. Gere êdî her roj ev gomleg li xwe nekira. Di dûv vê rojê de, bê dilê xwe yekî keskê dinê jî ê di navê re li xwe bikirana.

Di nav gelî û newalên kûr de ket Newala Dirêjîkê. Xweza ji serma û seqema zivistanê derketibû û ber bi biharê ve diçû. Dar û deviyên pel pişkavindibûn, giya û nefela reng bi reng newal xemilandibûn. Newal êdî ne mîna zivistanê tazî û rût bû. Mirov du gav pêş xwe ji tarîtiya dar û deviyên nedidiya.

Ew pezê xwe di Dibûrê re, gihîştin Kevirê Hûso. Wexta ji Diyarê Kevir ve li Goza Çelo û li ber Pencereyê nêrî. Mij û dûmanekê ku bi ser çem de girtibû dît. Çem û zixur di bin mij û tefledûmanê de mabû. Tirsîya û bi mizmizandin got: "Vê meha nîsanê û ev tofan. Xwedê bi xêr bike." Hêj peyva wî bi dawî nebûbû, di nav ba û bagerê de berfê dest pêkir. Di vê berf û qiyametê de xalê Sîpan di ber re derket û got:

Lolo şivano! Ev çi hewa l e, di meha nîsanê de û ev berf. Emrê min ji heftê derbas bû. Min heta niha ecêbek wiha nedît. Îro çendê nîsanê ye?

Îro bîst û pêncê nîsanê ye.

Vê roja bi nîşan di lînûska xwe ya berîkê de bînivîse. Peyv hêj ji devê xalê Sîpan neqediabû, ji berîka xwe lînûska xwe bi berga sor bi nazikî vekir; di bin stara kulav de li ser rûpela spî nivîsand. "Îro Bîst û pêncê Nîsanê sala Hezar û Neh Sed û şêst û Pênc. Berf bariye û devî, giya yê kesk bi berfa spî hatiye xemilandin." Û bi dengê bilind:

Belê vaye min qeyd kir ku te di heftê saliya xwe de di vî nêrî de berfa bi vî awî nediye. Got û zûr li ruyê xalê Sîpan nêrî: Ji her du kêlekên pozên wî mîna xetên cot xêzan xwe gihandibûn devê wî yê nermik. Xwe bi xwe fikirî û got: "Pêşeroja min jî ê kalîtî be û ruyê min jî ê wiha ê bêteşe be."

Xalê Sîpan hespê xwe bi lez mîna bayê bezand û çû. Wî jî berê xwe dabû wî mîna gulberojka ku ruyê xwe bide rojê, zûr lê dinêriya. Lewra wî jî xalê Sîpan pir hez dikir. Paşê fikirî û bi pistepist got: "Qey ez tenê ji xalê Sîpan hez dikim. Tevahiya gun-diyan ji hez dikin." Wî jî Diyarê Çayê de li çem nêrî: mijeke tenik mîna duyê qelûna xalê Sîpan çem pêçandibû. Bayekî gur ji çiyayê Spî de dihat û Zeviya

Hemze di ber xwe ve dibir. Dar û ber ji reh de dihejand. Bayê ewrekî reş û tarî dabû ber qamçiyê xwe û bi lez ber Paloyê ve dibir. Fikirî û di ber xwe de mizmizand: "Xwedê kirî ku vî bayê ev ewr belav kir; an na ê berf û bareneke bi şidet bibariya." Xwe da Diyarê Şikefta Xweydik berê xwe bi jor de kir û li ezmanê bê ewr û çik sayî mêze kir û dîsa ramiya, mîna ku îro qet berf nebaribe, asîman paqij û zelal bû. Roja ku çûbû û li pey şopa wê soraniyek li dû mabû; soraniyê çiya û ezman bi hev re kiribû yek. Newala Reş di bin vê asoyê de, mîna bigirî û şînî be, reş girê dabû. Reşahiya Newala Reş zarokiya wî kir bira wî. Bavê wî digotin, ev kurê min hîç natirse. Li ser peyvên bav, bi saetan li der ve di tarîyê dima; saw û xof diket canê wî. Lê nedixwest ku kes zanibe ditirse. Biçûgiya wî di nav mij û dûmana van hestan de, wek ava çemê Embarê yê meha nîsanê bi lez derbas bû.

Wexta ku şevê hêdî hêdî cila xwe ya reş li xwezayê pêçandbû, ji Rasta Benîştê ber bi Binê Sengan ve tev û kerîya pez dimeşiya. Çala Senga tarî û bêdeng bû. Bê dengiya şevê bi dengê kund hat xirab kirin. Awaza kund li Qutê Sengan diket û paş de li Çalê belav dibû. Guh da dengê kund û xwe bi xwe got: "Ev ji ku derê derket; ev dengê bêyom. Tiştê neyê serê me? Xwedê me biparêze." Lewra diya wî her tim ji wan re gotibû: "Dengê kund êvaran şom û bêyom e." Hêj peyva wî bi dawî nebûbû gurîni bi pez ket û mîna aşîte bi ser de hat. Wî fam kiribû ku pez bîna gur helaniye û gur bi ser pez de tê. Di vê tirsê de pez wek gule direviya. Wî jî xwe da pêşiya jorê pez û kevir gêr kir ku hinek hêdî bimeşe.

Kevirê mezî bi hêz girt û gêr kir. Bi dû gêrkirina zinar ve zarîni bi gîsk ket. Behîna wî ji Binê Sengan bi Darê Selmo û li Komelê belav bû. Xwe bi lezgîn gihand Gîskê Askê ku çaqa wî şikandîye û li erdê ramandîye. Awaz û zarîna gîsk kezêba wî dipiritand û dil û hinava wî mîna îsota Rihayê dişewitand. Xwest ku gîsk rake. Lê tu rewac û hêz tê de nemabû. Tenê serê xwe rakir û bi melûlê li riyê şivan nêrî. Nola ku jê alîkariyê bixwaze ma li bendê. Ew jî mecbûr ma ku gîsk bide ser piştê xwe û bibe malê.

Gîsk li ser piştê wî, ew di bin vî barî de û pez di pêşiya wî de bi inteint gihîşt Korta Golikan. Di vê çala tarî ya ku nêzî goristanê bû, tirs û xofê bi şid hatê. Di şevbuhêrkan de bihîstbû ku ji mezelan zarîn û nalîn tê. Ji bo hinek tirsê xwe birevîne û xwe wêrek bike, gotinên diya xwe bi bîr anî. Diya wî her tim jê re digot "Kurê min, qey em ji kevir û tehtên mezelan ditirsîn. Tenê kevir û kuç biyanî ne; wek din hemû xizm, dê û bavê me ne. Bavê min, diya min û sê dêmarî yên min tev li vir in. Ma em ê ji bitirsîn." Vê bîranînê hinek dilê wî anî ber lê dema ku

gihîşt Qotê Mezelan, ew pend û şîretên dê tev ji mejiyê wî derketin; dîsa ket nava tirs û xofê. Dilê wî, di qefesa singê wî de nola çûka ku mar bi ser çêlikên wê de girtibe lê dida û dikir ji devê wî derkeve. Porê serî wî û mûyê canê wî bû wek şûjinê; ji serî hilma germ radibû. Tevî ku ba tune bû jî, mîna ku bager li singê wî bixe nikanibû bimeşe. Ev riya kin, jê re bûbû riya saleke û bidawî nedibû....

25. Avrêl. 2012
Amed-Mêrsîn



Tirsa xef *Selamî ESEN*

***“Dema piling û şêr nêçîra xwe dixwin,
çend hestî ji lawirên mayî re jî dimînin.”***
-Mijabad, Jan Dost-

I.

Kelêjahiya havînê bû. Li taxa kevn a bajarê Sêrtê, hemî xwedînav û pêşrewanên Mala Şêx ên ku ji gundikê herêmoka Şûvê ya Botanê bûn, li mala Ehmedê Qasim ji bo mewlûdxwendinê berhev bûbûn. Dêmaniyên Eruh, Mişar, Garisan, Şûv, Welat Kilîs û Welat Kelhokî piştî koça mezin li taxên Sêrtê yên kevn bi cî bûne. Piştî hatina dêmaniyên koçerên wek eşîra Dudêran, Mamediyên, Garisan, Alikiyên, Stûrkiyan, Sloqiyên û Keşkol ji hatibûn bajêr û her roj serjimara kurdan di nava bajêr de zêdetir dibû. Bi zêdetir ji sedema şer ji herêma Botanê koç kiribûn, bajarê jenderme û eskeriyê, Sêrtê. Lê hinek jî ji bonî dehweya xwînê, ji ber xwintiyê, yani dijmînayiyê koçî bajêr kiribûn. Kesên îşev di mewlûdê de berhev bûne jî ji sedema dehweya xwînê koçî Sêrtê kirine. Piştî ku Mele Xêredîn mewlûd qedand civatê hevokên “Xwedê qebûl ke” bi lêv kirin û dest bi xwarinê kirin. Sê çar ciwanan bi alîkariyê hev laylokên goştê pêz, birinc û selê, sirehînen dew û avê danîn li ser cilika raxistî. Mezinê Mala Şêx, Ehmedê Qasim, ji civatê re got; “Kerem kin civat!” Kesên civatê hemî rûniştin li ser cilikê, di serî de Mele Xêredîn bi bismilayeke xurt dest bi xwarinê kir û kesên li civatê jî bi bismila û diayên kurt re xwe gihandin nan û kevçikan.

Ehmedê Qasim bi keçmama xwe Xunavê rezewicîbû, pênc kur û du keçê wan çêbûbûn. Herdu keçên xwe hêj di nûciwantiya wan de dabûn mêr. Ji nav pênc kurên wan jî hersê zewicîbûn û herduken din jî di dibistana tirkan de xwendekar bûn. Eko, kurê wan ê herî biçûk bû. Sêzdeh salî bû û simbêlên wî nû şindibûn. Beriya salekê ew balix bûbû, dengê wî weke dengê gayên ku di nava kolanên bajarê Sêrtê de digerin, stûr bû. Dirêjbûna pozê wî di cî de bal dikişand û ew wek berê xweşik xuya nedikir.

Diçû dibistana navîn, pola duyemîn. Birayê wî yê ji wî mezintir Kemal jî diçû pola dawîn a lîseyê. Di wan rojan de Ehmedê Qasim ji Eko pir aciz bûbû; ji ber ku ew î xwendina xwe ya Qur’ana Pîroz betal dikir û wek topê, wek leystokên kompîtîrê li pey tiştên heram diket. Her ku wî bavê xwe bidîta serê xwe dixist ber xwe û dest bi viran dikir; “li medrese-yê kes tunebû ku dersê min bide min, Seyda gote îro newin, min kitêba xwe hiştibû li mala Silho wan...” Bavê wî, yê ku ji mala şêx û mişayêxan e, du şîmaq li binê guhê wî, pehînek jî li qûna wî dida û Eko zûka ji ber çavan wîndî dibû. Di honikahiya sibehên havînê de ew û du hevalên xwe bi zarokan re li zambogê top dileystin û ji ber qêrîn û gumeguma wan cîrana wan Xurbeta keça Elî serê xwe di pencerê re derdixist, dest bi xeber û nifiran dikir. Ji ber ku emrê Eko, Silho û Metîn li gor zarokên din zehf mezin bû ewan serê xwe dixistin ber xwe û hêdî hêdî ji wir diçûn. Hersê jî nû balix bûbûn û hiş û aqilê wan li ser çîçikan û tilmîqûnan bû. Bi xef ve diçûn di govika virtûvala ya Xaleta Hisnê wan û hersê diketan di pêşbirkê de ka wê di serî de ji kîrê kê ava spî xuya bike. Eko ji herduken din tim û tim leztir dikir, aqlê xwe dibir ser keç û jin û jinebiyên cîranên wan, li ser çîçikên bê sutyen, li ser tilmîqûnên mezin. Piştî şeş heft deqeyên di nav xeyalên şehwetî de ava kîrê wî spî dikir. Heçko dinya ji nû ve ew î ava kiriye ewqas bi heyecan digot; “Holê, ez im şampiyon!” Silho û Metîn jî rekabeta xwe berdewam dikirin.

Eko ji dibistanê hez nedikir û ji tirsê bavê xwe Ehmedê Qasim newêriya bigota ez naçim dibistanê. Jixwe mafê wî yê axaftinê tunebû, hemî aciziyên xwe ji diya xwe Xunavê derdixist û dikira dijûnan jî li diya xwe bike. Xunavê ji kurê xwe yê herî biçûk jî ditirsiya û newêriya ji tu kesî re gotinek tûj bikira. Ji ber dijûn û gefên mêrê xwe qet dengê xwe derdixist, tevli domandina jiyana xwe ya dîl dibû; hema bila gotinek reş neçe guhên dê û bavê wê êdî mêr û tî û kurên wê çî dixwestan bila bikiran.

Piştî xwarin û vexwarinê mêrên Mala Şêx ketin nava fitne û fesadiyan, ji bonî kesên ku tevlî mewlûdxwendinê nebûne. Li ser hev gotin û gazindan ji kesên ku ji misilmaniyê xurifine û tevlî heramiya jiyana bajêr bûne, kirin. Gotin hate û hate giha jinên taxê, di serî de Xaleta Nûrê.

Xaleta Nûrê nêzîkî şêst salî hebû, piştî rehetkirina mêrê xwe Hacî Ihsan, ji bonî debara xwe diçû ji nava rezên ereban fisteq û simaq û behîv û hilîsikan berhev dikir, weke paleyeke bîstsalî dişixulî û debara xwe dikir. Di rojên din de jî ew ê gûzên ku ji fabriqeyê bi qemyon û îsûziyan dihatin li taxê, datanî û dişikand. Kakilê gûzan dixist qolîyan û devê qolîyan zenq dikir, him heqdestê şixula xwe distand; him jî qaşilên gûza dixist nava telîsan û zivistan bi şewitandina wan qaşilan, diborand. Kurên wê hemû jê cihê bûbûn, hemîyan mala xwe bar kiribûn û çûbûn Stenbolê, çûbûn xerîbistanê. Carinan keça wê Heybet dihate seha wê, nexwe ji xeynî cîranan heçko tu kesê wê nemabû. Her rojên îne jî Xaleta Nûrê diçû mizgefta Şêx Mihyedîn, û bi meletiya jina Şêx Mihyedîn a yekem Dayîka Rakîet re nimêja xwe ya îne dikirin. Rojên ku Xaleta Nûrê gûz datanî Eko jî, dil bi xwe de, dixwesta aliye Xaleta Nûrê bike lê niyeta wî ne şikênandina gûzan bû. Şaredariyê kolanên taxê bi kevirên parke raxistibû û kevirên zêde mayî jî Dêmanî û koçerên taxê ji xwe re biribûn. Eko ji telis gûz derdixistin û datanî ser kevirê parkeyê û çakuç lêdixist. Xaleta Nûrê û zarokên hûr jî gûzên hatine şikênandin di bergeşek girover de dibijartin û kakilê wan dixistin qolîyan. Dema qolî tijî dibûn Xaleta Nûrê koşeyên qolîyê li hev tanî û zenq dikir, paşê jî qolîya zenqkirî datanî ser qolîyên din. Ji ber germahî û şixul Xaleta Nûrê berê xwe, ya ku bi derziya çengalê ve girtibû, vekiribû û xêza nava herdu çiçêkên wê xuya dikir. Eko jî bi har û hiloriya xwe di bin çavan re li berê Nûra şêstsalî dinêrî. Ji bonî westiyabûna xwe nîşanê wan bike radibû piyan û navpiştê xwe bi pêş û paş ve dianî dibir. Lê çavên wî li ser çiçêkên Nûra şêstsalî bû, dizanî li piya ew berên vekirî zelaltir xuya dikir. Dîsa rûdinişt, çakuç dixist nava çengê xwe û diket nava xeyalên şehwetî; “Jixwe Xaleta Nûrê pîr bûye û tu kes û kîsê wê tune. Hema rojek ez biçûma mala wê û wê jî niyeta min bizaniya û destûr bida... Qet nebû min çiçêkên wê bidîta, dest bavêtayê...” Nûra şêstsalî gûz dibijartin û qet ne difikirî ku berê wê vekirî ye û çavên Eko lê ne.

Şikoyê siwaxçî got; “Wele tenê Rebê Jorî dizane Nûra bî di nava rez û cinînan, kolan û zambogên sûkan de çî dike. Jixwe erebên xwedîrez sapiq in ku bi tenê jinan di nav rêz de didin şixulandin.” Mele Xêredin riya xwe ya bêmarês xwurand; “Xwedayê min, tu hefza me ji wan kesên ku di riya bajarva-

niyê de ji rê derketine bikî. Em hewcedarên te ne.” “Amîn, amîn...” Ehmedê Qasim ji Xunavê re gotibû bila xwe ji gotin û kirinên wê jinebiyê dûr bixin; lê Xunavê qet guh nedayê û illeh diçû alikariya Xaleta Nûrê gûz dişkand û behsa ewladên xwe dikir.

Piştî şeva mewlûdê qediya hemî mêvanan kom bi kom xatir ji Ehmedê Qasim xwestin û Ehmedê Qasim, Xunav, her du bûk û her çar kurên wan man.

II.

Ji kelêjahiya havînê hemî niştecihên Taxa Kevn a Sêrtê li serê banan doşek û cihikên xwe raxistibûn. Saet dema xewa taxê bû. Çiraya her malê vemirîbû. Bi tenê zerikahiya hin dîrekên elektrîkê pêketî bûn. Jixwe zarokan kevirên biçûk dixistên nava mirqehan û çirayên zambogê hedef digirtin û ampûl dişikandin. Her ku malî û cîranan nîfir jî dikirin ewan bi xefikî dişikandin. Di her derengiya şevê de dengê hinek ciwanên koçerên Mala Qîroyan ên ku girêdayî Eşîra Dudêran ji kolanê dihat û qet hay ji bilindahiya dengê xwe tunebûn. Dil bi xwe de Eko jî radîza. Birayê wî Mehsin û jinbra wî Hedya cihikên xwe li quncika banî de raxistibûn û dora wê bi perdeyên reş pêçandibûn. Li serê wê banê û di wê honikahiya şevê de xew bi çavên Eko nediket û dîsa diket nava xewn û xeyalên şehwetî. Safiyaya cîranê wan û nêzîkî sihsalî anî bîra xwe; Safiyayê di hundirê mala wê de bi tikûtenê didît. Safiyayê li ser makîna cîlan kiras û fistan didûrtin, Eko dibîne û heçko wê Eko dawetî mala xwe kirîye welê ji wî re dibişirî û dîsa karê xwe yê dirûtinê didomand. Safiyayê kirasekî gewr li xwe kiribû. Eko hêdî hêdî diçû balê, li pişt wê disekinî û destê xwe tavê binê herdu çiçikan. Wan herdu çiçik difirkandin û serê wan herdu çiçikên nerm, ku ji bê sutenyiyê xuyanga wan êşkere dibû, dixist nava çengên xwe. Qet deng ji Safiyayê dernediket û ji peroyiyê radibû ser piya. Bi keyfî tilmîqûnên xwe dihejand û Eko kirasê wê yê gewr jê dixist. Safya dima bi atlet û şelwarê xwe ve. Serê Eko digirt û di binê atletê xwe re dikir û Eko wan herdu çiçik dimijand.

Eko ji binê atletê serê xwe derxist û destê xwe avêt navrana wê û firikand...

Piştî van xeyalên şehwetî Eko ji nava doşekê rabû û hêdî hêdî xwe gihand tiwaleta qata jêr. Birayê wî Hesên û jinbra wî Zozan cihikên xwe li balkona qata jêr raxistibûn û nerdeyên hesin ên balkonê jî bi perdeyek gewr û kevn pêçandibûn. Ji bo ku ew hişyar nebin Eko deriyê tiwalete hêdî vekir. Ji nav eşofmanê xwe gunê xwe yê nû hişyarbûyî derxist û kaniyê jî hindik zivirand ku bila dengê avê were û dengê hatin çûyîna gunê wî bini-xumîne. Piştî çar pênc deqeyan Eko destê xwe yê

dohnî şûşt û çû ser ban, çû ser doşeka xwe.

Dora nimêja sibehê Eko bi pehinên bavê xwe Ehmedê Qasim rabû, bi cinabetiya xwe ve çû dest-mêj girt. Piştî destmêjê awir dan diya xwe, ji ber ku hez ji mêjen sibehê nedikir û heçko heramiya xewê bû mêj. Eko du riket bi lez û bez kir û di cî de xwe avêt ser doşeka xwe û raza.

Di sibeha zû de Xunavê taştê hazir kiribû, piştî taştê Eko ber bi riya Serê Zînî ve çû. Li Serê Zînî, li pişt Goristana Şêx Silêman, ku Tirba Mele Xelîlê Sêrtî ji li wir bû, medreseya Mela Emerê Koçer hebû. Mele Emerê Koçer li Botanê pir bi nav û deng bû. Kurekî wî li çiyê canê xwe dabû. Ji ilim bigir heta çand û hunêr ew melayeke serketî bû. Pêşrevanên eşîra Dudêran zehf qedr û qiymet didanê û zarokên xwe li ba wî didan xwendin. Mele Emerê Koçer dixwest nêrînen xwe yê ilmî û kurdewarî bike weke kitêbekê. Lê ji ber hatin û çûyînen mirovan û hatin û çûyînen wî yê di nava gund û bajaran Botanê de jê re wext nedima. Eko ji tirsê bavê xwe, bi darê zorê diçû medreseyê, xwendina Qur'anê. Feqeyên ku Qur'anê xitim kirine dersê didan Eko lê gelek caran e wî xwe xef dikir û feqeyan digot qey e wî dersa xwe girtiye ji ber wê çûye. Jixwe medrese zehf qelebalix bû ku wê bi kê re mijûl bibin û bi kê re mijûl nebin!

Eko xwe nîşanî du sê feqeyan kir û Qur'anê vekir. Gava Mele Tehsîn hate li ba wî, got "Seyda, Mele Hekîm dersa min nîşanî min kir, ez niha ji ber dikim" Mele Tehsîn jî jê gera û çû ba feqeyekî din. Piştî du sê deqeyên din Eko ji medrese derket û bi lez û bez xwe gihand malê, Qur'an danî ser maseyê û derket derve. Li ber deriyê mala Raziya yê zarokan top dileystin. Li gor zarokên taxê temenê wî zehf mezin bû. Dema zarokan Eko dît, keçên biçûk xwe dan alîyekî, kurên biçûk bi rêzê ketin qeleiyê. Eko li ser wan şût lêdîdan û kê golek bixwara ji qeleiyê derdiket û yê ku di rêzê de diketa qeleiyê. Mebesta wan ew bû ku kî wê zêde bimîne di qeleiyê de û li ba yê din zirtê xwe bide. Carina zarokan giliyên nerm ji Eko re dikirin; "Ekê tu zehf sert lêdîdî willeh" Keçên biçûk jî di nava hev de 'îp atlamaca' dileyistin. Di wê qîjewîjê de bûbû nivro, danê firavînê. Dayîk û xwişkên zarokan yek carê banî wan kirin; "Hisê, Ehmo, Xecê, Remo, Gulê, Îsko, Cahê..." Hemî jî bonî firavînê çûn mala xwe. Eko dizanî danê firavînê bû lê dîsa jî ewqasî birçî ne-bûbû. Jixwe kengî bixwesta dikaribû li mal xwarinê bixwara. Xurtiya wî li ser diya wî û jinbirayên wî hebû.

Piştî ku zamboq vala bû Eko xwe xiste bin siya govika xaleta Hisnê wan. Jixwe di govikê de tu karik û pez û bizin an jî berxik tunebûn. Xaleta Hisnê wan bi şivanê Taxa Kevn re rêkiribû Serê

Zînî çêrandine. Bitenê sergînên ji bo zivistanê û kêçên evîndarê sergînan tê de hebûn. Eko hew nêrî ku Gulêya keça Ezîmê lingên wê yek li hewayê û yê din jî li ser derincikan, xwe ji ser derincikekê tavête ser derincekeke dinê. Ji bonî leystoka bi serê xwe, Gulê hema digot; "yet, didu, şîşê, çal, pênc..." Eko bang li Gula pênc salî kir; "Gulo ka topê ji min re bîne, di govê de ye." Gulê hema yek carê dev ji leystoka xwe berda û li ber çavên Eko zûka xwe gihande govikê. Gava Gulê ket govikê Eko çav li zamboqa bêdeng û xewle bû. Lehzek din dengê Gula pênc salî û zerik û rûberf hat; "Eto abê, top tune..?" Eko ji deriyê govikê re xuya kir û bêdeng xwe gihande Gulê û wê bi şehwetî hembêz kir, wê danî li ser ranên xwe û da ber maçan. "Gulo huşşşşş, deng neke ê?" "hiii, em ê çî bitî qey..." "huşşşşşşş" Eko diricîfiya û destê xwe hêdî hêdî tavê doxîna etekê wê û bi jê de bir. Rûyê Gula pênc salî ji tirsê zer bûbû, çavên wê bûbûn kortek sor. Hêdî hêdî girî bi Gulê ket. Dema Eko dest avêt navranoka wê dengê giriya Gulê bilindtir bû û heçko bû qîrek. Xaleta Nûrê di destê de laylokek giraya savarê, ji nişka ve, ji deriyê govê xuya kir. "Tu çî dikî seba!!!" Bû qîje-qîja Gula zerik û rûberf. Ekoyê har û hilor yek carê destê xwe ji gulê dûr xist;

"Naa! Xaleta Nûrê heqê rebê jorî kim...doxîna wê sist bûbû, etek jê diket mi got ez ê wê bişidînim."

"Huşşş bee!!! Viran neke!"

"Ew Qur'ana Mihemed Pêxember Resulûllah xwendî ne vir e!"

"Heke min negote bavê te... ev jî ji te, ne, tu bise..."

"Na welle dîn û îman min tişte nekir, serê şêx kim min tişte nekirîye!"

Eko bi kelogirî û tirs ji derî derket û xwe ji ber çavan winda kir.

III.

Hayê tu kesî ji bûyerê tunebû ji xeynî diya Eko, Xunavê. Xaleta Nûrê ji Xunavê re behs kiribû û gotibû gava min laylokek giraya savarê dibir mala Raziya yê min ji govê qîjevîjek seh kir û min nêrî hal û meselê kurê te ev bû. Piştî vê Xunavê jî ji kurê xwe Eko re gotibû; "Waaa!. Kurê bînamûsan, ev jî ji te, neeee!!!" Eko bi serê Xwedê û pêxember û şêx û mişayêx û seyîd û kitêban sond dixwar ku ev hemî virên Nûra Jinebî ne. Heçko dizanibû diya wî jê bawer nedikir û dest bi xeberên kufirî dikir û dijunên tûj li diya xwe dikir.

Eko nêzîkî hefteyekê zû bi zû nedihat malê. Eko nêzîkî mehekê ma di nava wê tirsê de û tu deng ji tu kesî derneket... Jixwe wê deng ji kê derketa!

Têkiliya min a vêga bi dîrokê re

Mahîr BÂGOK

Ji dewsa ramûsanên Dîrokê
 Di lerza lêvên min ên xemrîn de
 Digerin mîna gerokan
 Dengên risteyên di bengîniyên coşdar de
 Nigaşên wê
 Li dilê min lefandin bi dengêkî fesîh
 Li ber ahenga wan
 Bi edre ketime ji eşqan

Li ser navika erdnîgariyê
 Û di bin atmosfera awazên wê de
 Mîna semazenan dizîvirim
 Di çerxa çaxê de
 Diçe
 Dengê dilê min ê xwerû
 Bi dengêkî raveber
 Di nav gerdûna hestên dostaniyê de

Noqî zeryaçayeya xeyalan dikim
 Heta ser sura sibehêke din
 Bi welidana utopyaya nû
 Di kêfxweşiya îro de hestgermiya giyana min diket
 ber
 Mîna Erosa xwexwaz nêzîk nabim
 Qenciya zimanê Agape* besî min e
 Ji vî dilê di cenga tasteqînê de
 Bi kelecana hevalbendî lê dixê

Ser ferşehê hestan sekinî me
 Di bin sulava keziyên Dîrokê de
 Ji heskirina niştiman re şervanekî bi xêrxwe me
 Ji duh, îro, ji siberojê re
 Payîna berdêlê nînim tu caran

Di perdeya çavên min de ew nexşên razan
 Vêga suretê wan bi Dîroka min re dîtayîsin rengên
 wan
 Ji eşqa rasteqîn re xwe didin der dengê wan
 Mîna çilkên xwisiyên li ser pelên lêvên min
 Ji bêhna axê re
 Mîna sirûştê biharê ye ji Dîroka min re

Dîrokê
 Şil fikir bi şerbeta hezkirinê
 Di renîşa lêvên min de peuvên hedar
 Di hundirê dilê min de
 Dengê sermendîbûna bengînan dîkin avsar
 Mîna di nav lîlavê de
 Bi xumexuma kedê ji bejna min xwe di berde xwar

Ji zimanê min diherikî dengê navê Dîrokê
 Mîna newayeke coşdar
 Li ber
 Serxwe diçûm weke risteyên helbestvan
 Dialiqîn awirên min li Dîroka ya dineqîşand li rûpe-
 lan
 Gavên min digerin di nav axa palmiyan de
 Pelên çaxan di bin siya min a salan

Di xewnê de
 Li ber çavên Dîrokê
 Di heman ava çemê diherikî de xwe tahir dikir
 Li wan deran min nedidît Heraklîtos
 Diqdiqandim di nav baxçeyên Babîlê de xweda-
 wenda Eurar
 Bang dikirin
 Bi dengêkî nazdar
 Stêrk, Înana, Îştîr
 Di keviyên min de avsunekê xwe dida der
 Ji nav livînên Mezopotamyayê
 Ji berê Dîrokê dirabim vê sibehê bixêr

Çiqas bedew e
 Têkiliya min a vêga bi Dîrokê re

Pûşper 2012 / Girtîgeha Tokatê

***Agape:** Di felsefeya Yewnan a çaxa ewil de, ev tîgeh ji bonî eşqê dihat bikaranîn. Di bingeha wê de berdêleke payînxwestin nîne. **Agape** li hember **Erosa** ku di hundirê xwe de berjewendî, xwexwazî û hazê dihebîne derket.

Agape di hundirê xwe de, bêberjewendî, bi-hevalbendî, bibiratî eşqa xwe dide nîşandan. Di çaxa navîn de, di felsefeya xiristantiyê de ji bonî hezkirina ji Xwedê re wek "Hezkirina Mezin" di-hate bikaranîn. Di zimanê dema modern de ji bonî eşqa welat tê bikaranîn. Di felsefeya exlaq de dil-pakiya hezkirinê dide der. Hemû dilpakiyên dinê jî jê çêbûne. Eşq an jî hezkirina exlaqî bi "**Agapiem**" tê binavkirin.

Di şerê Corunnayê de çalkirina

Sir John Moore

Charles WOLFE
Ji Îngîlizî: Rizgar ELEGEZ

Ne dengê daholekê dihat, ne ya sirûda cenazeyî
Wexta me termê wî bilez hildibire çeperê
Ne jî çekberda leşkerekî,
Li ser gorê, ku me lehengê xwe defindikir lê

Me ew di nava tarîtiya kerayî ya şevê de veşart
Ew erd bi rîman veqelaşt
Di bin cehda tavehîva mijî
Û di bin pêtalên zenûnsotîn de

Ne darbesteke badesingî wî digirt
Ne jî me birînên wî bi paçekê yan jî kefenekî hilgirt
Lê belê ew mînanî şervanekî bêhna xwe bistîne radiket
Bi pelerînê xwe yê şer ve, hê jî ji piştê nediket

Me çend diayên kurt kir
Û nekir peyveke bikeser
Lê belê me bi sebat li rûyê mirinê mêzekir
Û bitehlî ramiyan ya sibetir

Em ramiyan, kata dinicirand ciyê wî yê teng
Û rastkir balgîhê wî yê bêdeng
Ku ew dijmin û biyan wê bigerin li ser gor
Û em ê li ser pêlebehra bin li dûr

Ewnê qala giyanê çûyî bikin bi serveyî
Û ax û berên sar xwarbûn li rûyê wî
Lê belê ku hebekî hûrbîn wê bibînin girîngiya wî
Li wê gora ku Brîtonek *lê razayî

Lê belê nivê barê me yê giran hatkirin
Gava katjimêrê bo dema vekîşanê lêdixist
Û me dengê wê tivinga dûr a sergerde bihîst
Ya dijmin, bi lêvdaxistî agir dikirin

Me ew hêdîka û bidilkeser danî gorê
Ji wê qada wî ya navdar a zindî û xwînî hê
Ne kêlikek danî ne jî navek nivîsî lê
Lê belê me ew hîşt bi navê wî ve bitenê

*Brîton: Ew gelê Keltîk (Celtic) e ku di warê çandê de ji Serdema Hesin hetanî Pêşserdema Navîn hikumraniya Brîtanayê kiriye.

Rêya Hevrîşim

Rêzan NAS

Bi ser wî halê westiyayî, porê wî yê kurîşkî û rihê wî tevlihev bûbû. Bi rewşeke jihevdeketî deriyê buroya barkêşiyê vekir û li bar pirsî. Barkêş berî ku bê li barê kuderê dipirse, wî vexwend hundir. Sendelî nîşanî wî da. Piştî axaftina barkêş qediya li ajokarê porkurîşk vegeriya û bê barê kuderê dixwaze pirsî. Ajokar barê Mûsilê dixwest, li ser vê xwestekê, tiqînî bi barkêş ket û got barê dixwaze heye. “Keştî a niha hat û xwe daye ber benderê, siûda te lê da. De destûrnameyên xwe deyne vir û here têkeve rêzê.” Piştî vê mijûlahiyê ajokar ji çentê di destê xwe de destûrname derxist û dirêjî barkêş kir. Di wê navberê de çaya jê re hat vexwar û derket. Bi lez ber bi wîstgeha ku kamyona wî lê bû meşiya.

Kêfa wî li cî bû, ji bajarê Mêrdînê alavê du malan barkiribû anîbû Edeneyê. Ji wir jî rast berê xwe dabû Îskenderûnê û barekî din bi dest xistibû. Îşê wî wiha bidomiyana baş bû, dê pardayînê xwe zû xelas bikira. Ji nedîtî ve rewşa wan her du malan kete bîra wî. Li ser wan her du malên ku anîbûn Edeneyê difikirî. Ew zarokên biçûk, û ew dê û bavên belengaz, li wî bajarê Çûkûrovayê dê çi bikirina, çawa debara xwe bikirana. Dikir nedikir nedikaribû rewşa wan ji hişê xwe derxista. Di nava wan ramanan de gihîşt nik kamyona xwe. Kamyon xebitand û berê wê da benderê. Çend kamyon di pêşiya wî de hebûn. Kamyon îstop kir û serê xwe danî ser dîreksiyonê, bi qasî mirov cixarakê bikişîne, nema û di xew de çû. Bi qasî saetekê raza yan raneza, bi dengê qorneyên maşînan çengbû ser xwe. Çavên xwe firikand li derdora xwe nihêrî, kamyonên pêşiya wî tev çûbûn. Li bayê bezê kamyona xwe xebitand û bi lez û bez kişand ber keştiyê. Zincîrên nava kasê vekirin, bi çakûçê di destê xwe de lastîkên kamyona xwe tevde sax kirin. Di pêlika kasê re hilkişiya ser baxacê. Silînga (vînc) ji nava keştiyê her carê bîst çuwal şekir bi şirîtan bera nava kaseyê dida, ajokarê porkurîşk jî barê xwe bi awayekî pispor li hev rast dikir. Piştî hijdeh şirîtan silîngê kamyona wî dagirt. Erebe ya xwe ji ber keştiyê kişand gasîne. Çadîr bi awayekî pisporî li ser bar raxist û şidand. Li saeta destê xwe nihêrî hê çar saet ji destûrnameyan re mabû, gelekî westiyabû ji bo xewa xwe bişkîne deriyê kamyona xwe vekir û kete hundir, perdeyên camê kişandin û li ser nivînê xwe dirêj kir. Dîsa ew qîzikên ciwan û

malbatên wan ketin bîra wî. Di dilê xwe de digot. “Oof of, dê çawabe halê wan, dê û bavên wan pîr û kal in. Ew ciwan û zarok dê çawa bikin, di nava wî bajarê biyanî de gelo dê ji xwe re îş bibînin? Her cara ez û hevalên xwe, em ji Iraqê vedigerin, em ji başûrê rojhilat malekê yan du malan tînin van bajarên Anatolyayê. Ma ku li welêt kar û xebat hebûya çima dê ji ser xaka xwe koçber bibûna û bihatina van bajarên qirêjî û bi minet. Aax ax! derdê dinê xelas nabe.” Xwest wan fikaran ji serê xwe bavêje. Vê carê jî pardaniyên kamyonê û xoşewîsta wî hate bîra wî. Xew lê herimî. Wî her xwe diquliband vî aliyê û wî aliyê. Ew dûmenên xoşewîsta wî weke şirîta filîmekî di ber çavên wî re derbas dibûn. Xeyalên xelasbûna pardayîna û daweta xwe dikir. Xeyalên wan rojên bin dara gûzê ku pev şa dibûn, ew sozê ku dabûn hev tev di nava mêjiyê wî re diherikîn. Di nava wan xeyalan de digevizî. Wêneyekî wê li hember çavên xwe bi bin perdeyê ve zeliqandibû. Gava diçû ser nivînan perde dikişand. Wêne li hember çavên wî jê re dike niya. Roniyê hêla nivînen xwe bi ampûlê rengî rengî û kêmroneqîşandibû. Bi xeyalên xoşewîsta xwe çavên wî hatin ser hev, nehatin ser hev bi dengê teqîna camê çengbû ser xwe. Barkêşî destûrnameyên wî anîbûn.

Ajokarê porkurîşk ser çavên xwe şûşt, maşîna xwe xebitand. Saet derdora nehê şevê bû, ji bendera Îskenderûnê kete rê. Rê weke rîya mirûstanan dixebitî. Lembeyên wî şeva qetranî di rêya peravên Derya Spî de diqelaşt û weke marê rêş dişemiti. Berê xwe dabû sêrêya Edene û Osmaniye. Berî ku bigihîje sêriyê bi qasî çar pênc kîlometre xwaringehê hebû, xwe bera parka xwaringehê da û qesta xwarina şivê kir. Kamyona xwe îstop kir, çawa ji ser dîreksiyonê peya bû, du heb jin û mêrek bi ber çavên wî ketin. Bi ajokarekî re dipeyîvîn bi wan re eleqe nebû û rast berê xwe da xwaringehê û ji berkar xwest ku tîkegoşt bi lez jê re bîne. Çû destşokê dest û rûyê xwe şûşt û vegeriya maseyê, zeleta wî hatibû ji birçîna îdare nedikir û dest bi xwarina zeletê kir, zelete xelas kir. Bi qasî mirov cixareyekê bikîşîne nema xwarina wî jî hate ber wî. Ji berkar xwest ku dîsa zeletê û bi piranî jî bexdenûs jê re bîne. Xwarina xwe xwar û çend heb çayên tarî jî bi ser de vexwar, û rabû derket. Ji dikandarê bi xwaringehê ve şînokek û hinek xîşir jî

ji xoşewîsta xwe re kirî. Berê xwe da kamyona xwe ew mêrik û jinikek ji wan hîna li wir bûn. Jinikek jê nexuyabû. Mêrik bi ajokarekî din re dipeyivî, xuyabû ketibûn nava bazareke giran. Jinikê jî sê çar gavan xwe ji wan dûr xistibû. Zilamê hevalê jinikan yekî qama wî dirêj, diranê wî weke yê kîvroşka li ser lêva wî ya jêr sekinî bûn, simbelê wî zerik û firk mîna yê pisîkan bû. Mirûzê wî weke yê zebaniyê devê deriyê dojhê, jehr jê dibariya. Di ber wan re derbas bû, li kamyona xwe siwar bû, berê xwe da oxirê.

Pêwîstbû ku bê rawestan bixebitiya, barê wî giranbû divê pardanê xwe zû biqedandina. Rewşa wan her du jinikan û ew mêrikê bêwijdan anî ber çavên xwe û di hişê xwe de bi xwe re nîqaş dikir. “Gelo ew jin ji xizanî, ji bêxwedîtî yan jî ji nezanî dikevin vê rêyê? Na na, tu kes jî bi vî awayî nakeve rêya xerab. Gelo sedem an sûcdar mêr in an jin? Ez dibêjim sûcdarên mezin mêr in û hinek jî nezaniya jinê tê de heye. Hinek jin bi xeyalên jiyanek luks tînan xapandin û piştî ku wê jiyanê xeyalê dikin nabînin, ji aliyê hinek mêrên bêwijdan ve tîne xapandin û wan dixin rêyên xerab. Mêrê bêwijdan bi sozê ku bi wan re

bizewice û wan di jiyanek xweş û di nava hebûnê de bide jiyanandin, wan dixapînin. Ma jiyanek birûmetê divê di nava, luks û hebûnê de be? Na di malê de bila aramî hebe û mirov nan û pîvazê bixwe. Ma ji jiyanekê bêwate û qirêj nexwestir û aramtir e? Dîsa mêjiyê min li hev ket. Divê mêrê nebe sedemê xerabiya jinê, û jin jî hay ji xwe hebe, bi çend gotinên xweş û xapînok neyê xapandin. Wek pêşiyên me gotibûn: jin darê şikestî ye, divê mirov alîkariyê bidê û wê biparêze.” Di nava wan mijûlahiyan de ket hevrazê Çiyayê Gêwir. Hevraz pir dûvedirêj bû xelas nedibû, xewek giran xwe berî ser çavên wî da. Xew û çavên wî pev re ketibûn nava qayîşkêşiyek giran. Her ku çavên wî dihatin ser hev wî di camê de bi şûşê av li ser çavên xwe dikir. Nedibû, xewê bela xwe tê dabû. Qolonya bi ser çavên xwe de dikir, xew ji ya xwe danediket. Nema karibû rêya xwe bidomîne, di nava wê pevçûna xewê de hevraz xelas kir û xwe berî ser navçeya Baxçeyê da li ser dîreksiyonê her bi xewê re şer dikir. Rê derberjêr bû kamyonê xwe dikişand, mirov digot qey ew jî westiyaye, dixwest zû bigihîje

rawestgeha xwe. Ajokarê porkurîşkê fêr bûbû êdî nema kare rêya xwe bidomîne. Xewê zora wî dibir, êdî wî jî bawerî bi Xwedanê erd û ezman anî ku nema kare bileqe. Ew xeyalên ku ji bo pêşeroja xwe û xoşewîsta xwe difikirî, êdî ji bo tev bi avê de neçin, xwaringeha ku ewil gihîştê berê xwe dayê û li cihekî xewle sekinî. Di mîzê de şewitîbû hew pê re gihîşt û hema çû bi lastîkê paş de mîst. Dev û rûyê xwe şûst vegeriya ser nivînên xwe. Lembeya aliyê nivînan pêxist, perdeyên camê kişandin û xwe direj kir. Zok li wêneyê xoşewîsta xwe dinihêrî, ew xişrê jê re kiribûn bi ber wêneyê wê vekir. Di nav wan xeyalên pevşabûnê de çavên wî dihatin ser hev. Saetekê raza yan raneza teqînî ji deriyê ber serê wî hat. Xilmaş bû, ranebû digot qey xewn e. Du sê caran bi hêrs li derî dan, ajokar ji xewa şêrîn veciniqî ser xwe perde da alî kesek nexuyabû. Ji ser nivînê daket ser paldankê û di camê re li jêr nihêrî ku zilamek li derî dide. Cam heta nivî vekir bê ka çi dixwaze. Jinikek jî ji wê de, xwe ji ber ronahiya dîrekê elektrîkê dabû ber siya kamyonekê. Xwe ji ber çavan xewle kiribû.

Zilam pîrsa ku pêwîstiya wî bi jinê heye yan na



kir. Ajokar bersiva bi van tiştan re eleqe nabe da û cama xwe dîsa rakir jor. Vegeriya ser nivîna xwe, lê hîn xwe dirêj nekiribû derî dîsa lêket. Zilamê bêheysiyetê bela xwe jê venedikir. Ajokar bi hêrs pê re xeyîdî ku van tiştan nake û got. “Here ji xwe re li kesên din bigere” û kir ku vegere nivîna xwe, mêrikê bêheqlaq cara sisyan li derî da. “Ma tu ne zilam î, parî hatiye ber devê te dîsa jî tu nizanî

bixwî” li ser vê gotinê ajokar hêrs bû û derî jê re vekir. Ajokarê porkurîşkê çavên xwe girt û deve xwe vekir. Hema çi hat ber devê wî jê re got. “Lawo ma namûsa we tune ye ji vî îşî pê ve tu îşê din tune ye, hûn van rebenan dixin vê riyê û li ser piştê wan bazirganiyê dikin. Ma dê û xwîşkên we tunene, ma keçên we jî tunene, qey pozê we naşewite, namûs di pozê we de tune ye. Ka li der dora xwe binihêrin, ev gel bi dû çi ketiye hûn li dû çi ne? Her roj xort û keçên me tînan kuştin, li nava kolanan însanê bêguneh tînan gulebarandin. Gelo hûn nafikirin bê ji bo çi tînan kuştin? Na hûn nafikirin, we ji xwe re kiriye pîşe keçên feqîr û xizan dixin vê rêya xerab û li ser piştê wan pera qezencê dikin. Ma heqê Xwedê ye hey bêheysiyet, ê weke te dikarin nanê xwe ji

keviran derxînin. Ma hûn ji Xwedê natirsin, ji Pêxember fedî nakin. Ax ax binihêre li vî welatî çî roja ku nûçeyên şer û kuştinan di nûçeyan de neyên dayîn hene gelo? Ji bîra neke malbatek te jî heye, ez nizanim lê jin û keçên te jî teqez hene. De bicehime biqelihe.” Ew mexlûqê bêheysiyet serê xwe bera ber xwe da û ji wira bi dûr ket..

Ajokarê porkurîşk vegeriya ser nivîna xwe lê xew lê herimî. Xwe li ser nivîna xwe dirêj kir, berê wî ket wêneyê xoşewîsta wî. Ew sozê ku dabûn hev, ew rojên ku li nav bax û baxçeyan, li bin dara guzê pev şa dibûn weke şîrta filîmekî di ber çavên xwe re derbas kir. Dikir nedikir xewa wî nedihat. Saet li der dora dudo yê şevê bû, wî her xwe diquliband vî aliyî û wî aliyî ew bûyer ji hişê wî dervediket. Xew nediket çavên wî pir aciz bûbû, cixare ji cixareyê pêdixist. Xew lê herimîbû, ji ber ku zêde cixare kişand mehdê wî xeliya. Rabû cilên xwe li xwe kir û deriyên xwe qefiland berê xwe da xwaringehê, şorbenîskek xwar. Çend heb çayên tarî jî bi ser de vexwarin û rabû, hat li kamyona xwe siwar bû. Berê xwe da oxirê.

Êdî şeva tarî hêdî hêdî xwe dida hev û dora xwe dida rojê. Piştî nîv saetekê bi serê Çiyayê Gêwir ket. Li serê çiyê gelek maşînan xwe dabûn kêleka rê, yên ku lastîkên xwe sax dikirin, yên ku li frênê erebeyên xwe dinihêrîn, pêdiviyên xwe didîtin. Ew jî sekîni hinek fêkî ji wan holikên derdora rê kir û xwe berî berjêr da. Lê qederê çar serseda neçûbû di nava daristanê de kilçan du cara pêket û vemirî. Dîsa îşaret dikirin! Barê kamyonê giranbû rê jî pir berjêr û bi qasî deh kîlometreyan didomand, ji bêhna balatayan mêjiyê mirovan xera dibû. Bi ser wê bûyera şevê din de xew lê herimîbû, hîn bîst kîlometre nehatibû, hinekî din îşaret dabûnê. Ajokar dîsa hêrs bû. “Ya Yezdanê dîlovan tu çêkî, em nema dikarin di ser van rêya re herin û kar û xebata xwe bikin.” Lê vê carê zêde serê xwe pê re neêşand û riya xwe domand. Hindik mabû şefeq lêde, gur û kûçik ji hev dihatin nasîn. Berjêr xelas kir û xwe berî navçeya Komirler da zerikê rojê tîrêjên xwe di piştî Çiyayê hemberî Çiyayê Gêwir, ji Çiyayê Kurmênc ve li camê erebeyan dida. Piştî sî kîlometreyan ketibû hevrazê Dîlokê. Lê bêxew bû barê kamyonê giranbû di hevraz de hêdî hêdî diçû, carinan dihênîjî carinan diveciniqî bi wî awayî hevraz xelas kir. Rojê tîrêjên xwe dida serê wan sehrî û girên derdora Dîlokê. Berê ajokar li rojhilat bû, tîrêjên rojê li nava çavên ajokar dixist, xew pê şêrintir dibû. Lê wî jî bi lez û bez erebe diajot. Dixwest zûka bigihêje xoşewîsta xwe.

Nizanim çavên wî çûn ser hev an na bi dengê korneya tirekê veciniqî. Awênayê wan bi hev çerixîbûn. Lê tirê xwe xelaskir û derbasbû çû.

Ajokarê porkurîşk lastîkên wî yên rastê di şerenpolê re diçûn, çend cara kamyon bi rast û çepê ve çû û hat, lê kamyon rast kir û kete xeta xwe, pir tirsîyabû. Xew ji çavên wî revîyabû. Ew xeyalên ji bo xwe û xoşewîsta xwe difikirî hindik mabû bi avê de here. Rihsitîn wê neqlê li derdora wî diçû û dihat. Xwe gihand xwaringehê û kamyona xwe park kir. Li ser nivînan xwe direj kir. Serê xwe danî ser balgiya ku hezkiriya wî jê re neqîşandibû, kete nava xeml û xeyalên wê û kete xewa şêrîn.....

30.11.2011
ÊLIH



Dosye: ZEND û Bendên Kovargeriya Kurdî
Amadekar: Omer FÎDAN

Çarenûsa Zendê jî girêdayî çarenûsa gelê kurd e
Samî TAN

Berxwedana rohnahiyê
Feratê DENGİZİ

Kovara Çirûskê
Asya GENİM

Di kovargeriya Kurdî de cihê Nûbiharê
Suleyman ÇEVÎK

Di kovargeriya ciwanan de kovaroka xwendekarên
 zanîngehan a zanistîwêjeyî û hunerî “pênGAV”
Kenanê NADO

Di kovargeriya kurdî de rewşa kovarên zarokan
Nesrîn NAVDAR

Kovargerî yan kovarkujî
Serwet DENÎZ

Sansur û kovargeriya Kurdî
Bulent GEDÎK

Kovargeriya kurmançî û ranêzikîyên zimanî
Dilawer ZERAQ

Ajdanek nû li bexçeyê wêjeya Kurdî
Hasan KAPLAN

Kin û kurt bimire kovarmijî
Mahmûd LEWENDÎ

Du kovarên kurdî ji nava rûpelên fanzîn(Kulîlk)ekê
 derketin; Kulilka Ciwan û Kovara W
Sîdar JÎR

Di dîroka kovargeriya Kurdî de ku her û her pêkutî, qedexê, tunetî, tenêtî, jevqutbûn, jevdûrbûn, jevnerazîbûn bûne sebebê kovarkujî û kovarmijiyê ku kujerên hêvî û hewlên kovergeran in em ê dîsa û her tim bibêjin kovarbijî. Kovargerên kurd ên ku mecbûr in ligel kovargeriye kovargerî jî di nav de gelek karên din jî bikin di vê dosyeya me de bûn mêvanên Kovara Wyê û me xwest ku em kewareke êş û hêviyan, serêş û serkêşiyên, bextewarî û bêbextiyê dagirin, xwe binasin da ku em ji kêşana êşan re bibêjin bes û hêviyên xwe geş bikin, dilxweşiya xwe bikin serkêş û serê xwe ji bo afrîneriyê biêşînin, çek û rex-tên bextewariyê girê bidin û bikin xwedî text û bextên ji bêbextiyê dûr. Ligel lêborîna ji bo kêmasiyan û spasiya bo cangoriyan; bi hêviya ku ev kewar bibe yek ji daneyên ku kurdan hin bêhtir bike xwedîkovar û pirtûk û weşanxane û çapxane û bîr û rewşenbîrî û...

Çarenûsa Zendê jî girêdayî çarenûsa gelê kurd e Samî TAN



Kovara Zend weşana Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ye. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji sala 1992'yan bi vir de der barê ziman, wêje û dîroka kurdî de xebatên lêkolînî dike û di vî warî de berhemman dide. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê saziyeke akademîk e û der barê ziman, wêje û dîroka kurdan de xebatên lêkolînî dike. Zend jî wekî weşaneke lêkolînî bi gelemperî cih dide nivîsên der barê ziman, wêje û dîroka kurdî de. Ew dixwaze bingeha xebata akademîk bi zimanê kurdî ava bike, rê li ber lêkolînên bi kurdî veke.

Armanca Zendê daye ber xwe wê ne karekî hêsan e. Lewre zimanê kurdî nebûye zimanê perwerdehiyê û piştî polîtîkayên qirkirina spî ya bi dehsalan, şikest xwariye û qels û lawaz bûye. Heçî zimanê devkî ye, heta van salên dawîn jîngehên xwe yên surîştî geş û serdest bû. Lê zimanê nivîskî heta radeyekê li medreseyên kurdî bi pêş ketibû û pê berhemên wêjeyî hatibûn nivîsan. Piştî jî li navendê mîna Stenbolê hin berhemên mîna Mem û Zîna Ehmedê Xanî, Dîwana Melayê Cizîrî, Hîkerê Zimanê Kurdî û kovarên mîna Jîn, Rojî Kurd, Kurdistan bi kurdî hatibûn weşandin. Lê piştî komara Tirkîyeyê, medreseyên kurdî hatin qedexekirin û saziyên rewşenbîrî yên kurdan jî hatin belavkirin. Ji ber vê yekê zimanê nivîskî derfetên bi pêşketinê bi dest nexistin.

Di salên 60'î de piştî "mîtîngên Rojhilat" ên Partiya Karkeran a Tirkîyeyê (TİP) û têkoşîna ciwanên kurd, hinek berhem li ser navê kurdan hatin weşandin, lê di wan berhemên de jî zimanê tirkî serdest bû. Em bala xwe didin kovarên mîna Deng, Dicle Kaynağı, Dicle –Firatê em dibînin ku tê de pir kêman nivîsên bi kurdî hatine weşandin. Heta salên 80'yî rewş bi gelemperî wiha bû, bi tenê çend pirtûk bi kurdî û çend weşanên peryodîk jî bi du-zimanî hatine weşandin. Tekane kovara xwerû bi kurdî Tîrêj e, ew jî bi tenê çar hejmar hatine weşandin. Di wan weşanan de jî nivîsên lêkolînî bi gelemperî bi tirkî ne. Piştî salên 80'yî qada xebatên kurdî Ewropa ye, li wir hinek berhemên lêkolînî derketine. Di salên

90'î de li Stenbolê wekî encama geşedana têkoşîna gelê kurd xebatên rewşenbîrî bi pêş ketine, di vê serdemê de Enstîtuya Kurdî hatiye avakirin û piştî demekê jî Zendê dest bi weşanê kiriye.

Zimanê kurdî jî ber kend û kospên ku dagirkeran li ber danîne, wekî zimanekî nivîskî pir bi pêş neketiye. Berhemên ku bi kurdî hatine weşandin jî bi gelemperî berhemên wêjeyî ne. Di serî de helbest, hinek berhemên wêjeyî yên mîna çîrok, roman û bîranîn jî bi kurdî hatine weşandin, lê belê berhemên lêkolînî pir kêman in. Gelek rewşenbîrên kurd jî berhemên xwe yên lêkolînî bi zimanên din nivîsandine. Ev rewş kend û kospa sereke ya li ber xebatên Zendê ye, kesên ku nivîsên lêkolînî dinivîsin gelekî kêman in. Di warî de saziyên ku mirovan perwerde bikin, nîn in. Ji ber vê yekê jî amadekirina hejmareke tîrêj û tesel ne ewende hêsan e. Ji ber vê sedemê gelek caran Zend di dema diyarkirî de nagihêje ber destê xwendevanan.

Her wiha bi qasî nivîskarên wê xwendevanên wê jî kêman in. Ji ber ku ev kovar xîtabî her kesî nake, kesên ku vê kovarê bixwînin û jê sûdê wergirin divê kesên têgihîştî û perwerdekirî bin. Kovarên bi vî rengî bi piranî li zanîngehan tên belavkirin û jî hêla kesên pîspor û lêkolîner ve tene xwendin. Lê belê li bakurê welatê me, hê jî zanîngehên me nîn in, kesên bi zimanê kurdî xebatên akademîk dikin jî pir hindik in. Ev yek bazara kovarê jî teng dike. Ligel vê yekê jî kovara Zend wekî kovareke lêkolînî bingeh ava kiriye û nav û dengê wê di nav qada akademîk de heta radeyekê berbelav bûye. Lê ji bo ku kovara Zend bi awayekî têkûz bi karê xwe rabe, divê kurdî bi zimanê perwerdehiyê û zanîngehên bi kurdî vebin.

Li gorî baweriya me, ji bo geşedana di warekî de kovar pir girîng in. Pîrî caran bingeha xebatan, bingeha dibistanan bi xebatên kovaran hatiye danîn. Her wekî tê zanîn lêkolîner pêşî bi gotar dest bi xebatê dikin, piştî ew gotar bingeha pirtûkan pêk tînin. Kovara jî kes û komikên têkildarî warekî din qadeke derbirîna bîr û ramanan. Me divê Zend



jî bibe qada xebatên lêkolînê yê xwerû bi kurdî. Ji ber vê sedemê me tu caran dil nekir ku em kovareke duzimanî derxin. Li şûna ku em deriyê xwe ji gotarên bi zimanê din re vekin, me gotarên girîng ên ku bi zimanên din hatine nivîsandin li kurdî wergerandin. Bi vê yekê jî me hêz û şiyana zimanê kurdî nîşanî her kesî da û bîngeha rêbaz û şewaza akademîk a zimanê kurdî xurt kir.

Kovara Zend pêşî wekî weşaneke peryodîk, piştî jî wekî rêzepirtûk hatiye weşandin. Di kovarê de bi giranî gotarên bi zaravayê kurmançî hatine weşandin, lê belê gotarên bi kirmanckî û kurmançiya jêrîn (soranî) jî tê de tîşkên roniyê dîtine. Di her hejmara kovarê nêzî 15 heb gotar têne weşandin. Heta niha wekî rêzepirtûk 19 hejmar hatine weşandin. Heke em hejmarên berî wê bihesibînin, 26 hejmarên Zendê hatine weşandin. Li gorî vî hesabî heta niha di Zendê de bi sedan gotar ji warên cur bi cur de bi zimanê kurdî hatine weşandin.

Di destpêkê de zêdetir nivîsên der barê rêzimana kurdî, dîroka wêjeya kurdî û dîroka kurdî de di kovarê de hatine weşandin. Lê belê piştî geşbûna têkoşîna parastin û pêşvebirina zimanê kurdî û avabûna Tevgera Ziman û Perwerdehiya Kurdî (TZPKurdî) nivîsên der barê mafên ziman, perwerdehiya bi zimanê dayikê û hişmendiya parastina zimanê dayikê de zêdetir tê de hatine weşandin. Ji

bilî van her sê mijarên sereke ku me qala wan kir, di Zendê de gelek warên mîna civaknasî, aborînasî, huner, felsefe, zanist û teknoloji, ragihandin û hwd. de jî gotar û werger hatine weşandin. Di kovara me werger ne tenê ji zimanê tirkî, erebî û farisî, her wiha ji zimanê mîna rûsî, îngilîzî, fransî, almanî û hwd. hatine kirin.


Her wekî tê zanîn ji sala 2000'î bi şûn de saziyên rewşenbîrî yê kurdan ku li derveyî welêt, li Ewropa û metropolên Tirkiyeyê hatibû avakirin, li welêt vegeyiran. Îro êdî navenda xebatên rewşenbîrî yê bakurê Kurdistanê Amed e. Niha li Amedê gelek saziyên rewşenbîrî hatine avakirin û gelek weşanxane li Amedê pirtûkan diweşînin, her wiha nivîsgeha navendî ya gelek kovaran jî li Amedê ye. Ev cihê kêfxweşî ye. Her çiqas girîngiya saziyên li metropolan kêmkiribê jî barê li ser milê wan sivik nebûye.

Lewre bi milyonan kurd îro li metropolên Tirkiyeyê dijî. Pêdiviya parastin û pêşvebirina zimanê kurdî li metropolan xwe zêdetir dide rabîhîstin. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê jî her çiqas venegeriyabe welêt jî di nav xebata parastin û pêşvebirina zimanê kurdî bi awayekî çalak cih digire. Kovara Zend li Stenbolê tê weşandin (jixwe piraniya weşanên kurdî hê li Stenbolê têne çapkirin), lê berê wê li welêt e. Pirs û pîrsgirêk ziman, wêje û dîroka kurdî bi şewazeke akademîk di Zendê de têne nîrxandin. Zend jî li gorî pêdiviya civaka kurd çî li Kurdistanê çî jî li derveyî Kurdistanê xebatên xwe didomîne.

Wekî encam, em dikarin bibêjin ku çarenûsa Zendê jî girêdayî çarenûsa gelê kurd û zimanê kurdî ye. Heta ku civaka kurd û zimanê kurdî azad nebin, qada rewşenbîrî ya kurd jî geş û xweş nabe. Ji bo ku hejmara nivîskar û xwendevanên kovarên mîna Zendê zêde bibe, divê zimanê kurdî bibe zimanê perwerdehiyê û zanîngehên ku bi kurdî perwerdehiyê didin vebin.

Berxwedana rohnahiyê

Feratê DENGİZÎ



Berdêla rewşenbiriye barekî girane li welatê me, nexasim di şert û mercên mêtîngeriye û di bin desthilatdariya Tirkiyeyê de...

Tunedîtî, înkâr, qedexê û cerda kokqelandinê ku kirasê “teror”ê jî lê dîkin, dixwazê rêya rohnayiyê, rohnayiya ku kurd dixwazin hebin, bijîn û bi zimanê xwe bigihên hemdemiyê kiriye mîna daristana diriyê çalo, weke “Beko Ewanî.” Lê evîn qeyd û bendan nasnake, tew ku evîn bibe azadî, azadiya hebûnê ya man û nemanê... Zordestî ewqasî har e ku, tu kesî ji dema hov û heta niha li xwe danenî/danetanî kes/kesên bêçek û nexasim jin (jîn)/jinan bikuje; lê serdetiya genî û zilma dagirkeriya bêşerm qaşo li navenda şaristaniya hemdem î pêşveçûyî ev qirêti jî diyarî mirovahiyê, qaşo mirovahiya demokrat û demokrasiyê kir.... Wey li minê, ez porkurê modernîzma qaşo pêşketî me! Gelo bi qetilikirina sê kulîlkên azadiyê li Parîsê bi hovî jan nexist hestiyên W. Hugo û J.J.Russo!

A di van şert û mercan de ku; qeyd û bendên li ber rewşenbîrî, nivîskarî, weşangerî û kovargeriye mîna tenikiya pira selatê û agirê dojhê ne; dixwazim hin aliyê dijiwariya kovargêriya Kurdî parve bikim.

Qedexê û înkâr li aliyekî; lê ligel van barê me wisa girandibe ku, pêlik bi pêlik ez wisa pê de herim:

Di serî de, ji ber qedexeya li ser zimanê me ya dijiwarî ya bi dehsalan, qadroyê ziman kêmtir in. Ligel hewldana van salên dawîn her çiqasî derfet û pêşketin hene jî; qadroyên qada ziman kêmtir û qels in. Nexasim karên ku pîsporiyê dixwazin, ên mîna; edîtorî, redaktorî, mîzanpajî û herwiha... Hilbet tîkiliya vê bi rewşa aboriyê jî heye; bi Kurdî ‘nan’ zor peyda dibe. Ev qad dilîniyê, fidakarî, hişmendî û ramana dahatûyê dixwaze, fikirandina netewî û birdoziyê dixwaze. Dîsa xew û xemsariyê giran heye li ser nîfşê me ku hişyarî ne hêsan e. Bi ya min, di wî warî de karê hişmendiyê jî qels e; ligel ku Komeleya Nivîskaran, TZPKurdî, Enstîtû, Akademiya Ziman û Kurdî Der hene jî, ligel

kêmasiyên me yên tevgerî û yên qadê, ku xebatên me bi xeletî, şaşî, berjewendî û kêmasiyên kesayetan berbihewa dibin û herkes berê xwe dide dahatû û xeyalên xwe, li ritbe, meqam û navan digere gelekên me; kurd, Kurdî û kurdewarî xisarê dibîne, xisareke mezîn! Bar li ser kedkarên vî zimanî û yên tevgerê dimîne. Koordînekirin jî karekî zor e, bikêrhatinê dixwaze. Û herwiha barê giran li piştê civakê ye û tîkildarî jî qels û hindik e. Bi ya min jî vî karî re perwerdehî divê û divê plansaziyên cidî û projeyên berfireh û demdirêj çêbibin. Her kes li gorî derfet, kar û zanîna xwe tiştina dike, lê ev belewela ye. Hewcetî jî hevkarîyê re heye.

Ya dudoyan, rewşa aboriyê ye. Kovar zêde nayên firotin. Eleqe li gorî dem û divêtiyê kêmtir e. Belavkariyê sererast î berfireh nîne. Kêmfirota kovaran dibe sedema kêmhatinê, ev rewş dike ku qadro zêde peyda nebin û tu bikaribî hewcedariyên modern î estetîkî bikarbînî. Yanî bi fidakariyê bi tenê mirov di vê jiyana berhevbûnî û reqabetî de nikare zêde geşbûn û pêşketinekê bide wêjeyê. Reweşên teknîkî û aborî zêde demê digirin û tîgihîştin û ramanê belav dike. Hilbet ez rewşê radigihînim, ne bêhêvîti û hincetan bi rêz dikim. Em weke Kovara W bi zêdayî kovaran jî şaxên Kurdî Derê re dişînin, lê rewşa wan a aboriyê jî zêde ne baş e. Ligel operasyonên siyasî yê qirkirinan, rewşa neperwerdebûyî û pirguherîna rêveberan, di vîra de zêde pîrsgirêkan derdixê holê. Bi vê mebestê ez girtina nivîskar, aktivîstên zimanê Kurdî û serokên komeleyan şermazar dikim û di kesayeta Mîrza Ronî û Selahattîn Çam de silav, hurmet û dilsoziya xwe bi wan re tînim ziman ku ew rohiya çavên me ne... Dîsa li pirtûkfiroşan, ligel ku van salê dawîn eleqe hebikî zêdebûbe jî, berhemên Kurdî zêde nayên firotin. Xisûsiyetek civaka me heye; kes zêde li berhemên Kurdî nagere lê ku berhem tene ber wan teksîr nakin lê xwedî derdikevin. Divê em bikin ku kovar bigihên ber destên wêjehezan, lê divê ew jî li berhemên Kurdî

bigerin. Dîsa ji ber rewşa aboriyê rojên înzeyan, an çalakiyên hunerî û reklam jî zêde nayên kirin. Ku em dikaribin reklamê bikin û hebikî rewşê bi civakê re parve bikin ez bawerim ew ê asta rewşenbiriya û têkiliya Kurdî biguhere. Di vê mijarê de qelsiya me jî heye. Dîsa piştigiriya şaredarî û hin saziyên me jî kêmtir û qels in. Divê ew jî zêdetir li rewşa berhemên bi Kurdî baldar bin. Di vê mijarê de dixwazim du xalan parvebikim û dixwazim bê nîqaşkirin **Yek;** mafê nivîskaran ê telîfê. Bi rastî divê ew rewş were nixandî û bi ya min nivîskarên Kurdî jî vîna heq dîkin. Wek kovara W bi rastî ku em dikaribin rewşa xwe ya aboriyê sererast bikin, em di vî warî de hestiyarin, lê mixabin em carinan nikarin kovarekê jî bigihînin nivîskarê xwe. Rastiya me ev e. Divê li ser vê rêbazê guftûgot hebe. **Dudo;** di derheqê panêlan de, dema ku nivîskarek an jî edîtorê kovarekê hat dawetkirin î panêlekê divê hin berhemên wî (mînak, 50 pirtûk an jî kovarên edîtor) bê gotin bêne kirîn, ev ê moral û hêzê bêde wêjeyê...

Ya sêyemîn jî, rewşa belavkariyê ye. Dixwazim bi vê xalê nivîsa xwe biqedînim, hilbet gelek rewşên kovargêriyê dikarin bêne nixandî. Lê nivîsek têrê nake û ez giraniyê didim van her sê xalan. Belavkariyeke me ya sererast nîne. Her çiqasî *firat dagitim*, vî karî dike; lê karê wan bi belavkariya Azadiya Welat sînordar e. Xwezka dikaribûna belavkariya weşanên Kurdî tev bidanan ser xwe. Lê ez dizanim û bawerim ku rewşa aboriyê piştî wan jî kul dike. Mesref zêde li belavkariyê diçe û ew jî ne bi pergal e. Em bi hêza xwe li Amedê kovarê belav dîkin û yê derveyî Amedê jî bi kargo, lê zêde barê wê ji me re giran e. Belavkar peyda nabin û ez bawerim zêdeyê kovarên Kurdî nagihên zanîngehan. Ku kovar li zanîngehan bêne belavkirin, ez dibêjim ew ê tîraj bilind bibe, lê mixabin. Em carinan dixwazin bi xwendekarên li zanîngehan vî karî bikin, lê em bi ser nakevin. Ez bawerim ev qad di vî warî de beyar e. Dîsa ez difikirim ku karmend û dewlemendên me kurdan di belavkariya berhemên Kurdî de hevkarîyekê bikin ew ê pir baş be. Divê ew jî milê xwe bidin vî karî, destên xwe têxin bin bar. Ev deynê Kurdî ye ji bonî wan. Kurdîhezî, welatparêzî vîna divê. Lê mixabin maldarên me hê jî berê xwe nadin vê bazarê. Têkilyên di navbera weşangeriya me kurdan de jî hêjayî nixandinê ye. Qe nebe divê yê ku karê kovargêriyê dîkin, dikarin hawîra hevkarîyekê ava bikin. Bi rastî ka em çend kovarger hevdu dinasin an jî têkiliyekê datînin? Gelo em nikarin civînekê li dar bixin? Ez bang dikim ku em kovargerên kurd civînekê li dar bixin û pirsgerêkên xwe nîqaş bikin. Ez dibêim ku em dikaribin

têkiliyeke hevkar derxin holê wê ev jî ji belavkariyê re çareserîyekê derxe holê.

Bi ya min bendên herî giran ên li ber kovargêriya Kurdî ev in.

* * *

Ez karê me yê kovargerîyê mîna berxwedêriya rohnayiyê dibînim, wek Geotheyê ku ji bapîrê me Zardeşt deyn kiriye; “hê zêde rohnayî!”

Kovara Çirûskê

Asya GENIM



Kovara “Çirûsk”ê bi dengêkî agirî ji dojehê silav da me. Di sala 2007’an de dest bi weşanê kir ango dest bi berhevkirina çirûskan kir. Kovara “Çirûsk”ê ji çar mehan carekê wek kovareke hunerî û ramanî bi direktoriya Renas Jiyan derdikeve.


Kovara “Çirûsk”ê bi derketina xwe berî her tiştî ji sedî sed Kurdîbûn ji xwe re kiriye armanc. Bêgûman bi Kurdîbûna xwe, wê xwest ku qalîteyeke wêjeyî, ramanî û hunerî derxe, ji bo bilindkirina çitaya Kurdî hewcedarî bi karên binaverok û bi disiplîn hebû ku kovara “Çirûsk”ê ji derketina xwe û heya îro ji van prensîban bi tu awayî daneket. Wek di destpêka kovarê de hateye

gotin, her civak bi hunera xwe ya xwedî dil û aqil, xwe serbest û bedew dike. Mesele ev e ku bi dilekî henûn û bi aqilekî Kurdewar afirandina raman û hunerê ye. Civakeke ku bi sedan sal ji xezeba bindestiyê xwe rizgar nekiriye û her bi şûrê serdestan hatiye ricimandin, ev hêrs dibe agir û bi laşê mirovî dikeve, lê divê neyê jibîrkirin ku hêrsa bêaqil û agirê bêruh xwediye xwe bi ser naxe.

Her kar ji bo xwedî bandoreke civakî be divê xwe li dora derdekî birêxistin bike. Kovara “Çirûsk”ê wek têgeh projeya salan bû. Rênas Jiyan cara ewil li ser têgehkirina “Çirûsk”ê ango di çarçoveya “Çirûskîzm”ê de xebata xwe ya ewil ango berê ewil yê “Çirûskîzm”ê berhema xwe ya helbestê ya bi navê “Mexzena Xwînê” derxist bi dûre kovara “Çirûsk”ê welidî. Ji bo Çirûskîzmê projeyeke girîng û bi bandor bû ji ber ku kovargerî karekî rewşenbîrî ye; civakên xwedî hiş li dora kar û xebatên hunerî û ramanî bilind dibe. Her derdorên hunerî yên xwedî raman û têgeh bi derxistina kovaran dengên xwe digihînin civakê. Kovargerî karekî dijwar e, kedeke mezin jê re divê, hem kedeke laşî hem jî kedeke ramanî jê re divê.

Kovara “Çirûsk”ê li gel hunera Kurdî guh dide ramanê jî, di her hejmarê de ji disiplînê cuda nivîs weşandin. Kovara “Çirûsk”ê bi vê yekê bawer e ku her pênuşeke nuh û her xwendevanekî nuh di bêhnstendina civakê de wê xwedî bandoreke girîng be. Ji hejmara ewil û vir ve me tim hewl da li gel pênuşên bitecrube cih ji nivîsen nuh û navên nuh re vekiin. Ji bo me hemû nivîs bi qîmet in ku bi tenê nivîs û nivîskarê nivîsê zimanê xwe layiqî erdeke hêja bibîne. Di her karê civakî de berî ku biryara kirina karî bê dan divê ewil mijar baş bê naskirin û ya girîng ji wî karî bê hezkirin. Bi derxistina kovara “Çirûsk”ê em bi tenê peywira xwe ya civakî bi cih naynin, gava ku me kar kir divê em baş bikin, an em nekin an jî me kir divê em karên hunerî û ramanî baş nas bikin û her karê ku hate kirin divê li gorî krîterên dinyayê bê kirin.

Em xwe û zimanê xwe kêmtî tu kesî nabînin, em



pê bawer in ku karê ji kedê biwelide wê karibe di bedewkirin û bilindkirina civakê de bandoreke girîng çêbike. Em baş pê dizanin ku bi salan li gel hebûna xwe me tim xwe tune hesiband, me du qirûşê xwe di zimanê xwe de neda û ya bi qebhet Kurdên qaşo hişyar di warê bawerîçêkirinê de tu xîret rê neda. Kovara “Çirûsk”ê vê yekê pirr girîng dibîne û ji bo derxistina baweriyê, mîsyoneke dijwar li xwe difesilîne. Di hazirkirina serbestiya civakê de mirovên xwedî bawerî hêza guherînê di hewînî di hundirê xwe de. Di civakeke bindest de tiştê herî bi zehmet avakirina baweriyê ye. Her mirov bi windakirina baweriyê takekesî hêviya azadiyê jî winda dike. Wêjeya me ango bîra me, hebûna xwe dispêre mîrateya Feqîye Teyran, Melayê Cizirî, Ehmedê Xanî, Mîr Celadet Alî Bedir-Xan û gellek navên ku mirovî serbilind dike û vê mîrateyê jî bo xwe destpêkeke girîng dihesibîne. Problem ev e ku em nikarin daqulî hebûna xwe bibin. Em hinekî karibin çavên xwe ji çîrokên serdestan ku bi salan e me xwendine vekin em ê bibînin ku em ji dîrokeke esîl tîn.

Kovara “Çirûsk”ê rûpel bi rûpel xwendina dîrokê li me ferz dike da ku em ji nuh ve ji xwe re bîrekê çêbikin û wê bîra me ya ku bi her alaven gennî yên serdestan hatiye sergokirin xera bikin û paqij bikin. Em ji azadiya mirovan hez dikin, em ji xwe jî hez dikin, em ji Kurdên azad hez dikin, ji ramana azad, ji hunera azad hez dikin. Bindestî, ne qeder e û li eniya me nivîsiye, bindestî bêkêriya me ye. Kovara “Çirûsk”ê ji bindestiyê hez nake, ji serdestiyê jî hez nake, ji hêza serdestan û ji şellafiya bindestan mehdaxelandî dibe. Mirovê ku karibe li êgir binêre wê karibe ber fanêrê xwe bi çirûskan mişt bike. Çirûsk hembêzkirina azadiyê ye.

Bi çirûskan em ê tarîtiyê biçirînin, ji bo dîtina mirovî hinekî ronkayî divê, çirûsk jî bo ronkayiyê berê me dide hundirê me. Em ê daqulî hundirê xwe bibin, em ê bi xwe re li hev bikin, em ê ji ber xwe fedî nekin, em ê karên baş layiqî xwe bibînin, em ê heya tu bêjî bes bi Kurdî biafirînin û hemû zanînen xwe bi Kurdî bikin. Em her peyveke Kurdî di avakirina azadiya xwe de wek nirxekî girîng dihesibînin. Her peyv wê bê watekirin, her peyva ku bi ruh bû li dora xwe wê çirûskan vêxe. Her çirûsk hinekî din êvarên me dibiriqîne.

Kovara “Çirûsk”ê tim nêzikî mirovên êşiyayî disekine û mirovên êşiyayî jî xwe nêzikî wê dibînin. Bi salan mirovên ku bi çîrokên derewîn hatine xapandin û ji afirîneriyê bi dûr ketine kovara “Çirûsk”ê hewl dide ku wan mirovan ji wê bîra reş û tarî derxe.

Jin jî ji wan mirovên ku bi salan ji karên civakî yê rewşenbîrî, hunerî bêpar mane, ji ber vê yekê

pêşeroj û paşeroja jinê stewr bûye. Mijara jinê ji bo me girîng e, her peyveke mê, her hevokeke mê, em baş pê dizanin ku di vî nîrê bêbav de wê ji bo me hinekî din erdê bêhnstendî fireh bike. Ziman di zikê dê de bi pitikê re diwelide. Dêbûn, jinbûn divê bi gellek jinên Kurd bête hînkin. Me tim qîmet da afirîneriya jinê. Em di her qadê de piştgiriya didin jina berhemdar a xwedî hiş û xwedî bawerî.

Kovara “Çirûsk”ê bi sekna xwe ya têgehî li hember bindestiyê û hêlinên wê, agirekî dogehî ye. Bi agirê xwe bêhişiya bindestiyê û Kurdên ku li hemberî alavên serdestan av bi devê wan dikeve ditirsîne. Ji ber ku bi hebûna xwe varrîlîn û bi derketina huner û ramana esîl bindestî û hêlinên bindestiyê hinekî din di çirrava xwe de diperpîte.

Kovara “Çirûsk”ê li hemberî dîroka gennî ya serdestiyê bersiveke weha ye; “Ji bo ku Tirkî têra min nake ez bi Kurdî dinivîsim”

Kovara “Çirûsk”ê;

Ji Kurdî hez dike.

Ji azadiyê hez dike.

Ji sewta vîndar hez dike.

Ji xwezayê hez dike.

Ji jina “giyan-dê” hez dike.

Ji mirovên xwedî bawerî hez dike.

Ji êgir hez dike.

Ji dîlpakiyê û ji esîltiyê hez dike.

Kovara “Çirûsk”ê

Ji bindestiyê hez nake.

Ji serdestiyê hez nake.

Ji kesayeta dîlbijok hez nake.

Ji bîra bêbîr hez nake.

Ji civaka ku sergoyan layiqî xwe dibîne hez nake.

Ji jiyanên bêxem û bê derd hez nake.

Ji hevoka, ez Kurd im lê bi Kurdî nizanim, hez nake.

Ji kesên ku dibejin; “Ez karên xwe bi Tirkî dikim ji bo ku Tirk ji min fêm bikin.” hez nake.

Di kovargeriya Kurdî de cihê Nûbiharê Suleyman ÇEVÎK



Pêşî ez dixwazim bibêjim, kesê meşxûl bûye dizane, amadekirin û çapkirina weşanên bi period, ji kitêban hem bi zehmetir e hem jî bi mesreftir e. Kitêb ji meriv re weke dosya hazir tên; kovar ne wisa ne, divê meriv binîvîse, nivîsan berhev bike, di wextê de derxe, belav bike û hwd.

Ji aliyê mesrefê ve jî piştî kovar derket çî hate firotin ew e. Careke din weke kitêban nayê çapkirin ku bête firotin. Ji ber evê sedemê karê kovargeriye jî weşandina kitêban zehmetir û bi mesreftir e.

Wekî ku tête zanîn, heta sala 1991ê bi zimanê Kurdî nivîsandin, weşangerî qedexê bû. Cuntaya 12ê îlonê dema bi darbeyek leşkerî hate îqtidarê bi qanûnê resmen zimanê Kurdî qedexê kiribû. Turgut Ozal dema di sala 1991an de ev qanûna qedexeyê rakir, pêşiya zimanê Kurdî vebû. Li pey evê tarîxê êdî dikaribûn weşanên Kurdî li welatê Tirkîyê resmen derbikevin.

Beriya vê, Kurdên ku di salên 1980yî de mecbûren çûbûn Ewrûpayê, bi alîkariya dewletên Ewrûpa, bi taybetî jî li Swêdê, dest bi weşana Kurdî kiribûn û di Kurdî de berhemên gelek baş weşandibûn. Lêbelê anîn û belavkirina van weşanan bi welat hem jî aliyê siyasî ve hem jî ji aliyê maddî ve gelek bi zehmet bû.

Herçiqas beriya ev qedexê rabe, di nav rûpelên hin kovarên Tirkî de ku Kurdan yan jî çepên Tirkan derdixistin de carina nivîsên Kurdî biweşin jî, ev tişt zêde tişt îfade nedikirin û gelek jî kêmbûn.

Xebata me du baskî ye

Dema ev qedexê rabû, wekî gelek weşanên Kurdan Nûbiharê jî wê demê dest bi weşanê kir. Weşanxana Nûbiharê di Adar/Nîsana 1992yan de, kovara Nûbiharê jî pênc meh li pey vê, di Çiriya pêşin/Cotmeh 1992yan de dest bi weşana xwe kiriye.

Ji wê rojê ve hetanî îro xebata Nûbiharê bi du alîyan ve dewam dike. Ji alîkî ve jî bîst salî zêdetir e ku em sê mehan carekê kovareke seranserî bi Kurdî derdixin, ji aliyê din ve em kitêban diweşînin. Heta niha me 122 jimar kovar, ji sedî zêdetir jî kitêbên Kurdî weşandine.

Nûbihar çima derket

Eger ji bo me mextûriyet, bindestî, perîşanî û birîna gelê me derd nebana helbet xebateke wekî Nûbiharê jî nedibû. Nûbihar ne di demên rehet de, di salên gelek zehmet û dijwar de ketiye piyasa Kurdî ya îslamî. Hesasiyeta me ya li ser Kurdî bûye sebeb ku em dest bavêjin karekî weha.

Derketina Nûbiharê bi niyeteke samîmî ye, bi armanca xizmeta ziman û çanda Kurdî ye. Di vê dema xwe ya dûvdirêj de, Nûbihar heta niha seranser bi zimanê Kurdî derketiye. Heta niha bi niyeta ku ji çand û zimanê Kurdî re xizmetê bike, çand û zimanê me pêşde bibe, li hember qedexekirin û asimilasyonê bi sekneke însanî û Îslamî sekiniye û li roj bi roj li kutubxana Kurdî kitêbên nû zêde kirine.

Hem li gor qaîdeyên cîhanî û hem jî li gor qaîdeyên Îslamî me weşaneke bi zimanê Kurdî ji bo Kurdan heqekî tabî'î didîtiye.

Helbet tiştên me kirine hene, lê tiştên me nikaribû bikira zêde û zêde ne. Me xwestiye ku bi zimanê Kurdan ilm û zanîn geş bibe...

Karê ku em dikin pîroz dibînin, qîmetê didin karê xwe. Ji derûdorê, ji hezkiriyên zimanê Kurdî dema meriv pesnan dibihîze, çend gotinên xweş tene gotin, em wê demê xweştir fêm dikin ku xebata li ser ziman çiqas tiştêkî bi qîmet û hêja ye...

Ji bo milletekî tiştê herî girîng çand û kultur e; esasê çandê jî ziman e. Millet li ser zimanê xwe heye. Mirina ziman, qelsbûna ziman qelsbûna milletekî ye, mirina milletekî ye... Tiştê ku milletan li ser piyan dihêle çanda wî ye, zimanê wî ye... Nûbihar jî heta niha li ser vê xetê maye û xebitiye.

Taybetiya Nûbiharê

Di mijara nivîsandin û xwendinê de Kurdên li Tirkîyê dunyayên ji hev cihê de dijîn:

Bi sedsalan e ku li medresên Kurdan kitêbên Kurdî tene xwendin, mela û feqî şîran dinivîsin, digel diwanên mewcûd, diwanên wan hene, kesê ji kultura medresê û îslamê pêpar e van tiştana nizane û haya wî jê tune. Li welat bi sedan û bi hezaran feqî hene û evana bi tipên Erebi tiştana

Nûbihar

KOVARA ÇANDÎ HUNERÎ EDEBÎ



- Divê em li benda merhemeta kesî nemîn! Süleyman Çevik
- Li Çiyayê Kûrmêncê Şêxê Eşarengîz S. Îşık-N. Eminoglu
- Hilayeyên menzûm û destanên Feqiyê Teyran Xweşnêr
- Bersivêk li ser bersiva M. Xalid Sadîni Seîd Dêreşî
- Zeylê Şerefnameyê de mîrêyê Piliyî Wîsî Zozani
- Şerîfîya xwezaşî Rojen Barnas
- Bavê min û Şivan, ez û Şakiro İbrahim Oguz
- Robozê Berken Berelî
- Dîyarîya Paskalyayê: Zimanê Kurdî Karen Krüger
- Li ser Melayê Cizîrî Martin Hartman
- Felsefeya perwerdeya zimanê zikmakî Abdulkadir Gök
- Nûstandek li ser wergera Mesnewîya Nûrîye M. N. Basneyî
- Pêdiviya Medresetê z-Zehrîyê
- û avakirina wê Bediuzzaman Seîd Nûrî Werger: S. Dilovan
- Edebiyat û hêza edebiyatê Hesen Polat
- Biyanîyên Almaniyayê Takyettin Kızılkaya
- Canim Mem Med

DOSYE: JINA KURD

Dicle Ferzan, Gulcan Hevreslî, Gulistan Perwer, Gulşan Orhan, Hatice Yılmaz Aslan, M. Xalid Sadîni, Melahat Uluç, Nesrîn Bayram, Nevîn Güngör Resan, Omer Dilsoz, Ramazan Pertev, Rohat Alakom, Rojbin Ozkan, Rûken Çalğırtan, Rukiye Ozmen, Sadîllah Silêvî, Salihê Kevirbirî, Tehsîn İbrahim Doskî



SAL: 20 CILD: 16 ZIVISTAN 2013 BİHA 6 ₺

dixwînin û dinivîsînin em pê nizanin. Ev dunyayek e.

Dunyaya din; dunyaya Kurdên di mektebên modern de xwendine û ji kultura medrese û îslamê dûr in. Evana jî qet haya wan ji medresan û mufredata wan tune. Evana qet hevûdu nas nakin, navbera wan de danûstendin tune...

Rola Nûbiharê li vê derê derdikeve holê:

Nûbihar pira navbera do û îro ye. Do û îro li hev tîne. Klasîkên do tîne digihîne îro. Nûbihar li alîkî di nav çanda medresan de ye, di aliyê din de çanda modern dizane, di nav vê çandê de dijî... Meriv dikare bibêje wekî xebata Nûbiharê mîsyona wê jî du baskî ye, wê çavkaniya edebiyata me a klasîk û çanda îro digihîne hevûdu û bi vî hawî zimanê me, edebiyata me dewlemend dike.

Me çend kitêbên xwe jî bi du elfabeyan weşandine. Bi vî awayî mensûbên medresê û piyasa din bi wan kitêban nêzikî hev dibin.

Ew dunyaya ku em mensûbê wê ne bi medresan ve jî elaqedar e. Di nav me de kesên ji wê merhelê derbas bûne hene. Eger em van salên dawîn ne-jimêrin, hemû insanên ku bi Kurdî nivîsandine tev ji medresan derketine û ev kes bîngeha edebiyata me ne.

Em hêvîdar in ku lêkolînerên Kurd dest bavêjin vê mijarê, li ser medresan xebatên ciddî û akademîk bikin û kêmasiya ku di derbarê medresan

de heye çareser bikin...

Di Nûbiharê de çi weşiyane

Heta niha Nûbihar bi elfaba latînî û seranser bi Kurdî weşiyaye. Helbestên modern, çîrokên bav û kalan, çîrokên modern (hikaye), meal, hedîs, ceribandîn, nivîsên rojane, siyasî û li ser pîrsa Kurdî di Nûbiharê de weşiyane.

Di Nûbiharê de digel xebatên nû, ji Baba Tahir, Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Şêx Semseddînê Exlatî, Ehmedê Xanî, Mela Huseynê Bateyî, Siyahpoş, Şêx Ebdurrehmanê Axtepî, Seyid Eliyê Findikî, Axaukê Bêdarî û gelek kesên din jî ku kaniya edebiyata me ne, jiyana wan, helbestên wan weşiyane.

Ji gelek zimanan, wekî Farisî, Erebî, Tirkî, Frensî, Îngilizî, Almanî, Norweçî û hwd werger hatine kirin bi bal Kurdî ve.

Nivîskar gihastine

Li Tirkîyê mektebek zimanê Kurdî tunebû, me herkesî bi cehd û xebata xwe ya şahsî xwe pêş de xistiye. Ji ber wê em roj bi roj baştir bûne. Ez vêya bi rehetî dikarim bibêjim, Nûbihar ji bo me hemûyan bûye mekteb. Em tev di vê dibistana Nûbiharê de bi pêş ketin. Ne tenê xwendevan, weke avakarên kovarê em jî li vê derê di warê Kurdî de bi pêş ketin. Vî tiştî em di nivîsên xwe de jî dibînin. Me niha jimara 122an derxistiye; 16 cildên Nûbiharê temam bûne. Her cildek nêzikî 400 rûpelî ye.

Heta niha Nûbiharê ji bo Edebiyata Kurdî çi kiriye, xwedî roleke çawa ye, di çi merhelan de derbas bûye, di vê xebata dûvdîrê de rastî çi xweşî û karesat û musîbetan hatiye, helbet ne mimkun e ku meriv bikaribe li vê derê her tiştî bibêje.

Weku min li jor jî îfade kir Nûbihar ji bo me hemûyan bûye mekteb. Dema me dest bi vî karî kir li ser Kurdî û Kurdan zanebûna me evçend nebû. Kesên ku cara pêşî nivîsên wan di Nûbiharê de weşiyane û kitêb nivîsandine gelek in. Ez naxwazim yeko yeko navê van hevalên hêja bijmêrim, ihtîmal heye ku ez navê hinekan jibîr bikim... Heta ez rastî gelek merivan hatime ku gotine, em xwendin û nivîsandina Kurdî bi Nûbiharê hîn bûne...

Weke min li jor jî got, di wan salên em xwendevan bûn de ji bo Kurdî di destê me de materyal pirr kêmtir bûn. Îro gelek pirtûk çap bûne; ji bo ji kesên bixwazin li ser Kurdî bixebitin berhemên baş derketine.

Îcar do tiştek tunebû em bixwînin, îro ewqas rûpel malzemên xwendinê hene û seranser tev Kurdî. Ne tenê Nûbihar, wekî din çend saziyên din jî hene weşangeriyê bi zimanê Kurdî dikin û ji bo zimanê Kurdî çavkaniyên hêja ava kirine.

Di kovargeriya ciwanan de kovaroka xwendekarên zanîngehan a zanistî wêjeyî û hunerî “pênGAV”

Kenanê NADO



Destpêk

Kovar di pêşketina zanist, edebiyat û hunerê de weşanên gelek bi bandor in. Di weşanên wan de demên sabît hene ku ew jî wek hefteyî, 15 rojî, mehane an jî salane têne diyarkirin. Ji bo kovargeriya tiştên herî muhîm ew e ku zanînen aktuel li millet bêne belavkirin û haya gel ji rewşa wan a heyî çêkin. Ji vê egerê ye ku dema weşana wan jî sabît hatiye pejirandin. Îcar dema ku em dêhna xwe bidine kovargeriya kurdî em ê ji îroj heya sed salan paş ve biçin û ji wir dest pê bikin da ku em kovargeriya kurdî di kîjan qonaxan re derbas bûye, bi çi armancê weşanên xwe kirine, çawa pêşketiye an neketiye, bi çi cureyan derketiye piyasê, rabirdûya wê çi bû, îroya wê çi ye an jî dahatûya wê dê çi be û hwd bibînin, binirxînin û li gorê wê jî çarçoveyê kovargeriya kurdî derxînin ber we. Tabî ev mesele bi serê xwe dibe mijara tez û kitêban ji ber wê ez ê li vir bi kurtasî li ser bisekinin ku ez bikaribim di nav vê deryayê de kovaroka pênGAVê ji we re vebêjim.

Min sed sal berê got lewra kovara yekem a kurdî li gor agahiyên ku lêkolînvanan gihiştandî ber destê me di sala 1913an de bi navê “Rojî Kurd” li Stenbolê weşana xwe kiriye.¹ Wê çaxê navenda rewşenbîriya Kurdan Stenbol bû, çimkî başûrê Kurdistanê hêj bi awayê xwe yê fîzîkî ji bakur neqetiyabû û her wiha merkeza hemû rewşenbîrên Osmaniyan Stenbol bû. Ji ber wê em bi rehetî dikarin bibêjin ku çalakî wê gavê her li Stenbolê bûn. Yanî kaniya tevger û bizavên wan li wir bû. Îcar piştî kovara “Rojî Kurd” kovarên mîna “Hetawî Kurd”, “Yekbûn”, “Kurdistan”, “Jîn” derketin heya komara Tirkîyê ava bû. Piştî komarê zext û zordarî zêde bû û Kurd neçar man belav bin. Piştî vê belavbûnê em dibînin ku cara duyan vejîna kovargeriya bi du birayên Bedirxanî dest pê dike ku ew jî li Şamê Celadet Elî Bedirxan e û bi navê “Hawar” û “Ronahî” du kovaran diweşîne. Birayê di

jî li Beyrûtê Kamiran Elî Bedirxan e û bi navê “Stêr” û “Roja Nû” du rojnameyên temenkurt diweşîne.

Kovargeriya kurdî bi wan salan re parçe dibe û her herêmekê di nav xwe de xebatên xwe didomînin. Her çar parçeyên Kurdistanê, li diasporaya Ewropayê, li Sovyetê û hin welatên ku Kurd lê dijîn. Yanî tiştên ku em jê fêhm dikin jihevdukbûn, bêxêberî û bêsînoriyeke mezin çêdibe. Di hevpeyvîneke min a ku min bi Cemal Xeznedar re çêkirî de cenabê Xeznedar dibê ku vê gavê di arşîva min a kovargeriya rojnamegeriya kurdî de nêzî 3500 kovar û rojname hene û ev jî ji her çar parçeyên Kurdistanê, Ewropayê, Xorasanê, Emerîkayê, Awistiralyayê hatine berhevkirin.² Ev gotin bi xwe jî kêr û zêde rewşê dide nîşanê me.

Ji bo ku ez ê di vê nivîsarê de qala kovaroka pêngavê bikim. Ji ber ku ew jî li bakurê welêt weşiyaye, bi kurtî dîmeneke kovargeriya kurdî a li bakur bibêjim û piştî derbasê pêngavê bibim. Her çiqas “Hawar” û “Ronahî” li rojavayê welêt derketibe jî berê wê li bakurê welêt bûye. Ji ber wê yekê heger em di vê qonaxê re derbas bin em ê di salên 1950 û 60î de rastê çend xebatên Mûsa Anter werin ku ew jî bi zimanê tirkî bûn. Piştî jî em ê nîfşa Tîrêjê³ nas bikin ku di nav wê nîfşê de jî kedkarên mezin yên edebiyat û zimanê kurdî derketine mîna rehmetiyê “Arjen Arî”, “Malmîsanîj”, “Rojên Barnas”, “Berken Bereh”, “Mem Ronga”. Piştî vê yekê helbet xebatên xefkî û ne legal dihatin kirin. Lê dîsa di kovargeriya de teqîneke mezin di serê sala 1990an de çêbû. Em dikarin du nîfşên vê demê yên bihêz Rewşen û Nûbiharê bi bîr bin. Ez dibêjim nîfş, lewra ev her du kovar jî nivîskarên ciwan û nêrînen cuda derxistine holê. Bi vê yekê re ne hewceye ez hemûyan bi nav bikim, lê sal bi sal kovar zêde bûn, nivîskar zêde bûn û kovargeriya jî geş bû.

Kovargeriya Ciwanan

Mîna berbelaviya kovargeriya kurdî agahiyên

min yên derbarê kovarên ciwanan de jî berbelav in. Tabî kovargerî ne tenê li ser cûreyekê an jî pisporoyekê dimeşe. Mîna ku di Lemonde diplomatique kurdî de di nivîsa "Kovarên kurdî" de jî tê gotin: *"Kovar mîna nîv-pirtûk, nîv-rojname ne û dikarin li ser her tiştî, her beşî agahdarîyê bidin, bibin bingeha sûdwergirtina gelemperî yan jî xwe kûr bikin û li ser pişeyekê bi tenê bîn weşandin: Kovarên pişeyî û bîsporî."*⁴ Li gor vê pênaseyê jî vê pircûreyîyê yek jê jî bêguman kovargerîya ciwanan an jî xwendekaran e. Di nav kovargerîya kurdî de her çiqas kêr be jî hebûna xwe bi me daye hesandin. Her çiqas ne bi profesyonelî be jî lê wek beşeke kovargerîyê îroroj di kovargerîya kurdî de li pêşberê me ye. Em dikarin bêjin ku cara yekem jî tevgera xwendekarên kurd bi cemiyeta "Hêvî" ya ku di serê sedsala 20an de hatibû damezirandin, dest pê kir.⁵ Belê jî hêla komek xwendekarên wê demê kovar hatin derxistin û çalakî hatin li dar xistin. Piştî jî bo xebatên bi vî rengî komeleyên xwendekaran yên li Ewropayê jî divê neyêne jîbîrkin. Li bakurê welêt jî xebatên bi vî rengî zêdetir li devdorên zanîngehan hatine meşandin. Qasê ku ez jê haydar im wextek li bajarê Wanê xwendekaran bi navê "Tîrêjên Tamara" kovarekê bi tirkî-kurdî derdixistin. Li Amedê jî kovareke bi navê "Tîgrîs" weşana xwe bi tirkî-kurdî dike. Li Stenbolê li zanîngeha Boğaziçiyê jî hêla kûluba edebiyatê ve hin xwendekarên wê zanîngehê bi navê "Yazınca" dîsa bi tirkî-kurdî kovarekê derdixistin. Carek din li zanîngeha Stenbolê kovarek bi navê "Dergûş" derdiket. Li Ankarayê hin hevalan kovarek bi navê "Asîva" derxistin. Her wiha li zanîngehên taybet yên mîna Bilgi(spartek) û Sabancı(keskesor-li ser netê) jî xebatên bi vî rengî derketin. Bi van yekan re pêngav jî di sala 2010an de cara yekem jî hêla xwendekarên zanîngeha Stenbolê ku ez jî wê çaxê xwendekarê li wir bûm hate derxistin. Min got cara yekem, çimkî di serî de wisa bû. Lê belê piştî ku xwendekarên li wir mezûn bûn navenda kovarê jî guherî.

pênGAV

Hejmara yekem a pêngavê di gulana 2010an de bi destê şeş xwendekarên Kurd ên zanîngeha Stenbolê li Stenbolê hat weşandin. Ya rastî di biryardayîna derxistina kovarê de ez tunebûm lê di pêvajoya çapkirinê de min peywir wergirt. Ji bilî min pênc hevalên min ên din hêca ne ku ez navê wan li vir bi lêv kim. Çimkî keda Ümit Eser, Tamazxaa Maloox, Cumali Güler, Gernas, İsmetullah Özdağ heya pêngav hebe dê her gav were bi bîr anîn. Lê belê piştî hejmara yekem xebata vê karê pîroz zêde bû nasîbê min û pêngav her çû karê xwe profesyonelîtir kir.

Ji wê roja ku me şeş hevalan dest pê kir heya vê rojê pêngav jî zanîngehekê belavê 12 zanîngehan (Marmara, Boğaziçi, Bilgi, Acıbadem, Yıldız Teknik, Ankara, Dokuz Eylül, Çukurova, G. Antep, Dicle, Artuklu, Muş Alpaslan) bû. Hem li van zanîngehan bi alîkariya wan hevalên me yên disoz yên li wir hate belavkirin hem jî ji wan zanîngehan hevalên ku nivîskariya kovarê kirin çêbûn. Ji bilî wê jî şeş-heft nivîskarên xwe gihande 76 nivîskarên xort û ciwanîk ku belkî hin ji van cara yekem bû bi zimanê xwe yê dayîkê di pêngavê de dinivîsîn.

Paşxaneyê pênGAVê

Piraniya kovaran yan li ser navê dezgehên fermî derdikevin û dixwazin fikra wê dezgehî ya piralî wek nêrînekê belav bikin. Hin kovar li ser navê partiyan, rêxistinan, weşanxaneyan, komeleyan derdikevin û ji hêla xwe ya fikrî û ramyarî ve xwe bi van deran ve girê didin. Tabî helbet ev tiştêkê gelek normal e. Lê belê pêngav li ser navê tu rêxistin, komele, zanîngeh, îdeolojîyê an jî şexsiyetekê derneket. Tabî ev nayê wê maneyê ku nêrîn û fikreke ve kovarê tunebû. Hebû ew jî me belkî di gelek civînên xwe de bi taybetî vegotîye ku pêngav kovareke xwendekarên Kurdan e û ji bo Kurdan çî xizmeteke fikrîyarî, çandî, zanistî, edebî, zimanî û hwd hebe dê wek xizmetkareke kurdewariyê, li ser nêrîna Kurdistanîbûnê xebatên xwe bike. Di vir de divê du tişt werin fêhmîkirin. Ya yekê ew e ku nêrîna pêngavê li hember hemû sazî û dezgehên Kurdan dê wek hev be, dê dev neyê tu nêrîn û îdeolojiyeke Kurd. Ya duyem jî ew e ku pêngav her gav di payeya kurdewarîtiyê û kurdistanîtiyê de hay ji her gava xwe ya ku li ser navên Kurdan davêje hebe û dê bi tu awayî hukm, zext û zordariya tu cihî, kesî û fikrî jî qebûl neke û her daîm bi perspektîfeke azad bimeşe.

Tiştên ku min li jorê got, ne fikrên tu partî û rêxistinê ne. Ev tenê û tenê fikrên pênc-şeş xwendekarên Kurd ên dilşewitî ne ku ji hal û ehwalê ziman û hebûna wan ê li hember serdestên wan e, hatiye der û bûye pêngav.

Sebebên Destpêkirina Derxistina Kovareke Bi Vî Rengî

Bi sebebeke ku wek komekê em hatibin li bal hev me ji hevdu re derdê xwe vegotîbe û nêrînên xwe parvekirîye dibe. Lê ev yeka jî dîsa helbet bi derd û kulên me yên hevpar dirûv girtiye. Ez dikarim li ser navê wan hevalên xwe yên di jî bi axivim, lê bi taybetî li ser navê xwe dibêjim ku dema min zanîngehê dixwend li zanîngeha Stenbolê di beşa tirkî de ew tiştên ku min dîtin, bihîstin, xwendin dikarim bibêjim ku bû sebebeke herî mezin bo xebateke wiha. Mamosteyên me her gava ku qala parastina zimanê xwe(tirkî) dikirin.

Ew parastin di min de dibû parastina zimanê min(kurdî). Yanî her gotinên wan û ji bilî wê her hereket û axaftinên xwendekarên Tirk yê li devdorê min wek çakûcekî li serê min diket û dikir ku ez li xwe werqilim, xwe tehlîl bikim, xwe nas bikim, xwe teşhîs bikim. Tu carî ji bîra min naçe dema ku mamosteyên me qala zimanê xwe yê tirkî dikirin, pê re bi heft çavan digiriyan; ha zimanê me asîmîle dibe dikeve bin tesîra zimanê Ewropiyan, ha zimanê me li paş maye divê em bixebitin bila bibe zimanekî cîhanê, nizamî divê em navê wan dikanên ku navê biyanî li xwe kirine biguherînin bixin tirkî û mîna van tiştan hezar tiştî digotin û li çongê xwe didan. Wek kurdekî dema ku min ev dîmen temaşe dikirin kapaxê serê min diavêt û min xwebixwe digot: “Kuro tu li van binêre ev sed sal e dewletek wan heye bi sedan zanîngeh û bi hezaran dibistan û bi milyonan kitêbên wan hene, lê dîsa ji ev di halê xwe de digirîn. Îcar min digot belê li hember vê rewşê em kurd divê çi bikin?” ez dikarim bibêjim ku tesîra wan gotinên bi wî şiklî hem bû sebeb ez bikevim nav xebateke bi vî rengî hem ji bû sebeb ku heya dawîya emrê min hebe ez di xizmeta zimanê xwe de bim.

Min li jor jî anî ziman ku ez dikarim li ser navê hevalên xwe jî bixivim. Çimkî ev hal û hestên min ên taybet ez dikarim bibêjim li bal gelek xwendekarên Kurd, nemaze li yê zanîngehan û bi taybetî jî Stenbolê peyda dibe. Ji ber wê yekê dibe tevgerake refleksiî û motîvasiyoneke bêhempa ji bo ku mirovî li xwe biwerqilîne û li ser xwe bide ponijandin.

Tabî ev sedemeke giştî ye ku kir em xebateke wiha çêkin. Lê di çarçoveyeke teng de jî heger em bifikirin ew jî pirsê xebatên çawa ne?

Li gor vê yekê jî ber ku em xwendekarên zanîngehan bûn, her yek ji me di beşeke cuda de dixwend û piraniya me jî xwedî sê zimanan û hîn zêdetir bûn. Me got ji bo xizmeta ziman, hişyarkirin û balkişandina xwendekarên kurd û gihîştina potansiyeleke mezin dê xebata herî kêrhatî kovardêrxistin be. Çimkî ev rastiyeke me xortan e ku em heya xwe di cihekî de bi zimanê xwe neceribînin ew hêz, tatmîn, bixweewlebûna li ser zimanê me bingeş nagire. Xwedîtina di xebateke bi vî rengî de ew psîkoljiya bextreş a şermkirin, tirsîn û xwetêrnedîtîna belawela dibe. Ji ber vê çendê me xwest em xebateke bi vî rengî çêkin.

Rêbazên Kovargeriye Yên Ku Pêngav Dipejirîne û Dişopîne


Di nav kovargeriya kurdî de ji aliyê xwemalîbûnê ve du tiştên resen yê pêngavê hene. Yek ji wan kovara xwendekaran e. Lê ne tenê wek teqîbger û xwîner wek nivîskar, xebatkar, belavker,

redaktor, edîtor, reklamger û hetta wek finansorê kovarê bi xwe jî xwendekar in. Ev hem renegekî mutevazî dide hem jî rewşeke azad çêdike bo kovarê.

Ya duyem jî di ber nasnameyeke wê ya edebî û hunerî de hebûna nasnameyeke wê ya zanîstî ye. Bi rastî ev îdiayeke pir mezin e ku pêngavê girtiye li ser milê xwe. Lê dîsa jî bi xebatên xwe yê zanîstî kêfa gelek însanan aniye û ji hêla gelek kesan ve jî hatiye pîrozkirin. Ev jî renegekî wê yê cuda ye. Ji bo vê em mînakekê ji “anf”ê ku hejmara me ya sêyem xistibû reklam dikarin bidin nîşanê we.⁶

Em her gav di pêngavê de li pey profesyoneliyê bûn. Her diçe em dixwazin karê xwe piçek jî pêş bixin. Lê belê me tu carî qalîteyeke newaze ji nivîskarên xwe nexwest. Çimkî armanceke kovarê a sereke jî ew bû ku xwendekarên kurd teşwîqê xwendin û nivîsandina bi zimanê wan bike. Mesela min tu carî negot ev helbest ne kêrhatî ye, ev nivîs ne hêjayî weşanê ye. Min her gav pêngavê jî bo xwendekarên kurd wek laboratowarekê dît û min xwest ku xwe tê de bibînin, biceribînin û wê heza nivîsandina bi zimanê xwe biçêjin. Li gorê min ev rêbazek e, lê belê evê heya heya wiha bidome an dê biguhere, vê yekê jî dê rojên ayende bide nîşanê me.

Di pêngavê de ziman jî tenê kurdî ye. Hin kovarên kurdî hene ku bi du zimanan weşanê dikin, belkî ew jî rêbaza wan be. Lê em di serî de heya niha li hember weşana bihevrebûna kurdî-tirkî



bûne. Çimkî li gorê me ev xetereyek e. Jixwe xort û ciwanên kurd ji xwendina kurdî bêzar in. Heger me alternatîfeke wisa jî çêbikira ez bawer im em ê çem û çem biçûna. Bi rastî gelek daxwaz di wê hêlê de çêbûn heta yên ku xeyîdîn an jî gotin hûn gelek radîkal in jî derketin. Lê me wek şîarek an jî rêbazekê her gav gotiye tenê yek ziman û heger yên ku binivîsin hebin, pênc zarava.

Ji bilî taybetiyên ku me li jor anî ziman tişteke girîng a din jî ji bo pêngavê tevlênebûna siyaseta ye. Yanî siyaseta rojane. Çimkî tiştê ku me ji xwe re hîlbijartibû xwendekarî, xwendin, nivîsandin, edebiyat, huner bi taybetî jî pisporiya li ser beşa xwe bû. Me vê yekê bi xwe dabû qebûlîkirin; em ne siyasatmedar in, karê me ne siyaseta e, ji ber wê bi tu awayî ne hewceye em tevlî siyaseta bin. Karê me pêşxistina zimanê kurdî ya beşên curbicur e.

Tiştên Ku Pêngav Dixwaze Bike Rêya Ku Dixwaze Veke Şibaka Ku Li Kurdî Vedike

Tiştên ku pêngav dixwaze bike, “rêya ku dixwaze veke” ye. Ew jî ev çend tişt in; bi rastî dema ku me dest bi vê karê kir, bifikirin çend xwendekarên feqîr ku ne ji malmezînan Kurda in jî, bi derfetên di destê xwe û çend qurîşên di bêrîka xwe de, bi îdiayeke kovara hem zanistî hem edebî û hem jî hunerî be, derketine piyase û dixwazin xwendekarên Kurd ên zanîngehên din jî tevlî vê xebatê bikin û bibin çirûskeke agirê zimanê xwe. Ya rastî ev her gav hêviyeke di dilê me de bû ez dikarim bêjim hê jî di dilê me de ye. Lê dema ku tu bixwe di hundirê wê pêvajoyê de bî, hew qas bêhêvîti, tenêti, dîtina li ber çavê xwe ya bexemiya xwendina kurdî, bêperetî û di ser de jî hezar nav û nûçikên ku li pey te xistine dibe ku bibe sedem tu wan hêvî û xeyalên xwe tenê li wir bihêlî. Lê me di vî karî de bes nekir. Ew tiştê ku me di serî de digot –civandina xwendekarên kurd li derdora xebateke bi vî rengî- hê jî armanceke sereke ya di dilê me de ye. Heya ku em bikaribin jî em ê vê civîna xwendekaran geş bikin.

Navê zanistîbûnê nasnameyeke giran e, lê ev jî her gav kula dilê me ye ku em bikaribin li zanîngehên cihê di beşên curbicur yên zanistên cihê de ew potansiyela zarê kurd bixin xizmeta zimanê wî/wê. Yanî heya ji me bê pêşxistina zimanê kurdî di zanyariyên curbicur de. Dibe ku vê gavê ev kar bi amatorî dimeşe, lê belê bi piştgirî û alîkariya hin sazî û dezgehên ev kar dikare bibe profesyonel jî.

Ev salek e, fikrekî di mejiyê min de cihê xwe edilandîye ku ew jî avakirina komeleyeke xwendekarên Kurd e. Belkî em jî bikaribin bi “Pêngavek”ê “Hêvî”yek biafirînin. Ez bixwe gelek muhîm dibînim vî karî. Çimkî mixabin rêxistina talebeyên kurd gelek gelek kêr e li zanîngehan, her

çî rêxistin hebe jî bi hemû potansiyela xwe li ser siyaseta ye. Xwendekarên Kurd, ji hev bixeber û dûrê hev in. Hev nas nakin, ji bo ku hev du baştir nas bikin zêde nayêne li bal hev, ruhê xwe yê millî kirine qurbana îdeolojî û baweriyên xwe, hê jî qîmeta zimanî fêhm nekirine. Ez dibêjim çareserîya vê yekê jî bi qîmetdayîna xwendekaran û bi avakirina komeleyên taybet yên li ser navên wan e. Lê bi şerteke azad. Ji bo vê yekê em di wê hêviyê de ne ku em ê xwedê hez bike komeleyeke xwendekarên Kurd li ser navê pêngavê ava bikin.

Projeyeke din jî ew e ku heger em bikaribin komeleyê ava bikin, di komeleyê de komên wek matematîk, fîzîk, kîmya, zanistên civakî û hwd çêkin da ku xwendekarên zanîngehan ew tiştên ku li zanîngehê fêr dibin li vê derê derbasê zimanê xwe bikin ku ev jî ez di wê baweriyê de me dê bibe ximetguzariyeke perwerdehiya zimanê zikmakî.

Şibaka ku pêngav li kurdî vedike tenê şibakek e. Ew jî şûra zimanî ye, êdî di vê şibakê de çend şibak vedibin ez nizanîm!

Astengiyên Xebatên Xortên Kurd û Pêngav

Beriya her tiştî astengiya herî mezin madiyat e piştî jî em Kurd bixwe ne. Madiyat belaya serê me hemûyan e her wiha ya serê xwendekaran e jî. Ez bawer im projeyên gelek orjînal hene ku dixwazin bikin lê belê derfetên wan ên madî nahêlin. Em di vir de kurt bibirin û bibêjin çavê bêdewletbûnê kor be.

Hemû astengiyên din bi awayekî çareser dibin lê belê astengiya “kurmê darê ji darê ye” ne tê de. Ez bixwe gundî me, gundê me serdanpê Kurd in. Lê dema Kurdekî ji xwe re havêlekê dike cînarên wê/wî, devdorên wê/wî, gundiyan wê/wî hemû, hezar nav û nûçikan pê ve dikin. Sed mixabin ji binî bigire heya serî ev xûy her eynî ye. Di nav xwendekaran de jî ev yek heye. Belkî ji bo pêngavê sed tişt hate gotin û gelek fitnetî hate kirin. Piştî bihîstina her gotinê, min şoq derbas dikir. Nizanîm pêngav ji dewletê re dixebite, ya trêgê ye filan û bêvan. Bê lome be! Yaw em feqîrên xwedê me bi du qurûşên bêrîka xwe li xwe nedikir nedixwar, hema çî ji me bihata me digot bila ev jî ji me be. Îcar ev gotin jî dîlkulîya li ser bû. Piştî van propagandayên ne xweş hin hevalên me yên gelek hêca jî sar bûn. Ez fêhm nakim jixwe, zalimekî dewasa devê xwe vekirîye me hemûyan dadîqurtîne, îcar xêr e em çima ji hev nahewin? Bi rastî jî ev problem heta ez dikarim bibêjim nexweşîyeke gelek mezin e ku me dixwe. An jî em hev dixwin. Me van meselan jî tu carî nexiste polemîk. Jixwe ne hewce bû jî.

Heger tenê ev nexweşîya giran nebe, wekî din ez asteng nabînim çimkî bi bihevrebûnê re asteng her

çi be meriv dikare hel bike. Lê bihevrebûn esasê vî tiştî ye. Wekî din ez bawer dikim ku îroroj potansiyela xwendekarên kurd bêhesab e. Dikare gelek tiştan bike.

Rewşa Dawî Ya Pêngavê

- Bi du zaravayan weşanê kiriye (Kurmançî / Dimilkî)
 - 9 hejmar derketiye û amadekariya hejmara 10an tê kirin.
 - 76 nivîskarên xort û ciwanîk
 - 192 nivîsar/behrem (Gotarên zanistî:54), (Helbest:48), (Çîrok û pexşan:32), (Biyografi/Jînenîgarî:8), (Werger:26), (Hevpeyvîn:10), (Karîkatur:7), (Xêz:4), (Xaçerêz:4), (Dosye/Proje:1)
 - Ji bilî nivîskariyê wekî din yên ku ked dane kovarê ev kes in. Bi rastî jî ne ew kes bûna dibe ku ev xebat hewqas pêş neketa. Ümit Eser, Tamazxaa Maloox, Gernas, Cumali Güler, İsmetullah Özdağ, Nûhat Deştî, Îmad Bernas, Şevger Cîlo, Mem Jan, Eliyê Xanê, Omer Faruk Baran, Bawer Ronahî, Mam Selam, Fûad Hemedxan, Nûrûllah Qoserî, Denghat Bîrhat, Mihemed Yonat, Nazê Bawerî, Janda Serfiraz, Yasemîn Qoserî, Oznûr Aydın

Gotina Dawî

Li gorê potansiyela xwendekaran kar û xebatên ku tên kirin mixabin gelek kêr in. Çimkî dahatû, rewşenbîrî, zanyarî, pêşkeftin di vê gencîneyê de veşartîye. Divê vêgavê li her bajarê me komeleyên mîna “Hêvî” hebûna. Çimkî em îroj sedsal beriya wê rojê ne. Hema sed qatî nebûya jî divê rewşenbîriya xwendekarên Kurd deh qat ji wê rojê zêdetir bûya.

⁶ Dar açî, dik açî, geniş açî, tam açî: PênGAV anf.bz/index.php?rupel=nuce&nuceID=39035

ÇAVKANÎ

VEROJ, S. “Rojî Kurd - Pêşekî” weşanên war, 2002, Stenbol

NADO, K. “Hevpeyvîn: Cemal Xeznedar: Me heta sala 1968an rojnameya Kurdistan nedîtibû” Kovara Nûbihar, hej:121, r:37-42

<http://www.diplo-kurdi.com/kovaren-kurdi>

MALMÎSANIJ. “Kürt Talebe-Hêvî Cemiyeti ‘İlk Legal Kürt Öğrenci Derneği’” weşanxaneyê Avesta, 2002, Stenbol

AMÎDA, Î. “Kovara Tîrêjê” xebata darsa çapemeniya kurdî a bernamêya mastira zanîngeha Artukluyê.

¹ VEROJ, S. “Rojî Kurd - Pêşekî” weşanên war, 2002, Stenbol

² NADO, K. “Hevpeyvîn: Cemal Xeznedar: Me heta sala 1968an rojnameya Kurdistan nedîtibû” Kovara Nûbihar, hej:121, r:37-42

³ Çîleya pêşîn di sala 1979an de li Îzmîrê weşana xwe kir. Sê hejmar derket. Hejmara wê ya 4an jî li Stockholmê derket.

⁴ <http://www.diplo-kurdi.com/kovaren-kurdi>

⁵ Di sala 1912an de li Stenbolê ava bû. Yekem komela fermî a xwendekarên kurd tê hesibandin. Damezrînerê wê Qedrî Cemîl Paşa ye. Heya sala 1922an li pêya maye. Piştî herba cîhanê a yekem hatiye girtin lê di sala vebûye. Kovarên mîna “Rojî Kurd”, “Hetawî Kurd”, “Jîn” û rojnameya bi navê “Jîn” li ser navê vê cemiyetê derketiye.



Di kovargeriya kurdî de rewşa kovarên zarokan

Nesrîn NAVDAR

Wek em dizanin kovargeriya kurdan bi kovara Hawarê ku di 15'yê Gulana sala 1932'yan de ji hêla Celadet Bedirxanî ve hatiye derxistin dest pê dike û di roja me ya îroyîn de bi dehan kovarên ku bi kurdî tên weşandin berdewam dike. Îro ger em bixwazin qala kovargeriya kurdî bikin ne sê-çar rûpel, bi dehan rûpel jî têra nixandina kovargeriya kurdî nakin. Lê mixabin ku em nikarin heman tiştî ji bo kovarên zarokan bibêjin. Hejmara kovarên zarokan ku heta roja îro hatine weşandin dehan derbas nakin. Sedema yekemîn ya vê neyînîyê jî ji hêla desthilatan ve qedexekirina zimanê me ye. Ji ber vê awayê beriya ku em rewşa kovarên zarokan raxînin ber çavan, divê em pêşî rewşa zimên û perwerdeya zimên bi bîr bixînin. Wek tê zanîn ev not sal e ku qedexe û tundî li ser zimanê me tê meşandin û perwerdeya bi zimanê me tê qedexekirin. Bi xwezayî ew zarokên ku ji perwerdeya bi zimanê xwe hatin dûrxistin roj bi roj ji bikaranîna zimanê xwe dûr ketin û ji wêje û folklorê nivîskî ya bi zimanê xwe re biyanî man. Zarokên ku ji alfabeya xwe, ji perwerdeya bi zimanê xwe bêpar û biyanî man bi wê ve girêdayî şopandina berhemên bi kurdî jî ji nav cîhana wan ra bû. Vê rewşê bandoreke neyînî li ser kesên ku dixwestin di qada wêjeya zarokan de xebat bikin jî pêk anî.

Dema Şêx Ehmedê Xanî di sala 1683'yan de berhema xwe ya bi navê Nûbihara Biçûkan (bi awayê menzûm ferhengeke kurdî-erebî ye) diyariya zarokên kurd kiribû hêviyên wî di derbarê perwerdeya bi zimanê kurdî de mezin bûn. Ji ber ku di wê demê de li medreseyan perwerdeya bi kurdî hebû, hewl dahibû ku ji bo pêşeroja welatê xwe zimanzan û zanyaran bighîne. Lê mixabin, her ku sal û dem bihurîn nîrê desthilatan bêhtir xwe li jiyana gelê wî pêçand. Heta dem hat ku ji bo her peyveke bi zimanê xwe pere ji wan hat girtin û nefes dahin û girtina bi zimanê wan jî li wan hat qedexekirin. Lê em dikarin vê jî bibêjin ku şagirt û neviyên wî her tim hewl dan ku li ser şopa wî bimeşin.

Xebatên wêjeyî yên ji bo zarokan ku bi 'Nûbi-

hara Biçûkan' ya Şêx Ehmedê Xanî dest pê kiribû piştî salên heştêyan li mişextiyê zîl dan, îro li welêt şax didin û êdî hêviyeke mezin didin zarokên kurd. Dema mirov dinêre li hember hemû tengasî, bêderfetî û qedexeya li ser zimên jî di qada wêjeyê de her ku diçe hewldanên ji bo zarokan zêde dibin. Ev pêla wêjeya zarokan her roja ku diçe firehtir dibe. Helbet di nav van xebatên wêjeyî de cihê kovaran girîng e.

Rewşa Niha ya Kovarên Zarokan

Çend kovarên ku cihê xwe di wêjeya zarokên kurd de girtine:

Cara yekemîn em di dema Komara Kurd ya Mahabadê (22.01.1946-1947) de rastî kovareke zarokan tên. Navê vê kovarê **'Gilûgalanî Mindalan' (Çîvîniya Zarokan)** e. Ev kovara ku ji bilî navê wê û cih û dîroka weşandina wê pê ve em nebûn xwediyê tu agahiyan bi hilweşîna Komarê re dawî li weşana wê hatiye. Min dixwestin mijar û teşeya wê kovarê ji xwendevanan re bidim diyarkirin lê mixabin ku ji bilî navê wê kovarê tu zanînen me çê nebûn.

Piştî salên 80'yan li mişextiyê kovarên wek **"Hêvî", "Hêlîn", û "Kulîlk"** jî hatin weşandin.

Kovara Siveroyê

Yekem hejmara kovara **Sivoreyê** di sala 1998'an de di bîreweriya sedsaliya rojnamegeriya kurdî de derket. Lê, ew bi tenê li bajarê Dihokê hatiye belavkirin. Herwiha li ser internetê jî bi tîpên latînî li gel ên erebî tê weşandin.

Kovara Kepirê

Kepir kovareka zarokan ya mehane ye û li Dihokê derdikeve. Kovar, di 2007'an de hatiye weşandin. Kepir tevî naverok û babetên tê de di malpera Spîrêzê de jî tê bi dest xistin.

Kovara zarokan Kepir ku li Duhokê mehê careke û bi kurmancî bi herfên erebî derdikeve. Hejmara wê ya bi herfên latînî bi hevkarîya Weşanên APEC û Spîrêzê li Stockholmê tê weşandin. Xwedî : APEC

û Spîrêz e. Kovar niha 16 rûpel û rengîn e. Di hejmarê latînî de ev mijar hene:

Peyva Kepirê, Navdarên Kurd, Çîrok, Balinde, Seyr e lê rast e, Alaya rengîn, Helbest, Mijûlahiyên Kepirê, Pêkenok û Kulîlkên Kepirê (wêneyên zarokan).

Kovara Mizgîn

Li Rojavayê Kurdistanê ji bo zarokan bi navê, **“Mizgîn”** kovarek ku bi kurdî û erebî ye tê weşandin.

Kovara ku ji aliyê Saziya Çapemeniyê ya Ronahî ve tê amadekirin, mehê carekê tê weşandin. Di kovarê de ji bilî wêneyên ku zarokan bi xwe çêkirine, zimanê kurdî jî tê fêrkirin.

her wiha cih dide çîrokên zarokan jî. Ji bo zarokên Rojavayê Kurdistanê wekî çavkaniyeke baş tê nixandî û li tevahiya Rojavayê Kurdistanê tê belavkirin.

Kovara Şemamokê

Şaredariya Sûrê ya Amedê ji bo zarokan kovareke bi kurdî weşand. Navê kovarê **Şemamok** e. Di vê kovarê de çîrok, helbest, naskirina tîpên dengdar û listok hene. Kovar ji sê mehan careke derdikeve û bi tirkî û kurdî ye.

Hejmara yekem 10 hezar heb hatine çapkirin û li hemû herêmê bê pere hatiye belavkirin.

Kovara Bûka Baranê

Li Wanê, di 4'ê nisana 2010'an de ji aliyê Şaredariya Wanê ve ji bo zarokan kovara **“Bûka Baranê”** ya bi kurdî hatiye derxistin. Hejmara pêşîn ya kovara ku ji aliyê Midûriyeta Kulturê ya Şaredariya Wanê ve hatiye amadekirin, ji 50 rûpelan pêk tê.

Di kovara ku gramêr û rêzimana kurdî jî tê de tê hînîkirin de, zana û navdarên kurd, mijarên wekî Newroz, salnameya kurdî, serdema dewleta Med, hunera dengbêjiyê û ligel çîrok û destanan danasîna xebatên sportîf jî cihêkî berfireh girtiye. Ji bo zarokên 12-18 salî vê xebatê dimeşînin.

Kovara Perperokê

Kovara Perperokê di berfanbara 2012'yan de bi beşên xwe yê li ser zimên, bi agahiyên rojane, bi qerf, pêkenok, zûgotinok, biwêj, tiştonekan, bi dosyayên xwe yê ji rûpelên dirokê, bi dersên matematîkê, bi wêne û danasînan sê mehan careke tê weşandin.

Kovara Zarokên Rojê

Kovara Zarokên Rojê wek bultena kurdî-derê ya Amedê di bin banê lijneya meclisa jinê de, di bihara

2011'yan de dest bi weşanê kir. Ev kovara ku ji bo temenên 7 û 13 salî ye, ji sê mehan careke der tê. Naveroka kovarê wiha ye: Wêne ferheng, nasandina bajar û navdaran, çîrok, helbest, pêkenok, tiştanok, zûgotinok, biwêj, gotinên pêşyan, zanistî û xaçepirs.

Hejmara yekemîn a kovarê bi navê Agirê Tûtê hat weşandin lê, ji wê hejmarê şûn ve navê wê hat guherandin bû Zarokên Rojê. Her wiha li dû hejmarê duyemîn, amadekar jî hatin guherîn û ya çaremîn de car din amadekar vekişyan û kovar li erdê ma. Niha car din xebatên ji bo hejmara zivistanê were derxistin tên meşandin. Em hêvî dikin ku ev kovara ku ji bo zarokên kurd dewlemendiyeke e êdî bê navber bikaribe were weşandin. Li vir girîngiya hêza zarokan heye, divê zarok jî bi şandiyên xwe yê wek wêne, çîrok, pêkenok û hwd. xwedî li vê kovara xwe derkevin û wê hêzdar bikin. Helbet ev jî bi alîkarî û teşwîqkirina dê û bavan pêkan e.

Min dixwest lîkoleneke dorfireh li ser kovargehiya zarokan bikim û encama wê pêşkêşê xwendevanên wêjehez bikim lê, mixabin dem û sînoran derfeta lîkolîneke dorfireh neda. Dîsa jî min xwe spart xweşdîtîniya we xwîneran û tevî nêrînên xwe ve, min encama vê lêkolîna tengmayî ji we re ragihand. Hêvîdar im hindik be jî we agahiyêke ji vê nivîsê girtiye.





Kovargerî yan kovarkujî! *Serwet DENÎZ*

Ji bo belavkirina fikir û ramanan gelek derî û dergeh hene. Çapxaneyê hinek derî û dergehên nû vekirin. Kovar jî yek ji wan e. Serdest û cîranên kurdan beriya wan ev derfet bi kar anîn û bi pêş xistin. Û roj hat kurdan jî dest avêt vî karê hanê. Ev jî sedsalekê zêdetir e ku kurd kovaran diweşînin. Ango kovargerîyê dikin û nakin. Destpêka kovargerîya kurdî mixabin ne Kurdistan e û Stenbol e. Ji bo hinekan ne girîng be jî bi baweriya min girîng e. Û ku îro gelek rexne û gazin hebin divê mirov vegere, li wê destpêkê binihêre û pir baş dahûrîne.

Mirov sînoren xwe teng bike û tenê ji bo Bakur û derên têkildarî Bakur biaxive, bi baweriya min kovargerîyeke kurdî ya ku mirov bibêje “şan û nîşanên wê ev in, xwediyê filan reng û pîvanan e” tune. Ezmûna kurdan a sed salî, nikaribûye vê nasnameyê biafirîne. Ji destpêkê û heta niha gelek kovar hatine weşandin, gelek ked hatiye dayîn, gelek zehmetî hatiye kişandin. Teqez her yekê ji aliyê xwe ve tiştek li bîr û hişê kurdan zêde kiriye. Ji bo her hewldanê jî divê mirov rêzdar be. Qesta me ne ev e. Qesta me pêknehatina nasnameya “kovargerîya kurdî” ye.

Hinek sedemên vê yekê hene. Ji van sedeman mirov dikare çendan bigire dest;

Kurdan, ji ber ku bi karê kovargerîyê baş zanibûne û ji heq derketine ev kar nekirine. Ji ber nebûna derfet û ezmûnan ev rê hatiye hîlbijartin. Gava ku kurdan xwestiye tiştekî bikin û derdorên wekî din dengê wan bibihîzin an jî gel şiyar bikin û hişmendiyeke di nava gel de biafirînin, tiştê ku pêşiyê hatiye hişê kurdan kovar bûye. Ku hêza wan hebûya -çi aborî çî jî kesên pispor û gihîştî- dê rojnameyek biweşandina, dê dest bi weşana radyoyê bikirina. Lê na, tiştekî wisa nehatiye kirin û nikaribûne bikin. Ku mirov li qedexeyên dema komarê yê hişk jî bifikire, dê bê dîtin ne pûkan e ku ev derfet bîn bidestxistin û bikaranîn. Ên ku bixwazin dikarin li destpêka tevgerên kurdan binihêrin, bi awayekî aşkere yan jî nepenî teqez kovarek weşandine. Ji wê zêdetir nikaribûne gavan

biavêjin. Îspata vê yekê jî rewşa rojnamegerîya kurdî ye. Li Bakur hîna rojnameya rojane yeke bi tenê ye.

Piraniya kovarên kurdan bi zimanê serdestan hatine weşandin û bûne rengê ji rengên kovargerîya serdestan. Nivîsên bi kurdî carna di rûpelên dawîn de ji xwe re cih dîtine, ew qas. Ji salên 1960'î bigire heta salên 1990'î rewş bi vî awayî ye. Piştî salên 1990'î hêdî hêdî rewş diguhere. Ne qada kovargerîyê be jî mijareke balkêş a ku mirov qal bike heye. Di vê pêvajoyê de pirtûkên rêzimana kurdî jî bi tirkî hatine çapkirin.

Piraniya kovaran weşanên rêxistinên siyasî ne. Ji bo tevahiya civakê û pêdiviyên wê nayên weşandin. Her kes jî bo koma xwe û alîgirên xwe diweşîne. Ku ew koma siyasî jî hev belav bibe, kovar jî têk diçe. An jî li gor rewşa xwe biryarekê digirin û weşana kovarê didin sekinandin. Ev jî dike ku ezmûnên vî karî berhev nebin û kesên pispor negihîjin. Kar her tim bi awayekî amatorî bê kirin.

Bêaramî û bêistîkrariya di qada civakî û siyasî de kiriye ku kovarên kurdan her tim jînkurt bin. Ku rewş hinekî aram bûbe hejmara kovarên kurdî jî zêde bûye, ku rewş aloz bûbe, karê kovargerîyê jî asteng bûye.

Ji ber pêkutî û qedexeyan kesî nikaribûye arşîveke kovarên kurdî amade bike. Piştî xwendinê yan kovar hatine şewitandin û avêtin an jî di serdegirtinan de hatine desteserkirin û talankirin. Gava ku arşîv tune be nîfşên cuda nikarin sûtê ji hev bigirin û tîkiliyên navbera wan qut dibin. Bi vî awayî jî kovarên her nîfşekî dibin xwediyê rengêkî cuda û nasnameyeke kovargerîya kurdî ya xweser dernakeve holê.

Bêyî ku kiryarê qumaş bê dîtin, qumaş tê hilberandin. Gava ku tê belavkirin jî li ser dezgehan dimîne. Û gazin tên kirin. Kovargerî wek karekî ji rêzê tê dîtin. Gelek caran tê fikirîn ku mirov çend nivîsan bi hev bixe û li ser kaxezekî bireşîne bes e. Her kes mecbûr e bigire û bixwîne. Lê ne wisan e. Ku kovara te ji bo mirovan tiştekî nebêje, kes ne mecbûr e bistîne û bixwîne. Nivîsa ku beriya kovara

te nizamî di çend malperên înternetê de hatiye weşandin dê çima bê stendin û xwendin. Xwediyê kovara me li van tiştan nafikire. Yan jî nayê bîrê. Ji derveyî kovarên rêxistinên siyasî, girseya ku kovar jî bo tê weşandin ne diyar e.

Ji bo ku kovarek bê weşandin tiştê ku tevahiya cîhanê dizane ev e: Divê pêşiyê armanca wê kovarê û girseya ku xîtab dikê baş bîn destnîşankirin. Pîvanên din jî li gor wan bîn diyarkirin û kovar bi “nasname” bi “şexsiyet” derkeve pêşberî xwîneran. Lê em wisa nakin. Bi awayê herî hêsan em dibêjin; “çandî û hunerî” û çî bê ber destê me em diweşînin. Jixwe çawa be tiştê ne mijara çandê tune, her tişt dikeve wî tûrik î. Navê vî tiştî bêarmancî ye.

Tu ji kovargerê hêja bipirsî; armanc pêşvebirina çand û zimanê kurdî ye. Lê tiştê ku min dîtîye, ne ev e. Sedem û armanc “nav ji xwe birin” e. Peyam ev e: “Va ye ez jî vî karî dikim. We hay ji min heye? Navê min bibihîzin û min nas bikin.” Piştî weşandina çend hejmaran û ragihandina vê peyamê, kovar diçe ber rehma Xwedê. Lê armanc pêk hatiye. Ku yek rabe û dîroka kovargerîya kurdî vekole, teqez dê navê wê/wî bê nivîsandin. “filankesê/î, filan salê, li filan derê ew qas hejmar kovar weşandiye.” Ha ji te re, navê xwe kola li dîroka Kurdistanê. Wê kovarê tiştê li bîr û ramana vî gelî zêde kir an na? Qet ne xem e!

Ji derveyî nêzikahiyên çewt hinek kêmasiyên kovargerîya kurdî yên şênber ên ku divê wek kelemekî di çav û dilên me tevan de biçin û me biêşînin, hene. Mînak hîna li Kurdistanê çapxaneyêke ku kovarê baş çap bike tune. Piştî ku rûpelsazî jî qediya, em berê xwe didin Stenbolê, kovara xwe li wê derê didin çapê. Dibe ku hinek kes vê rewşê qet wek pîrsgirêk jî nebînin.

Yek ji pîrsgirêkên herî girîng ên kovargerîya (weşangerîya) kurdî belavkarî ye. Pergaleke kurdan a belavkariyê tune. Kovara ku herî zêde şop li dû xwe hiştiye û îro her yek ji me pesnê wê dide û dilê xwe dibijînin Hawar e. Bi qasî ku em ji biranînên kesên wê pêvajoyê hîn dibin. Bi piştîyan, bi qaçaxî ji sînor derbas kirine û li bajarên Bakur belav kirine. Gava ku mirov vê rewşê wek wêneyekî bifikire, piştî 80 salan di vî wêneyî de tu guherîn pêk nehatiye. Ew tûrik hîna li ser milê hinekan e. Pêşiyê wek redaktor û paşê jî wek edîtor ez bi salan karên kovara Wyê de xebitîm, ligel hevalên xwe yên xebatê min bi xwe jî li kuçeyên Amedê ew tûrik bi salan gerand (bi kêfxweşî û serbilindî). Yên piştî me jî hîna wî tûrikî digerin. Ji bo ku kovarekê li ser lingan bigirin çî destê wan tê dikin. Mala wan ava be.

Lê pîrsgirêka me bi xwe jî ev e, ev rewş e. Ev rewş ne rewşêke asayî ye. Mirov dikare bi kuçe û kolanên bajarekî bikeve û kovaran yek bi yek belav

bike lê mirov nikare li welatekî seranser bigere. Jixwe her kovarek çend xebatkarên wê hene. Ji ber vê jî divê pergaleke belavkariyê bê sazîkirin û bi riya wê pergale çî kovar çî jî weşanên wekî din bîn belavkirin. Wê gavê dê redaktor û edîtor jî zêdetir serê xwe bi karê xwe re biêşînin û wek peywir û rêzdariyekê kovareke baştir pêşkêşî xwendevanan bikin. Rastiyeke din jî heye, ji bo hinekan belavkirin ne derd e, çend dost û heval bizanibin ku kovar derçiyê bes e. Dixwazî bila tev di depoyan de birizin, xema kê ye.

Gelek kes jî aliyê aborî ve jî gazinan dikin. Ez bixwe ne ligel wan gazinan im. Ku karên din tev sererast bîn kirin dê kovar têra xwe bîn belavkirin û firotin, dê kovar bikaribin mesrefên xwe derxin. Ên ku ji bo îro bibêjin xwendevan kêmin neheqiyê dikin. Ku kovarger bikaribin kovaran bigihînin ber destên wan, hejmara wan qet ne kême.

Ji bo kovargerîya kurdî rewşêke ku divê bi awayekî taybet bê nîrxandin û vekolîn heye. Ji 1980'yî û heta niha li girtîgehan kovar tên weşandin. Ev kovar zêde derneketine derve û nayên zanîn. Hema bibêje li her girtîgehê kovar tên amadekirin. Ev kovar ji berhemên girtiyan pêk tên. Di destpêkê de bi piranî bi tirkî bin jî, piştî salên 1990'î êdî bi kurdî hatine weşandin. Li hinek girtîgehan kovarên kurdî-tirkî cuda bûn, li hinekan jî kovar duzimanî bûn. Despêka kovargerîya girtîgehan Hawar a ku li zindana Amedê hatiye amadekirin e. Vekolandina vê mijarê û cihê wê yê di nav kovargerîya kurdî û wêjeya kurdî de mijara dosye û nîqaşêke din a bi serê xwe ye.

Beriya ku ez dest bi vê nivîsê bikim min li çend pirtûk, kovar û malperan nihêrî. Ne rast bû ku min tenê li gor ezmûn û çavdêriya xwe rewşa kovargerîya kurdî vegota. Malperên ku min lê nihêrîn yek jê jî malpera Kitêbxaneyê Kurdî bû. Di wê derê de beşa kovaran heye, logo û agahiyên kovaran tê de cih digirin. Zimanê weşanê jî bi alayan hatiye nîşandan. Bi bawerîya min rewşa kovargerîya kurdî baş dide xuyakirin. Ji aliyê ziman ve mirov lê binihêre alaya Kurdistanê di nav alayên din de winda bûye. Bi qasî ku xuya ye çî kovarên ku xwe gihandinê di wê derê de bi cih kirine. Gava ku min li rewşê nihêrî bê hemdê xwe min got; ku wek mirovan gorên kovaran jî hebûna dê tu goristanan têrî kovarên kurdan nekirina.

Qedexê, pêkutî û astengiyên serdestan tên zanîn. Ji derveyî vana divê em bi destê xwe kovarkujiyê nekin. Hinekî bêhna vî tiştî tê pozê mirov.

Wek encam ez dikarim bibêjim ku kovar ne ji bo navjixwebirî û xwetetmînkirî lê ji bo armançê û ligor pîvanan bîn weşandin dê bi ser bikevin û tiştina li civaka me zêde bikin. Merc û derfetên wê yekê hene.

Sansur û kovageriya kurdî

Bulent GEDÎK

Kovergeriya Kurdî îsal dikeve sala xwe ya sedemîn. Sala 1913'an bi du pêşveçûnên girîng mohra xwe li jiyana civakî ya sedsala dawîn xist û di dîroka civakî ya me de bû xala werçerxê. Yek ji wan di 23'ê Berfanbara 1913'an de Cerda Bab-î Alî ango dest hilatdarbûna Cemiyeta İttihat û Terrakiyê û pê ve giredayî jî serdestiya fikra tirkîti yê ye. Ya din jî di Pûşpera 1913'an de derxistina kovara **Rojî Kurd** e.

Kovergeriya Kurdî ku pêngava xwe ya pêşîn bi kovara Rojî Kurd re avêtibû îro bi ezmûn û destkeftiyên xwe yên bi sed salî gihîştîye qonaxake nû ku bi

ber û berhemên xwe yên nûjen bala xwînêrên welêt û neteweyên dinê jî dikeşîne û xizmeta zimanê Kurdî dike. Dema ku mirov bala xwe dide vê dîroka bi sed salîn û hin kovarên berbiçav, hin xal û taybetmendiyên girîng derdikevin pêş ku divê mirov li serê bisekine. Lê belê ez dixwazim bi taybetî li ser aliyekî wê bisekinim ku ew jî berxwedana li dijî sansurê ye.

Dîroka sansurê diçe civakên kevnare, wateya wê ya peyvînî bi latînî "karê kesên ku berpirsiyariya exlaq(in) dikin" e. Îro bi temamî "astengkirina weşanên, amrazên ragihandinê yên girseyî" dide der. Em bi sepandinên hikûmetê dibin ku sansur îro jî kirû û pêkanînan di rewacê de ye.

Di rojên dawîn de pirtûka Mirov û Mişk (Fareler ve İnsanlar) a Steinbeck, Pirtiqala Şekir (Şeker Portakali) a Vasconcelos û Semerkant a Amîn Maalouf bi hincetên vala hatin qedexekirin. Çapkirina Manîfestoya Kurdan a Abdullah Ocalan hat astengkirin û hin beytên Kazak Abdal û Aşik Veysel ji pirtûkên dersan hatin derxistin. Ev geşedan nîşanî me didin ku di rojên pêşiya me de qada bikaranîna sansurê wê hê berfirehtir bibe, hikûmet dê wekî amrazeke desthilatîyê hê zêdetir serî lê bide.

Di dîroka mirovahiyê de sansur her tim di destê serdestan de xizmeta paşverûtiyê kiriye, li ser geşedanên zanîstî û civakî bandoreke derengxistî kiriye û pêşveçûna mirovahiyê sist kiriye ku hêdî bimeşe.

Di qada zanîstî de mînaka herî berbiçav a vê yekê teoriya gerdûnê ya Kopernîk e. Di warê zanîstê de piştî Arîsto heta dewra Kopernîk feraseta gerdûnê ya dinyanavendî serdest bû. Mirov digot qey hemû gerdûn li dora dinyayê digere. Kopernîk bi teleskopa ku bi xwe çekiribû li liv û tevgera gerstêrkan çavdarî dike û kifş dike ku ne roj li dora dinyayê lê dinya li dora rojê digere. Teoriya xwe ya gerdûnê wekî destnivîsar amade dike. Li gorî vê teoriyê salnameya bi 365 roj û 6 saatî pêk tîne. Lê ji ber mercên sansura giran ên tarîtiya serdema navîn ve pirtûkê bi domana 30 salî vedişêre. Ew dimîne heta sala 1543'an. Feraseta gerdûnê ya dinyanavendî piştî mirina Kopernîk jî bi domana 100 salî serweriya xwe didomîne. Ji ber ku dêr û deshilatîyên serdema navîn li hemberî şopdarên Kopernîk jî sansura tund disepînin û serî li şidetê didin.

Rojî Kurd



صانع طوغوره ، خارقه حلفت عالم !
بیر سن کچی فرزند دیکر ، مادر اعصار .
دهاء اکراددن : سلطان صلاح الدین ابوبی

Gîordiano Bruna ji ber ku pergala Kopernîk diparêze di sala 1600'î de ji aliyê Engîzîsyonê ve tê şewitandin.

Galîleo di sala 1616'an de ji aliyê desteya Sansurê ve tê hişyarkirin lê di 1632'an de pirtûka xwe dide çapkirin. Piştî salekê tê darizandin û hepskirin. Heta sala 1642'an di hepsa malê de dimire.

Heçî Descartes e ku bi çavên serê xwe dîtîbû ka çî hatiye serê Galîleo, pirtûka xwe ya ku tê de pergala Kopernîk diparast nade çapkirin. Di sala 1650'î de dimirê û pirtûka wî 14 sal şûnde tê çapkirin.

Ev şorêşa zanîstî ku Kopernîk dabû destpêkirin de ancax sed sal şûn de bi Newton re bihata tamamkirin.

Sansur rûyê xwe ya paşverû û bandora xwe ya derengxistî di warê civakî de jî nîşan dide. Di dema netewedewletan de jî bo miçiqandina çavkaniyên pîrzanî û pîrçandîtiyê rol û peywira sereke digire ser xwe. Kovergeriya Kurdî ku di berbanga netewedewlwtê de derket holê jî jê para xwe digire. Û di hemen demê de helwesta xwe ya il dijî sansurê jî diyar dike.

Rojî Kurd ji ber rexneyên xwe yên li dijî Cemiyeta Îttîhat û Terrakiyê rastî pest û pêkûtiyan tê û kadroyên Cemiyata **'Hêvî'yê** navê kovarê diguherînin. **Hetawî Kurd** wekî bultena cemiyeta 'Hêvî'yê cîyê Rojî Kurd digire û heta Şerê Cîhanê yê Yekemîn weşana xwe didomîne. Piştî wê jî dîroka kovarge-riya Kurdî dibe dîroka têkoşîna li dijî sansurê.

Hînê di dema cemiyeta Îttîhat û Terrakiyê de him jî piştî demezrandina Komarê serdestên netewedewletê xwe spartin înkâr û îmhakirina çand, ziman û neteweyên din. Sansur jî li ber destê kadroyên dewletê wekî amraza herî bandorker hat bi-karanîn.

Ji ber ku kadroyên damezirînê, ên komerê bi ezmûnên xwe fêr bûbûn ku xwendebûn û zimandarbûna girseyan di pêvajoya netewebûnê de tê çî wateyê û erk û peywira weşangeriyê Kurdî çîye. Ji ber vê yekê heta salên 90'î ku tê de him pest û pêkûtiyên dewletê gihiştin asta herî jor him jî têkoşîna civakî ji têkoşîna man û nemanê derket û destkeftiyên mayînde bi dest xistin. Tu kovareke Kurdî nekarî demdariya weşanê bi dest bixe.

Bi ser de jî hejmara hin kovarên Kurdî ku mohra xwe li dîroka kovergeriya Kurdî xistine ji hejmara tîliyên destekî naborin. Wekî mînak **Rojî Kurd** çar hejmar, **Ronahî** 28 hejmar (Şam) **Roja Newê** (1963) hejmarek, **Tîrêj** (1979) çar hejmar derketibûn.

Tê dîtîn ku serdestan kiriye ku domdariya kovarge-riyê bişikin û bi vî awayî veguhastîna ezmûn û danehevan a di navbera nîfşan de bisekinin.

Her çiqasî kovergeriya Kurdî ji ber mercên zext û

zordariyê û sansurê nekaribû derfetên weşandina domdar û bi îstîkrar bi dest bixe jî bi navber be jî li ser xetê hevgirtî çalakiyeke weşanê ya rikdar meşandiye, ezmûnên dewlemend bi dest xistiye û kevneşopiya berxwdêr pêk aniye. Piştî sala 90'î ev destkeftiyên xwe dewr î kovarge-riya Kurdî ya nûjen kiriye. Lê em dizanin ku sansura ku jî sed salî ve tê sepanandin nebûya, dê jindarî û tevgerdariya zimanê Kurdî ku îro xwe di hemû qadên civakî de nîşan dide, sed sal berê dest pê bikira.

Sansur hîna jî li ser kar e, heta demên dawîn sansurê bi aşkeratir bi kar tînin. Li gorî rapora Rêxistina Rojnamevanên Sînor Nenas, Tîrkiye di lîsteya Azadiya Çapemaniya de di rêza 154'emîn de ye. Li gorî agahiyên ku Tora Ragihandinê ya Serbixwe dide hê jî 68 rojnameger û 29 belavkarên çapemeyî di girtîgehê de ne.

Di bin van şert û mercan de ezmûna kovara Rok Kurdî jî wekî mîlakeke rojane li pêşberî me disekîne.

Giha di bin kevîran de namîne...

Girtîgeha Kocaeliyê



Kovargeriya kurmancî û ranêzikiyên zimanî

Dilawer ZERAQ

Gava mirov pîrsekê bike û bêje; “Ji awirê dîrokî-bûnê ve, gelo kîjan kovar cara pêşîn bi weşîn û belav-bûna xwe ve, kartêkeke berayîn û tê xwestin li ziman û wêjeya Kurdmancî a Bakur kiriye?” Helbet bersîva vê pîrsê li rastê ye: Kovara Hawarê.

Kovara Hawarê, ji layê sedem û hoy û mercên weşîna xwe ve; destpêkek e. Destpêka pênivîsîna bi tîpên Latînî û bi Kurmancî. Û tevî ku di nivîseke ev çend dorteng de mirov dê nikaribe ji gelek awa û awiran ve li ser bisekine jî; gava mirov bala xwe dide nameya ku C.A.Bedirxan ji Mustafa Kemal Atatürk re nivîsiye; ‘... *Paşa Hazretleri, maruf [aşîkâr] olan şahsi ve medeni cesaretinize rağmen, bilmem ki neden şimdiye kadar Türkiye’de bir Kürdistan meselesinin mevcudiyetini seraheten [rahat bir şekilde] itiraf edemediniz, bu itiraf için kuvvet ve kudretine ziyadesiyle itimat ettiğiniz iradenizde o cesareti bulamadınız...*’¹ mirov dikare bêje; derçûna Hawarê, bi awayekî bîreweriyane jêdanaxwarineke serbilindî û pêşanazîyê ye li hember kêmkirin û kêmxistinê; helwest û liberabûnek e li hember tunehesibandin û têxebitîna tunekirina Kurdî ye.

Îcar ku em bîr ser zimanê ku bûye sedem ku kovar der biçe, em ê karibin serê pêşîn vê bêjin: Te divê bila wêjeya çanda serdest be, te divê bila wêjeya çandên rajêrmayî (rajêrhiştî) be; heke helwest û sekinîneke bi vî rengî hebe, ev yek dawîya dawî sekinîneke siyasî ye. Lê belê, ji ber ku vê sekna rewşenbîrane li ser îdeolojiyekê ku ji bo avakirina netewe û çandekê nehatiye danîn, teqil nedaye xwe; û ji ber ku çand û zimanekî li dar û qedîm hebûye li mexderê; hewcetî bi hêzeke motorî a îdeolojîk tunebûye û çand û zimanê heyî bûye kana hêza hevpar.

Loma jî, nîqaş û danûstendinên di kovarê de, ji bilî layên xwe ên çandî û oldariyê, her li ser zimên bûye; û tevî ku Kurmancî ji aliyê nivîskarên xwende û bîreweran ve bi awayekî xurt hatiye bikaranîn jî, hin nivîsên tê de bi me didin nîşan ku ziman û bi taybetî Kurmancî, di hin biwarên wekî çîrok û gotaran de di asta zimanê gel û gelêrî de hatiye bikaranîn. Her wekî di çîroka DILAWERÊ ÇARDESALÎ a SIBHÎ RESÛL de jî bi me ve xuya ye; ‘... *Dilawer*

xortekî çardasalî bû; bi zor diya xwe razî kir, jê xatir xwest, tîfînga bavê xwe bi milê xwe ve kir û giha şervanan... Dilawer, berî hemîyan ket kelehê; ala neyar jê daxist û ala rengîn di şûnê de daçikand. Dilawer giha bû mirazê xwe... Erdê bin lingê Dilawer sor dikir... Dilawer birîndar bû; lê tu kes pê nehesandibû...’² di vê çîrokê de, ziman rasterast û bi vegotîneke sade û li ser hîma devkî hatiye bikaranîn. Loma jî mirov dikare bêje; nêrîn û ranêzikiya li zimên a di nivîsarên kovarê de bi giştî hundirîn e û bêtir li ser danfamkirina kes û civakê pê hatiye nivîsîn. Û her çi qas kêmkirî zêde binîşeya wêjeya avakar a Wêjeya Kurmancî (Kurdî) be jî, hewla kovarê bêtir li ser ‘danpeyitandina hebûna zimên û Kurdan’ e; û vê yekê jî kiriye ku helbest û nivîsarên di kovarê de ji hêla zimên û wêjeyê ve negihîjin ast û xurtiya ku tê xwestin û hêvîkirin.

Helbet birêxistîbûna komelekê (civakekê) ne ew qas hêsan e. Loma jî, li bakur, heta sala 1979’an wekî kovara wêjeyî û zimanî kovar neweşiyane. Di vê salê de Kovara Tîrêjê wek çar hejmar derçûye. Bi qasî ku em ji hin çîrok û helbestên ku di kovara Tîrêjê de weşiyane tê digihîjin; zimanê di kovarê de, li ser îdeolojiyekê ye ku dîsan ji hêla siyasî ve hewlê dide ku bi liberabûn û helwesteke antiemperyal nîşan bide. Loma jî, hem ji hêla naveroka helbest û gotaran ve hem jî ji hêla zimên ve, nihêrîn û awirêkî hundirîn a li zimên heye; û tevî ku zimanê di kovarê de, li ser hîma ku di Hawarê de hatiye danîn, xwestiye bi awayekî ‘modernbûyî’ teqil bide xwe jî, zêde bi ser neketiye û parîkî bûye alava derbirîna raman û îdeolojiyê.

Belê gava yek ji wan travmayên dawîn, travmaya 12’ê Îlona sala 1980’yî, ku hat û wekî kabûsekê li zimanê Kurdî qewimî, wê hingê bêtirîn nivîskarên Kovara Rewşenê zarok û nûgihîştî bûn û hê nû ketibûn baxçeyê xortaniyê û bi şiyarbûna sibehekê re, zimanê ku ew bi hemd û hêla xwe diaxivîn, li wan qedexa bûbû.

Hasan Bülent Kahraman, çîrokekê belav dike. Çîroka jî hêla min ve hatî kurtkirin, wiha ye: ‘... *Girtiyekî ji şerê cîhanê ê duyem... Kêmkirî zêde 75 salî ye. Li*

Rûsyayê, di nexweşxaneyekê de hem wekî dînekî hem wekî nexweşekî radikeve. Der heqê wî de tu tişt nayê zanîn; bes bi zimanekî ku tê texmînkirin ku Macarî ye, dike qarewar û xeberan dide. Ji ber ku tu kesê ku bi Macarî dizane nayê peydekirin, zîlam bi salan wekî girtiyekî hepsê dimîne di nexweşxaneyê de... Piştî doktorek hay jê dibe û çend gotin bi Macarî jê re dibêje. Zîlamê bi navê Andras Tamas ji nişkê ve îşê xwe jî doktor tîne. Û bi bayê bezê 'rabir-dûya xwe' bi bîr tîne; û vê bibîranînê jî dike ku car di hest û sehekên şûngehê jî nû ve pê re çêbibe... Û di nava çend rojan de, wekî her kesekî biaqil û hişber dikeve nav jiyana ku li dar e...' ³

Piştî sala 1992'yan, bi her kesî ve xuya bû ku avakirina komeleke birêkxistî bi çî rengî pêk tê û gava pêk were jî dikare çî hoz û hêz di xwe de bihewîne; û her wiha dikare li ser hîma îdeolojiyê ku neteweyî-bûna xwe jî xwe re kiriye hoy û mercên jênager, rabe û qaçibo bike... Loma jî di vê salê de kovara Rewşenê (ku piştî navê wê bû Jiyana Rewşen û Rewşen-name) dest bi weşanê kir.

Kovara Rewşenê, bi destpêka xwe û bi nivîsarên ku tê de weşyan ve, bi me da nîşan ku; -û her wekî Paul de Man jî dibêje, '*... di spekulasyonên ku di qirna 18'an li ser ripîna zimên hatine kirin de, helbest gihajî zimanê arkaîk e û zimanê modern jî gihajî çîrok û romanê ye...*' ⁴ - divê ziman li ser zimanê heyî ê qedîm û (ne arkaîk) teqileke 'modern' bide xwe da ku karibe bi siya zimanên dîtir re bimeşe.

Û ev nîfş û nivîskarên ku bi Kovara Rewşenê rabûn; zûtir bi vî yekê hisiyar û wan di nav - û li derveyî- ziman û nivîskariyê de şûngehek jî bo xwe ava kir. Ev şûngeh; û sînôr û çembera wê, bi temamî jî çand û tore û zimanê heyî pêk dihat. Û nivîskarên ku wekî Nîfşê Rewşenê hatin pênasekirin; zûzûka neketin pey nîqaşên ne hewce yê zimanî, ên ku di nav hişkî û lêferzkirinên devokan ên seyr û ecêb de asê mane... Wan jî xwe re sloganên mezin û bi dahk û îdîa peyde nekir... Wan hay jê hebû ku nîşaneyê sereke ya kurdîbûnê, zimanê kurdî ye...

Loma jî nîfşê Rewşenê, karî serê pêşîn derkeve derveyî çembera zimên û jî awîrekî derveyî li zimên binêre; da ku keys û delîvîyên ku ziman jî bo vegotinê, jî bo afirandina berhemên wêjeyî dide, peyde bike. Û her wekî Semih Gümüş dide zanîn; '*Ji hêla dîrokîbûnê ve, modernîzm; ancax babeta asta siyâsî û komelî ye; çî gava helbest, çîrok û roman dikeve navê, hem mercê çanda nivîskariyê ku dor li modernîzmê dipêçe û hem jî modernbûna girava nivîskariyê ku piştî demajoya afirandinê xuyanî dibe, dibe tişteki bivênevê.*' ⁵ nivîskarên ku bi Kovara Rewşenê rabûn, bi nivîsên xwe ên jî vî awîrî ve hatî nivîsandin, teqildana 'modern' ku bo Kurdî hewce bû, pê dan kirin.

Ev teqildan; A) Di warê helbestê de bi şêweyekî vekolandinê zimên a jî derveyî wî ve pêk hat; loma jî hêmaya Kurdî ku jî M. Cizîrî bi vir de bû hey li esmanan difûriya -û bi saya serê helbestên Cegerxwîn ling dabû erdê- bû xwedî reh û ripîn. B) Vê teqildanê, di warê çîrok û pexşanên di kovara Rewşenê hatî belavkirin de rengê dîtir da xwe; loma jî vegotinê di ne vegotina berê û li ser zimanê gelêrî bû; êdî vegotin ne li ser guh û guhdarîkirinê bû; vegotineke wisan bû ku; di co û mesîlên delîvîyên hundirîn ên zimên de, rojing û paceyên nûtir bo zimên dihatin vekirin û ronîyeke zimanî jî hundir de belavî derve dibû. Di van çîrok û nivîsên pexşanî de, bi awîrekî derveyî li zimên dihat nihêrtin û keys li zimên çêdibû ku derveyî xwe jî ronîdar bike; û jî ber ku kurdîxêv hînî vî şewq û ronayîyê nebûbûn, gotinên tîr gazin ên wekî, 'Ev çî ziman e... Ez jî vî zimanî fam nakim... Ev Kurdîyeke çawan e...' hey jî devekî diçû devekî dîtir û fetil dida xwe.

Lê têxebitîna vî teqildayîna li zimên ku li ser îdeolojiyê avakar -bi guhndedana helwest û boçûnên Stalînîst- her domiya; û bi derçûna kovarên wekî Kulîlka Ciwan, Kevan û Kovara Wyê, ber û mêweyên xwe ên gihîştî çêj û elesên wêjeyî li me kir diyarî; û jî ber domdarbûna xwe; û jî ber ku kêr zêde li ser heman awîrî peyrewên wan da dû wan; nivîskarên ku bi Kovara Rewşenê rabûn û wan bi xwendîna nivîs û helbestên hev, hev kirin nivîskar; bûn nîfş; û navê nîfşê Rewşenê li wan hat kirin. ⁶

Û heta vî rojê jî; ev teqildayîna dikirandî, her dîome û gava em jî hêla dîrokîbûn û domdariya demajoyê ve dêhna xwe didinê; em xweşîkî dibînin ku êdî zimanekî ku bi sanahî dikare di her war û biwarê de xwe pêş de bîne heye li ber me û êdî jî bo me bûye pişt û palpişteke 'hebûn û nebûn'ê.

Û bêsîk derçûna Kovara Rewşen, Nûbihar û ên ku di vî demajoyê de derketine; hilmeyîçûn û liber-rabûneke antiemperyal û antîkolonyal in ku dongiya ku dihat (tê) xwestin kêr zêde bi wan hatiye bidestxistin.

Perawêz û çavkanî:

Bedirxan Celadet Alî. Mustafa Kemal'e Mektup.

Weşanên Avesta:

Kovara Hawarê. Weşanên Nûdem (Stockholm): Cild 2. Hejmar 29. 1941.

Kahraman Hasan Bülent. Cam Odada Oturmak.

Hayat ve Dil. İstanbul: Agora Kitaplığı. 2002. Çapa 1.

Man de Paul. Körlük ve İlgörü Çağdaş Eleştirinin Retoriği Üzerine Denemeler. İstanbul: Metis Yayınları. 2008. Çapa 1.

Gümüş Semih. Modernizmi Aramak. Radikal Kitap: İstanbul. 13/03/2009

Zeraq Dilawer. Nîfşê Rewşenê. Rojnameya Azadiya Welat. (Quncika bi navê Şador). 12/09/2008



Ajdanek nû li bexçeyê wêjeya kurdî: kovara Hawara Botan *Hasan KAPLAN*

Kaniya Kovara Hawara Botan ji dilê Botanê dizê û di sala 2011'an de dest bi herikandina xwe kir û kete vîtrîna Wêjeya Kurdî de. Kovara Hawara Botan herikandineke ber bi aşti û biratiyê ye. Kovara Hawara Botan ajdaneke nû ye li baxçeyê Wêjeya Kurdî. Kovara Hawara Botan kovereke bi xwerû Kurdî û dumehane ye û li ser çand, wêje, dîrok û zimên weşana xwe dike.

Çima Hawara Botan, Hawara Botan çawa dest bi weşana xwe kir? Ez dixwazim li ser van pirsan rawestim. Biryara derxistina kovara Hawara Botanê di şevên germ ên Cizîra Botan de, di nava sohbetên germ de hate dayîn. Mijara me ya sereke her tim wêje û zimanê Kurdî bû. Me wek ciwanên Bohtî, neviyên Melayê Cizîrî, Celadet Elî Bedirxan, me dikarî çî bikira jibo wêje, ziman û çanda Kurdî. Me dikarî çî li wêjeya Kurdî zêde bikira. Di nava van pirsan de em çûn û hatin. Di encamê de em 7 ciwan me turikê xwe da pişta xwe û em ketin rê. Em bûn rêviyên wêje, ziman û çanda Kurdî. Me di rêya xwe de çî tişta qeç ji bo Kurdî bidîta me dia-vêt turê xwe û em ber bi dilê xwînerê zimanê Kurdî ve hatin û heta qedemê me de av bigere emê bîn ber bi we ve.

Wekî ku tê zanîn herêma Botanê demekî dirêj bûbû navenda çand, ziman, wêje û hûnera Kurdistanê. Gelek zanyar, nivîskar û helbestkarê giranbuha di herêma Botan de gihane û herêm kirine navenda çand, wêje û ziman. Di vir de rola Medreseya Sor hewceye kû em jibîra nekin. Ji ber ku di vê medreseya pîroz de gelek kesên bi qedr gihane û xizmet kirine. Xebata Kovara Hawara Botanê, em dikarin bibêjin kevneşopiya Hawara ku ji aliyê Mîr Celadet Bedirxanî ve diderket dişopîne. Çawa ku Celadet her çendî di nava astengî û zehmetiyê de be jî kovar "Hawar"ê derdixist û gelek kesên weke Cegerxwîn, Qedîrcan, Osman Sebrî gihandine, me xwest em di kîjan quncika herêma Botanê de kesekî xwedî berhem be û hevîrtirşkê wêjeyê pê re heyî derxistin holê û têxin vîtrîna wêjeya Kurdî. Armanca me ya sereke ew e ku em herêma Botan bînin qada

herî jor, qada ku layîqî Botanê be. Ji ber ku herêma Botan ji aliyê çandê ve ji aliyê hûnerê ve ji aliyê wêjeyê ve bi taybetî ji aliyê zimanî ve xwedî nirx e, xwedî qiymeteke giranbuha ye.

Kovara Hawara Botanê mîna dibistaneke çandî û wêjeyî tevdigere. Em dikarin bibêjin xebata me xebata ziravkirinê û teşwîqkirinê ye. Me jî dikarî ji wêjevanê gihastî yên baş nivîs bixwesta û di kovarê de bi çî bikira, lê me xwest em giringiyê bidin nivîskarê Botanê û kesên nû gihayî. Gava kû em li hejmarên kovarê dinêrin her hejmar çend nivîskar li me zêde bûne, ewan jî turikê xwe daye pişta xwe û bûne dilsozê rêya kû em di tê de ne. Eva hanê jî mîna serbazekî zafer bi destxistî coş û kelecaniyê didê me.

Kovara Hawara Botan çaxa ketî rê ve û heta niha rastî gelek astengiyan hat. Astengiyan wek aborî, peydakirina nivîs û nivîskaran û astengiya herî mezin ya dozgera ye. Kovara me ji bilî hejmara 3'yemîn hemî ji aliyê dozgeriya Cizîrê ve hatine kom kirin û derheqê çend nivîskarên wê lêpirsîn hate destpêkirin. Sedemên ku dayîn pêjberî me sedemên pûç in. Dibên hûn propogandaya rêxistinê dikin. Bi vê yekê jî zagona bînpê dikin, dozger li gorî kêyfa xwe tevdigere û egoya xwe tatmîn dike. Lê sedemên biryara komkirina me û armanca me bi hevdû ve girêdayî ne. Li gorî kesên xêrnexwaz Kovara Hawara Botan zarokekî nehs e û divê were fetisandin; lê li gorî kesên xêrxwaz jî Kovara Hawara Botan zarokek bedew û gelekî qenc e û wê her tim nehsiya xwe jî bike.

Wekî encam, em hêvî dikin Kovara Hawara Botan bibe mînak û her herêmên Kurdistanê xebatên bi vî awayî dest pê bikin. Her Kurdistanîyek li herêma xwe mîna moriyekê bixebite, bikeve nava lêgerîn û lêkolinan. Da ku wêje û zimanê Kurdî dewlemend bibe û wêjeya Kurdî ya qadîm a hîna ne derketî holê, derkeve holê.

Kin û kurt bimore kovarmijî

Mahmûd LEWENDÎ

Welê xuya ye ku em ê jî li dij hin aboneyên xwe dest bi xebateke dijwar bikin ku bê pere û pûl ketine nav kompîtura me ya adresan û dixwazin xwîna – pardon – yanî kovara me bimijin.

Me hemû aboneyên xwe yê ku pere nedane tesbît kirine. Niha em ê tenê meslegên wan binivîsin. Ji xwe ew jî bi xwe dizanin.

Hinek ji wan ev in: 18 pîzacî, yek pubcî, 4 tixtor, 8 endamên lijna merkezî ya partî û rêxistin û hizbên cûr be cûr, 12 mamoste, endamekî enstîtuyekê, endamekî komîta karger a federasyonekê, 2 asîstan, 2 doçent, 3 şa'ir, 5 gundî, 3 karker û yekî feqîr.

Ev kesên hanê dîsa li xwe varneqilin û bixwazin ku berdewam kovara me bimijin, wê wextê qetla wan helal e (Wîîî, ev çi bû, tu dibê qey mehkemeya şerîetê ye!). Neyse, ne qetla wan, lê eşkerekirina navê wan helal e.

Birayên hêja yê xwîn mij – pardon – kovarmij!

De zû li xwe mukir werin û varqilin û perê xwe (çima perê xwe, perê me!) bişînin, çimkî kovar bi kayê dernakevin, bi pere derdikevin.

(Berbang, no: 61, 1989)

Têbinî: Ev nivîs ji pirtûka Mahmûd Lewendî ya bi navê Compûtera ber dilê min hatiye girtin.



Du kovarên kurdî ji nava rûpelên fanzîn(Kulîlk)ekê derketin; Kulîlka Ciwan û Kovara W *Sîdar JÎR*

Deh sal bere, di 5'ê Gulana 2003'yan de kulîl-
keke bi navê **Kulîlka Ciwan** aj da.

Di serî de divê bibêjim ku **"Kovara W"** wekî
kovar, berdewamiya "Kulîlka Ciwan" e û Kulîlka
Ciwan jî berdewamiya **"Kulîlk"**ê ye ku Kulîlk ye-
kemîn fanzîna bi Kurdî bû û du hejmar di sala
2002'yan de hatibû belavkirin.

Di dema ku yek ji parçeyên herî mezin ê kovar-
geriya Kurdî ya li Bakur, Rewşen/Jiyana Rewşen
sekinîbû de, du ciwanên kurd li Amedê, bêyî ku
piştgiriye ji tu sazî, kes, dezgeh û rêxistinên kurdan
û yên ne yên kurdan werbigirin zend û bendên xwe
badan û ketin nava hewldana derxistina kovereke
çandî, wêjeyî û hunerî. Yek ji wan ciwanan Deştî
Rewşen bû û yê din jî ez bûm.

Lê divê neye jîbîrakerin ku yekemîn fanzîna bi
rêk û pêk a Kurdî jî bi navê "Kulîlk" ku di sala
2002'yan de ji aliyê me haman kesan ve dihate
amadekirin û belavkirin, bû bîngehek ji bo derke-
tina Kulîlka Ciwan.

Bi kurtasî bibêjim ku dema serlêdan û wergir-
tina "destûrê" ya ji bo derxistina kovarê gelekî dij-
war bû ji bo me. Gelek sedemên vê yekê hebûn ku
dijwar be. Li welat kovarên bi wî rengî tunebûn û
pergala heyî jî nedixwest em di nava hewldaneke
wisa de bin. Ji ber ku dizanîbûn ku piştî me, ew ê
gelekê din li pey me werin û di ciyekî de ew ê ji bo
"wan" bibe şikestinek. Dibe ku Kulîlka Ciwan bi-
bûya navendeke ku pergala heyî qet nedixwest pêk
were jî... Ji lewra di sergotara hejmara xwe ya yeke-
mîn de, Kulîlka Ciwan diyar kiribû ku ew ê li ser
kîjan kelepore bidomîne. Di sergotarê de wisa di-
hate gotin; **"... her wiha me ji weşanên xwe
yên heyî bêguman hêzek girt. Lê belê, li
gorî bîr û baweriya me, bi derketina ko-
vara Kulîlka Ciwan re em ê karibin hêza
weşanên xwe xurtir bikin û bi her awayî
piştgiriye bidinê. Ligel vê yekê jî em Ku-
lîlka Ciwan di warê wêje, çand û hunera
Kurdî de wekî hêzeke katalîzor dibinin,
lewre em Kulîlka Ciwan ji dilê Mezopotam-**

yayê direşînin ser vê erdnîgariyê..." Her
wisa wekî edîtorê Kulîlka Ciwan, di hevpeyvîneke
xwe de jî min wisa gotibû; **"... Bêguman me hay
ji "Rewşen" a xwe û "Jiyana Rewşen" a xwe
heye, lewma jî hemû armanaca me wê ew
be ku em nîşê nû, nîşekî ku ji wê kelepore
neqete biafirînin an jî em bibin wek pireke
ciwan di navbera nîşê nû û kelepore wan a
nêz û dûr de û bêguman "Rewşen" zanîn-
geh û qiblegeha me ye..."** Bi vê şiyarê Kulîlka
Ciwan dest bi weşana xwe kir.

Digel hemû astengiyan du armancên sereke yê
Kulîlka Ciwan hebû; Yek jê rêlibervekirina navên
nû û ciwan bû û ya duyem jî di tunebûna kovarên
Kurdî yên wêjeyî de dagirtina qadekê bû li gorî hêza
xwe. Wekî yek ji edîtor û redaktorên kovarê bi raya
min em gihîştin her du armancan jî û em bi ser
ketin. Ji ber ku wê demê kovarên Kurdî tune bûn û
Kulîlka Ciwan ji aliyê du ciwanên Kurd ên xwende-
kar ve hate derxistin di nava ciwanên Kurd de bi
hejmara xwe ya yekemîn re(zemîn amade bû ji ber
Kulîkê) kete rojeva xwînê û xwendevanên li zanîn-
gehên cur bi cur. Ya din jî wêjekarên Nîşê Rewşenê
yan jî yên beriya Rewşenê jî bi nivîsên xwe di Ku-
lîlka Ciwan de cî girtin. Ji Arjen Arî, Ehmed Hu-
seyîn, Berken Bereh, Serkeft Botan, Rênas Jiyân,
Yaqob Tilermenî, Kawa Nemir, Dilawer Zeraq,
Mem Bawer, wekî edîtor nivîs(çîrok, hevpeyvîn û
werger)ên min û heta xwe digihîne ji nîşê nû Amed
Çeko Jiyân, Elîxan Loran, Faysal Üsiv, Deştî Rew-
şen, Nenas Dilda, Bertav Rizgar, Jînda Ozden, Der-
wêşê Lal û gelek kesên ku niha navê wan nayê hişê
min...

Bi vî awayî Kulîlka Ciwan gihîştibû armanca
xwe. Gelek kesên ciwan bi nivîsên xwe yên pêşîn di
kovarê de cî girtin û her wisa ligel helbest, çîrok û
gotarên nîşê berî xwe, xwe di nava heman rûpelan
de didîtin. Vê yeke jî kir ku sînerjiyek derkeve holê.
Her wisa piştî derketina Kulîlka Ciwan kovara ci-
wanên Zanîngeha Dicleyê ya bi navê **"Tîgrîs"**ê jî
beşeke kovarê ji Kurdî re veqetand û çend kovarên

din ên herêmi jî bi Kurdî dest bi weşana xwe kirin.


Di demeke gelekî krîtîk de kovareke bi wî rengî gelekî hewce bû. Hemû hewldan ji bo kovareke Kurdistanî bû, ji lewre me hejamara xwe ya pêşîn, ji bilî amadekirina çapê, her wiha me li Kurdistanê çap jî kir. Ji lewra me digot “**em kulîlkan ji dilê Mezopotamyayê direşîn ser vê erdnîgarîyê.**” Lewma jî ya herî baş wê ew bûya ku me li welêt çap bikira.

Kovara Kulîlka Ciwan ji aliye xwe yê teknîkî ve ne kovareke gelekî balkêş bû. Ew rastiyeke bû, lê divê nehata jîbîrakirin ku her tişt bi derfetê du xortên ku hê xwendekar bûn dihate derxistin. Gelek caran bi henekî me di nav xwe de digot, “*Dema Celadet Elî Bedirxan Hawar derdixist, ew mîr bû, çakêtê wî pere dikir ku bifirota dikarîbû pê hejmarek derxista.*” Me dizanî ku çakêtê me pere jî nedikir, lê me bi xerciya xwe ya xwendekariyê dida meşandin.

Lê çend tiştên gelekî balkêş hebûn û bi rastî hê jî min ji sedî sed wate nedaye wan, di dema derxistina Kulîlka Ciwan de. Yek jê; Kulîlka Ciwan diçû hemû Bakurê welêt, ligel vê diçû metropolên Tirkiyeyê yên wekî Stenbol, Mêrsîn, Edene, Enqere, Antalya, Îzmîr, Eskîşehîr, Kocaelî. Bêguman ev yek di ser xwendekarên zanîngehan re pêk dihat û heta ciyekî dihate fêmkirin. Tiştê ku di vir de balkêş e ew bû ku kovar ji wan deran jî dihate xwestin û nêzîkî 300 nusha kovar li van bajarên derveyî Kurdistanê dihate belavkirin ku niha kovarên Kurdî li wan bajarên ew qasî nayên belavkirin. Tiştêkî din jî hebû ku ew jî balkêş bû, me bi hezar zehmetiyên aborî kovar derdixist, lê me buroyek ku mirov bikaribe bi rehetî lê bixebite ji bo kovarê vekiribû û bi qasî heqê çapkirinê jî me dida kirêya buroya kovarê. Li gorî baweriya min (ku me ev yek qet nîqaş jî nekiribû) ev yek jî ji bo ku kesên ku serdana Kulîlka Ciwan û kovara tekane ya wê demê ya Kurdî bikin, da ku em bi dilxweşî bikaribin wan li “*Kulîlka Ciwan*” pêşwazî bikin. Ev pêşwazîkirin bi rastî jî bi dehan caran pêk hat û wan pêşwazîkirinan dikir ku em bêhtir li kar sor bibin û bêhtir bixebitin.

Kulîlka Ciwan bi hejmara xwe ya yekemîn di 5ê Gulana 2003'yan de gihîşt ber destê xwendevanan û du salan li ber xwe da.

Dema ku em van hemûyan bidin hêlekê jî, em niha dibinin ku Kulîlka Ciwan li Bakur rehên xwe berdaye nava wêjeya Kurdî. Tiştê herî şênber a vê yekê jî ew e ku piştî bi awayekî hiquqî û aborî pirs-girêkên mezin derketin, me wekî edîtoriya Kulîlka Ciwan piştî hejmara 5'an (ev hejmar hate amadekirin, mizanpaja wê hate kirin, lê li ser kaxezê wekî Kulîlka Ciwan nehat çapkirin) me biryara navberdayînê da weşana kovarê da ku em li riyeke dîtir bigerin.



Piştî gelek nîqaş û hevdiştinên gelekî girîng me biryar da ku em navê Kulîlka Ciwan bidin aliyekî û rawestandin û bi navekî din weşana kovarê bidomînin. Demeke dirêj me 13 nivîskarên Kurd biryar wergirt ku em wekî berdewamiya Kulîlka Ciwan û dîsa bi edîtoriya min kovareke dinê derxin. Piştî wê dema dirêj ku me nîqaş kir, li ser navê “Kovara W” me li hev kir û wekî encam bi edîtoriya min û Dilawer Zeraq Kovara Wyê dest bi weşana xwe kir û hin nivîsên hejmara amade lê neçapkirî yên Kulîlka Ciwan jî me radestî edîtoriya Kovara Wyê kir. Yek ji wan nivîsan ku min gelekî girîngî didayê, hevpeyvîneke ku min beriya Kovara Wyê dest bi weşana xwe bike ji bo Kulîlka Ciwan pêk anîbû, hê jî li ber destê min e û neçapkirî ye.

Dema ku em van hemûyan didin ber hev û didin ser hev, *Kulîlka Ciwan* û *Kovara W* dide xuyakirin, ku hewldana *Kulîlka Ciwan* niha îro bûye yek ji hêza herî xurt a kovargerîya me ya heyî.

Baş bû ku me di şeveke sar a Amedê de biryara derxistina fanzîneke xwerû bi Kurdî li maleke xwe ya xwendekaran da û me di Kurdî de bi Kurdî serhişkî kir.

Tiliyên cixiz

Rûken PEL

Xwe vedişêrin sûretên dêris, li nav pêşîrên vêt û dêmarî,
Tiliyên cixiz in ev, li paş caxeke zengarî,
Dineqîne bizirên xwe siyeke şilfîtaî,
Pak diweşin û qûç dikevin bi têtûzî.

Bi heyvê dikevin şîngiriyên panîreş
li dewsa maçên xesîs.
Û dilalijîn destên me,
didewixe sewta har.

Ez a tehmsar û şengebiya pordirêj,
Dinicirînin bi çakûçên navno, şembelîlkên ser zimên
Û bêtir dibezin peyv, li geliyên dêmûlêv
Şengebiya pordirêj:
"Xwedê kêliyan nasitirîne jinê!
Û ta, mirinê dimeyîne."

Hevpeyvîn bi Tonguç OK re

Hevpeyvîn: Îsmâîl DÎNDAR

Îsmâîl Dîndar- Birêz Tonguç, em dixwazin hûn xwe bi xwendevanên kovara Wyê bidin nasîn. Kî ye Tonguç Ok?

Tonguç Ok- Bi rastî ne hêsan e ku mirov xwe bide nasîn. Ez di sala 1974'an de, li gundekî Avşaranê bi navê Payasli ku bi navçeya Pinarbaşıya bajarê Kayserî ve girêdayî ye ji dayik bûme. Min dibistana seretayî li Kayseriyê xwend. Li Bursayê Lîseya Anadolu qedand.

Di pola dawîn de, ez tevî tevgera şoreşger bûm. Ji ber ku wê demê çend caran hatim binçavgirtin, hêj di xortaniya xwe de, min dewlet ji nêz ve nas kir. Di sala 1993'an de ketim Zanîngeha Marmarayê, Beşa Zimanê Îngilîzî. Lê piştî du salan ji ber ku polês li min digeriyan, ez ji zanîngehê veqetiyam. Du salan, li Stenbolê, "veşartî" xebitîm. Di serê sala 1997'an de hatim girtin. Ji wê demê ve, girtî me. Pêvajoya darizandina min 12 sal dom kir. Di sala 2008'an de, bi angaştê ku min hewl daye peyandiya pergala makezagonê bi darê zorê ji holê rakim, cezaya girtîgehê ya sermedî (muebbet) yê girankirî dane min. Ji ber vê yekê ev 3 sal in, ez di çavîyeke Girtîgeha Kandirayê de, bi tena serê xwe me.

Î.D- Hûn ligel Îngilîzî, Spanyolî û Îtalî, bi qasî ku wergerê bikin bi Kurmancî jî dizanin. Hûn dikarin pêvajoya fêrbûna van zimanan vebêjin? Bi vê ve girêdayî, hindik kesên bi binyata xwe tirk in bi

Kurdî dizanin, lê bawer dikim weke yekî tirk yekem kes hûn in ku ji zimanên din wergeran li Kurmancî dikin. Hûn vê yekê çawa dinirxînin?

T.O- Di pêvajoya Lîseya Anadolu de fêrî Îngilîzî bûm. Jixwe di zanîngehê de jî min di Beşa Zimanê Îngilîzî de dixwend. Ango dema ez hatim girtin Îngilîziya min baş bû. Spanyolî, Îtalî û Kurmancî jî, di girtîgehê de fêr bûm. Ya rast min bi zimanê Almanî dest pê kiribû.. li derve min piçekî bi Almanî dizanî û min dixwest ez wê bi pêş ve bibim. Wê demê em li Girtîgeha Sakaryayê bûn û çawa ku min dest bi fêrbûna Almanî kir, erdhej çêbû; girtîgehê xesareke mezin jê dît û ji ber vê yekê em anîn Gebzeyê. Bi vî awayî ez mecbûr mam navber bidim xebata xwe. Paşê min ji nû ve dest bi dersên Almanî kir, vê carê jî operasyona (qetlîama) bi navê "vegerîna jiyanê" pêk hat û di operasyonê de hemû pirtûk û lîstîskên min parçe kirin. Ji ber vê sedemê min dev ji fêrbûna Almanî berda. Jixwe dem jî ne dema fêrbûna zimên bû.

Demek bi şûnde, min dest bi fêrbûna Îtalî kir. Ji ber ku fonetîk (dengsazî) û rîtmî Îtalî li min xweş dihat. Di demeke kin de, ez fêrî rêzimana vî zimanî bûm, lê belê ji ber bêderfetiye, min nekarî zêde pratîkê bikim.

Paşê, hevalekî li çaviya (odeya) me xwest fêrî Spanolî bibe, ji bo vê pirtûk peyde kirin û dest bi xebatê kir. Min dît ku ew nikare bi tena serê xwe ji



heqê vî karî derkeve; ji bo ku alîkariya wî bikim, min jî dest pê kir. Piştî demekê wî dev ji jê berda, lê min xebatên xwe yên li ser zimanê Spanolî domandin. Hevalên me yên li derve jî alîkariya min kirin; pirtûk û kovar şandin. Di fêrbûna zimên de xwendin gelekî girîng e, bi taybetî jî şopandina weşanên periyodîk. Her wiha min radyoyekî bipêlakurt ji kantînê kirî û ez li kanalên Spanolî geriyam. Min dît ku Radyoya Çînê ya Navneteweyî, di rojê de du saetan weşana bi Spanolî dike. Nêzikî du salan, her sibeh min li wê kanalê guhdarî kir. Bi vî awayî, bi qasî ku wergerê bikim min Spanoliya xwe bi pêş ve bir.

Heqî fêrbûna min a Kurmancî, ku ez ne şaş bim di sala 2006'an de bû. Cîranên me yên çavîyê, hevalên PKKyî bûn. Ji ber tecrîdê me nedikarî hevudû bibînin, lê êvaran di dema woltayê de, me dengê xwe di ser dîwaran re digihand hev û bi vî awayî me qise dikir. Rojekê hevalê min ê hêja Nedîm Yilmaz ji min pirsî; "Hevalê Tonguç, tu bi Îngilîzî, Îtalî û Spanolî dizanî. Ma tu qet zimanê birayên xwe yên kurd meraq nakî?" Ev pirs a wî, bandoreke mezin li ser min kir. Min bi tenê dikarî bibêjim; "Çawa miraq nakim? Ma te pirtûk şandiye ku ez fêrî Kurmancî bibim?" Sibehê, wî pirtûkeke kevin û zerbûyî ya bi navê "Dersên Zimanê Kurdî" di ser dîwêr re, ji min re avêt. Çîroka min a fêrbûna Kurmancî wiha dest pê kir. Wê demê min pirtûkek ji Îngilîzî werdigrand Tirkî û ji sibê heya êvarê ez dixebitîm. Digel vê yekê piştî şîvê bi du saetan jî min serê xwe bi Kurmancî re êşand. Min rê û rêbaza fêrbûna zimên dizanî. Ev awantajê mezin e. Mirov bi zimanekî çiqasî baş zanibe bila zanibe, ger ku wî zimanî di jiyana rojane de bi kar neyne, bibê nebe ji bîr dike. Ji ber vê sedemê her rojê min ji cîranên xwe yên kurd re nameyên/nîşeyên bi Kurdî nivîsandin. Wan jî bersiv dida. Her ku diçû min Kurmanciya xwe bi pêş ve dibir. Piştî sê mehan, ji bo ku xwe biceribînim, min çîrokeke ji kovara Tîrojê ("Kamoyê Diz") wergerand Tirkî. Hevalan vê wergera min gelekî eciband. Bi rastî wan evqasî nedîpan.

Wê demê Azadiya Welat weke rojnameyeke hefteyî derdiket, lê belê rêvebiriya girtîgehê destûr nedida ku em wê bikirin û bixwînin. Ji bo vê me çalakî li dar xistin, me serî li dadgehê da, bi gerî-nende re hevdiştin kir û hwd. Û di dawiyê de, ev hewldanên me encam dan û me dest bi xwendina A. Welat kir. Vê yekê jî Kurmanciya min gelekî bi pêş xist. Rojekê hat ku êdî rojnameyeke hefteyî têra min nedikir. Pêdiviya min bi rojnameyeke rojane hebû. Heçku xebatkarên A. Welat ez bihîstîm, rojname bû rojane. Her weha min kovara Tîroj û Zend jî dişopandin; çîrok û romanên bi Kurdî dixwendin. Romana ewil a ku min xwendiyê "Bîra Qe-

derê" ya M. Uzun e. Gava ku min ev roman dixwend, tam hezar û du sed caran min li ferhenge nihêribû. Lê belê demeke bi şûn de, êdî bêtî ku li ferhengê binihêrim min dikarî çîrok û romanên Kurdî bixwînim. Ji bo kovara ku li girtîgehê ji hêla girtiyan ve dihat derxistin min çîrokek û du gotar nivîsandin. Çîrokekê ji antolojiya wêjeya Ermenî min wergerand Kurdî. Ji hêla xwendin û nivîsandinê ve min gelek rê kudandibû. Lê min dixwest ez bi Kurmancî biaxivim û bi hevalên kurd re bi zimanê wan a zikmakî (dê) qise bikim. Bi vê mebestê, heta ku me ceza xwar, nêzikî du salan, em bi hevalên ji doza PKKê yên li girtîgehê re derketin sohbeta navxweyî. Di hefteyê de carek bi sê saetan, deh kes di salona hevdiştinê de hevudû didît. Ev ji bo min derfeteke bêhempa bû. Bi saya van sohbetan min ji hêla axaftinê ve jî Kurmanciya xwe bi pêş ve bir. (Ev sê sal in ez ji wê derfetê bêpar mame û di navberê de divê ez bibêjim ku min gelekî bêriya wan sohbetên germ kiriye.)

Belê bi kurtasî çîroka fêrbûna min a Kurmancî wisa ye.

Î.D.- Ku hûn her çar zimanan (Îngilîzî, Îtalî, Spanolî û Kurdî) deynin ber hev, di fêrbûna kîjan an kîjanan de we zehmetî kêşand?

T.O.- Weke tê zanîn ji hêla binyadê ve ziman kom bi kom ji hev cuda dibin. Her wekî Hind- Ew-rûpî, Hamî-Samî, Ural-Altay û hwd. Ji ber vê yekê ew ne pêkan e ku em zimanan rasterast bidin ber hev. Ji bo vê divê lêkolîneke kûr bê kirin û pirtûkek bê nivîsandin. Dibe ku pirtûkek jî têrê neke. Ji ber heman sedemê, ji hêla dewlemendiyê ve berhevda-nîna zimanan ne rast e jî.

Di warê ziman û zimanzanîyê de, li ser dewlemendîya zimanan gelek nîqaş hatine kirin û ev nîqaş hê jî didomin. Weke hûn jî dizanin dewlemendî têgîneke dîmaneyî (îzaftî) ye. Gava ku hûn dibêjin zimanê me dewlemend e, wateya vê ew e ku zimanê we ji gelek zimanên din xurtir e. Jixwe pirs-girêk jî ji vir derdikeve. Bêtî ku bizanibe ka pîverên dewlemendîya zimên çi ne, mirov hewl dide ku dewlemendîya zimanê xwe bide xuyakirin. Dibêje zimanê me dewlemend e, ji ber ku xwedî nîzanim çend hezar peyv e, ji ber ku zimanê zanistê ye, ji ber ku zimanê helbestkî ye, felsefîk e, ji ber ku di zimanê me de zayendî heye, ji ber ku zimanê me qer-tafan digire dawîya koka peyv, ji ber ku zimanê me qedîm e/nûjen e û hwd. zimanên din biçûk dibîne; weke Bülent Arinç dibêje ku Kurdî ji bo perwerdehiyê ne guncan e, pêşneketî ye û hwd. (Balkêş e, wextekê –di sala 1975'an de- li Spanyayê wezîrê Francoyê faşîst, Suarezê "binavûdebg" jî ji bo zimanên Katalonî û Baskî peyv bi peyv heman şîrove ki-

ribû.) An jî mirov ji zimanê xwe fedî dike; dibêje ku zimanê me ne nûjen e, qels e, ne felsefîk e û hwd. Jixwe megalomanî (xwepirmezindîtî) û xwe pirbi-çûkdîtî, birayê hev in û her tim mil di mil de digerin. Her du jî xwe dispêrin nezaniyê. Dayika ku can dide wan, kaniya ku av dide wan, nezanî ye. Her wiha divê ew jî neyê jîbîrakin ku korbûyîn çeşneyeke nezaniyê ye. Mirov nezan nebe jî ji ber berjewendiyên xwe heye ku bi domana demê re xwe kor bike û bibe nezan.

Ez tîm pîrsa we. Her ziman ji hin aliyan ve ji yê din dewlementir e. Lê belê ger ku em van çar ziman bi gelemperî, li gorî hêza wan a derbirîne binirxînin, divê em bibêjin ku her yek bi qasî yê din dewlemend e. Bo nimûne, ji hêla rêzimanî ve di nav van çar ziman de, zimanê herî xwerû Îngilîzî ye. Di vî zimanî de zayend nîn e; lêker li gorî cînavkên kesan ji hev cuda nayên kêşandin; raweya daxwazî tune ye, ango di hevokên daxwazî de ne hewce ye, lêker bi şeweyekî cuda bîne bikaranîn; qertafên çekirînê gelekî kêmtir in, qertafên kêşanê hema bêje tune ne û hwd. Her wiha hebanoka peyvên a vî zimanî bi piranî (ji sedî heftê-heştê) ji peyvên latînî pêk tên û hwd. Ligel vê yekê tu kes nikare bibêje ku ew ji zimanên din qelstir e. Zimanekî şixulandî ye û pêşketî ye. Îro li hemû cîhanê di warê siyaseta, zanist û ramanê de Îngilîzî zimanê serdest e. Bêguman ev nayê wê wateyê ku zimanê Îngilîzî ji zimanên din dewlementir e jî. Sedema serdestiya wî serdestiya emperyalîzma Anglo-Sakson e.

Pîvera dewlemendiya zimên, pergala rêzimanî û hebanoka peyvên bîngêhî e. Di her zimanî de nêzîkî du-sê hezar peyvikên bîngêhî hene û peyvikên din ji van peyvikên pêk tên. Pergala rêzimanî û hebanoka peyvikên bîngêhî, hîm û pûxtiya zimên tînin pê. Ziman hêza xwe ya derbirîn û xwepêşvebirînê ji vir distîne. Bi saya wan li ber xwe dide û li ser piyan dimîne. Li dijî siyaseta pişavtinê hebûna xwe didomîne. Nabe ku zimanekî xwediyê hêza afirandin û xwepêşvebirînê weke zimanekî xizan bê hesibandin. Divê mirov xizanî û neşixulandîbûn tevî hev neke.

Belê ku em vegerin mijara xwe, dikarim bibêjin ku ji hêla rêzimanî û bi taybetî jî ji hêla hevoksaziyê ve Kurmancî herî zêde dişibe zimanê Latînî, xasima zimanê Spanolî. Di her du ziman de jî raweya daxwazî cihekî taybet digire. Hevokên pêreyî bi gihaneka “ku”/ “que” bi hevoka bîngêhî ve tên girêdan. Pêdînek bi heman awayî tên sazîkirin; di her du ziman de jî beravajiyê Tirkî û Îngilîzî pêşî nav tê û paşê jî rengdêr. (mînak: Ala Sor) Bi ya min kurd dikarî dikarin bi hêsanî fêrî Spanolî bibin.

Her çiqasî zimanê Kurdî û Tirkî ji hêla rêzimanî ve qet naşibin hevûdû jî ji hêla ferasetê (biwêj, goti-

nên pêşyan, wêjeya devkî, helbest û çîrokên gelerî, destan û kilaman) ve li gorî zimanên ewrûpî gelekî nêzî hev in...

Min herî zêde di fêrbûna Îtalî de zehmetî kêşa. Lê sedema vê ne di jwariya Îtalî ye, bêderfetî ye. Li girtîgehê min nekarî di radyoyê de kanaleke Îtalî bibînim û lê guhdarî bikim. Bi awayekî birêkûpêk min weşaneke peryodîk jî neşopand. Ji ber vê yekê, her çiqasî min pirtûkek û çend gotar ji Îtalî wergerandin jî, îtaliya min li gorî yê din qels e.

Ji bo min ya herî hêsan jî fêrbûna Kurmancî bû. Li bajarên tirkî be jî girtîgeh hema bêje weke taxa kurdan e. Ango bi salan e, ez li taxa kurdan dijim. Piraniya heval û cîranên me kurd in. Ji hêla şopandina weşanên Kurdî jî min qet tengasî nekişand. Her weha ji bilî zimanê xwe yê zikmakî, ez herî zêde ji zimanê Kurdî hez dikim. Lewma ez bi hêsanî fêrî Kurmancî bûm.

Divê ez vê jî bi ser ve zêde bikim, bêtî ku mirov serê xwe biêşîne nikare fêrî zimanê din bibe. Ez qala xebitînê nakim, qala serêşandinê dikim. Ji bo vê jî divê mirov ji zimanên din hez bike.

Î.D- Têkiliya ziman bi hev re û her wiha têkilî û bandora çandan bi hev re û li ser hev çî erênî yan jî neyênîyan derdixe holê. Werger, jî bo zimanekî tê çî wateyê?

T.O- Têkiliya ziman bi hev re, xasima di roja me de, jênerevîn e. Tiştêkî baş e jî. Bi vî awayî ziman hevudu dewlemend dîkin; bes ku ev têkilî siruştî be, bi destên dewletê siyaseta pişavtinê neyê meşandin.

Ji bo ku ziman zor bide sînorên xwe û xwe dewlemend bike werger navgîneke girîng û bikêr e.

Werger di navbera ziman de û herwiha di navbera gelan de jî pirek e. Wan bi hev re girêdide. Bi saya berhemên wergerandî gel hevudu fêhm dîkin, nêzîkî hev dibin û him zimanê xwe him jî çanda xwe dewlemend dîkin.

Werger ne zivirandina peyv û hevokan e, fêhmîkirin û veguhastina hest û ramanan e. Divê wergêr hevoka ku werdigerîne baş fêhm bike û bêtîmasî (û helbet bêtî ku zêde bike) bi zimanê dinê jî nû ve saz bike. Werger her tim motamot, ango peyv bi peyv nayê kirin. Carinan divê mirov avahiya hevokê biguherîne; bo nimûne li dewsa lêkera tebatî, lêkera lebatî bi kar bîne û hwd. Lê nikare wateya hevokê biguherîne, zêde yan kêmtir bike. Rêgez ev e. Ji ber ku her ziman xwedî pergaleke rêzimanî û ferasetek li gorî xwe ye, carinan divê hevokên dirêj bîne parîkirin, carinan jî yê kurt bikin yek. Pêwîst e wergêr ne bi tenê wateya peyv û hevokan, konteksta nivîsarê û giyana zimên jî li ber çavan bigire. Bo ni-

mûne, “çavreşa min” weke “siyah gözlüm” nabe. Peyv rast bin jî, li giyana zimanê Tirkî nayê. Bo ku hest, raman û kirpandina vê qedînekê rast bêne veguhastin, divê weke “kara gözlüm” bê wergerandin.

Weke mînak, ez dixwazim hevokeke ji “Manîfestoya Komunîst” bi we re parve bikim. (Min ev berhema ji çapa Îngilîzî ya di sala 1888’an de bi edîtorîya F. Engels hatibû weşandin wergerand) Di destpêka pirtûkê de hevokeke weha heye;

“Where is the party in opposition that has not decried as comunistic by its opponents in power?”

Ger ku mirov vê hevokê peyv bi peyv wergerîne divê wisa bibêje;

“Partiya muxalif a ku ji aliyê dijberên xwe yê desthilatdar ve weke komunîst nehate tawanbarkirin li kû ye?”

Ev werger ji hêla şeweyê ve rast e, lê belê wateya hevokê bi tevahî nade der. Ji aliyê kirpandinê ve qels dimîne. Bo ku wate û kirpandina hevokê bêkêmasî bidimê, min ev hevok wiha saz kir;

“Ma partiyeke muxalif heye ku ji aliyê dijberên xwe yê desthilatdar ve weke komunîst nehatibe tawanbarkirin?”

Heke werger peyv bi peyv bihate kirin, me dê nekaribûna peyva “ma”yê bikar baniya. Ji ber ku di Îngilîzî de bergindeya “ma” yê ya rasterast tune ye. “Ma” peyveke gelekî xweş e û xwesarî Kurdî ye. Îngilîz van hest û ramanên ku kurd bi peyva “ma” yê tînin zimên li gorî kontekstê bi peyvên cihêreng didin der.

Zelalî û herikbariya wergerê jî gelekî girîng e. Di berhemeke wergerandî de, hevok yeko yeko rast bin jî, ger ku zimanê wergerê ne herikbar be, ev jî kêmasiyek e. Piştî ku werger qediya, divê berhem jî vê hêlê ve jî di ber çavan re bê derbaskirin.

Bêguman divê wergêr derheqê mijara berhema ku werdigerîne jî bi qasî ku têr bike xwedî agahî be û hwd.

Karekî bi rastî jî gelekî zor û westîner e, lê bi qasî wê girîng û kêfêr e jî.

Î.D- Hindik be jî, hin kesên tirk bi awayekî fêrî Kurdî dibin. Lê belkî yekem kes hûn in ku ji zimanên di li Kurmancî wergerê dikan. Ev yek çawa pêk hat?

T.O- Dema ez fêrî Kurmancî bûm, ji bo ku xwe biceribînim min çîrokeke bi Kurdî nivîsand. (Heta îro min bi zimanê xwe yê zikmakî tu çîrok nenivîsîne.) Min ev çîroka xwe bi hevalên kurd, ên di girtîgehê de da xwendin. Hevalan ew gelekî ecibandin û di kovara xwe de weşandin. Dîsa ji bo kovara van hevalan min çîrokeke bi navê “gelîncikler” (gulebûk) ji Tirkî wergerand Kurmancî. Ev wergera min jî hate ecibandin. Bi vî awayî, di warê nivîsandin û

wergerê de, min baweriya xwe bi xwe anî. Jixwe di serî de min dixwest, piştî ez fêrî Kurmancî bibim “Manîfestoya Komunîst” û “Marksîzîm û pîrsgirêkên Zimanzanîyê” wergerînim Kurdî. Naveroka van her du pirtûkan jî li gorî dilê min, zimanê wan jî li gorî diranên min bûn. Kurd dibêjin, ceribandî ji neceribandî çêtir e, min jî guh da wan û dest bi wergera “manîfestoyê” kir. Paşê min ew bi hevalê Emîn Gurban da xwendin. Wî werger eciband, bi pêşniyariyên xwe alîkariya min kir û me wergerê şiyand Weşanxaneya Evrenselê. Manîfesto di sala 2011’an de di fûara Amedê de derket pêşberî xwendevanan. Amediyan eleqeyê mezin nîşanî “Manîfestoyê” da. Derbarê wergerê de, di rojname û kovaran de rexneyên erênî derketin. Ya rast, digel hin kêmasiyan, min jî karê xwe ecibandibû. Dûre min “Marksîzîm û Pîrsgirêkên Zimanzanîyê” dîsa ji Îngilîzî wergerand Kurmancî. Li gorî min, ev berhema Stalîn, ji bo nîqaşên li ser zimên û zimanzanîyê rêxweşker e. Min xwest ku xwendevanên kurd ên ku serê xwe bi zimên diêşînin vê berhemê bixwînin û sêde jê wergirin. Herî dawî, li ser daxwaza Weşanxaneya Evrenselê min berhema Lenîn a bi navûdeng, “Divê çi bê kirin?” wergerand. Ew jî li ber çapê ye.

Î.D- Astengiyên ji ber rewşa girtîgehê yê derbarê wergerê de çi ne?

T.O.- Li girtîgehê astengiya herî mezin a li ber xebatên wergerê sar û seqem e. Zivistanî mirov nikare li ser maseya xwe rûne û bixebite. Tu dibêji qey em di hundirê sarincê de ne.

Henek li aliyekî (du henek, rastiyeke in!) em nikarin înternetê bikar bînin û herin pirtûkxaneyê. Her çiqasî jî berê de ez amedakariyê dikim jî, gava wergerê dikim pêdiviya min bi pirtûkekê çêdibe. Hingê ez mecbûr im li benda roja hevdîtîne bimînim. Paşê jî li hêviyê dimînim ku malbat an hevalên min pirtûkê ji min re bişînin. Di vê navberê de, dema dirêj derbas dibe.

Î.D- Li vî welatî bi salan e pîrsgirêka kurd heye. Ji vê pîrsgirêkê; pîrsgirêka zimên, pîrsgirêka zimanê dê, ango pîrsgirêka Kurdî di serî de ye. Ku em rewş û encama piştaftinê jî li ber çavan bigirin, bi we çareserî çi ye, dê çawa pêk were?

T.O- Azadiya kurdan û azadiya zimanê Kurdî bi hev ve girêdayî ne. Bêyî ku kurd azad bibin zimanê Kurdî azad nabe û bêyî ku zimanê Kurdî azad bibe, kurd azad nabin. Çareserî azadiya gelê kurd e. Heta ku mafê kurdan ê self- determinasyonê neyê pejirandin pîrsgirêka kurd çareser nabe. Pûxtiya meseleyê ev e. Ango divê gelê kurd çarenûsa xwe, bi xwe diyar bike. Divê em vî mafê wan bê şert û merc bi-

pejirînin û qîma xwe pê bînin, her weha ji bo ku mafên wan bêne pejirandin jî em bi awayekî çalak têbikoşin. Heta ku dewlet mecbûr nemîne, ew gavan navêje. Divê em vê yekê baş bizanin.

Î.D. Gelek kesên tirk ji hêla siyasî ve li nik kurdan cî digirin, lê hûn bi fêrbûn û xebatên li ser zimanê Kurdî kirûyeke balkêş in. Hûn dikarin vê yekê binirxînin?

T.O. Belê, gelek hevalên kurd ji ber ku ez li ser zimanê Kurdî dixebitim, pesnê min didin. Tiştên ku min kirine, ne hêjayî pesindayînê ne. Bi rastî diviyabû ku ji berê de ez fêrî Kurmancî bibûyama. Bi xebatên xwe yên li ser zimanê Kurdî, xwerexneya xwe bidim. Hêvîdar im ku ev xwerexnekirina min bê pejirandin.

Î.D. Hewldanên dewletê yên derbarê Kurdî de, mîna Zanîngeha Artuklu, TRT 6 û dersên hîlbijartî hene. Hûn van çawa dinirxînin?

T.O. Min li jorê jî gotibû, heya ku dewlet mecbûr nemîne, gavên bi vî rengî navêje. Heta salên dawîn, dewletê digot ku kurd nîn in. Lê belê ji ber têkoşîna gelê kurd û konjoktura cîhanê ya îro mecbûr maye hebûna kurdan bipejirîne. Lê hê jî wê dev ji siyaseta xwe ya asîmlasyonê bernedaye. Jixwe kurdan televîzyona xwe vekiribû; ji bo ku zimanê xwe biparêzin û bi pêşve bibin, sazîyên xwe yên mîna Enstîtûyên Kurdî û TZPKurdî ava kiribûn. Ferhengên Kurdî hatine amadekirin, romanên bi Kurdî tene nivîsandin, klasîkên cîhanê yên mîna berhemên Shakespeare hatine wergerandin û hwd. Bêguman mirov dikare van hewldanên dewletê weke tawîzan, an jî di heman wateyê de weke destkeftiyên kurdan binirxîne. Lê belê aşkera ye ku bi van hewldanên xwe dewlet dixwaze pêşî li rizgariya gelê kurd bigire. Ango armanca dewletê ne pejirandina mafê kurdan e. Ku dewletê gavên hanê berî deh salan avêtibûna, belkî karibû kurd bixapandanan, lê êdî têkoşîna gelê kurd gihiştîye wê astê ku dewlet nikare bi van hewldanên xwe yên xapînok encama ku dixwaze bi dest bixe.

Ji bo pêşxistina çand û zimanê Kurdî zanîngeh derfeteke gelekî girîng e. Lê rewşa Zanîngeha Artuklu çawa ye, ez pê nizanîm. Ku ez ne şaş bim, Selîm Temo li hemberî siyaseta AKPê ya xapînok berteka xwe nîşan dabû û îstîfa kiribû. Dîsa jî li gorî yên din zanîngeh girîng e; bes ku bi rastî bibe zanîngeh û li ser ziman û wêjeya Kurdî xebatên akademîk bike.

Î.D. Derbarê xwendin, nivîsandin û weşanên Kurdî de, raman, rexne û daxwazên we li raya giştî çî ne gelo?

T.O. Ne hêsan e ku gelekî bêdewlet wêjeya xwe ya nivîskî biafirîne. Kurd digel hemû astengiyan di vî warî de bi ser ketin. Ev yek bi xwe hêjayî teqdîrê ye.

Belê wêjeya Kurdî ya nûjen hêj jî di dewra naştiyê de ye. Ligel vê yekê, wê ji niha ve berhemên girîng derxistin holê. Ez bawer im, wêjeya Kurdî, di demên pêş de, di nav wêjeya cîhanê de cihê xwe yê ku wê heq kiriye bi dest bixe. Ji ber ku xwediyê bingeheke xurt û qewî ye. Bes ku kurd xwedî li ziman û wêjeya xwe derkevin. Bi taybetî ciwanên kurd divê serê xwe bi zimanê xwe biêşînin.

Girîng e, berhemên wêjeya cîhanê yên klasîk li Kurdî bêne wergerandin.

Çi di warê wêjeyê, çi di warê raman û siyaseta de, nivîskarên kurd bi piranî bi zimanê Tirkî dest bi nivîsandinê dikin û piştî derbasî nivîsandina bi Kurdî dikin. Rasterast bi zimanê Kurdî dest pê kiribin jî ji çavkaniyên Tirkî xwedî dibin. Ji ber vê sedemê pêdivî bi rênişa wergerê (ji Tirkî bo Kurdî) heye. Hişyariyeke Feqî Huseyin Sağnıç tê bîra min. Wî biwêja “hoşuna gitmek” weke mînak nîşan dida û digot ku “xweşiya min çû” ne îfadeyeke Kurdî ye û divê “li min xweş hat” bê gotin. Rênişa wergerê dikare xeletiyên bi vî rengî ji holê rake. Xwendevan dikarin fêrî Kurdiya rast û xweşik bibin û tehma Kurmancî bistînin.

Bi rastî jî ber ku ez derfet û îmkanan nizanîm, nikarim pêşniyarên şênber bikim.

Î.D. Hûn çiqasî dikarin wêjeya Kurdî bişopînin?

T.O. Salên berê min wêjeya Kurdî ji nêzîk ve dişopand. Lê mixabin vê pêlê jî ber gura hiya kar ez nikarim bi qasî ku dixwazim wê bişopînim. Dîsa jî hewl didim jê dûr nemînim.

Î.D. Heta niha we berhemên ji zimanên biyanî wergerandin Kurmancî. Gelo tu ramana we ya ku ji Kurmancî wergerînin Tirkî, Îngilîzî, Îtalî, Spanî heye? Ku hebe, hûn dixwazin kîjan berhemê wergerînin?

T.O. Na, bi rastî ramana min a bi vî awayî tune ye. Ez ne ji bo zimanên biyanî, bi tenê ji bo Tirkî (û carinan ji bo Kurdî) wergerê dikim. Piraniya nivîskarên kurd bi Tirkî jî baş dizanin û dinivîsînin. Ên ku dikarin vî karî ji min baştir dikin hene.

Î.D. Ji bo bersivên we, li ser navê Kovara W'yê spasîyên xwe pêşkêş dikin.

T.O. Ez jî spas dikim û ji hemû xebatkarên W'yê re serkeftinan dixwazim.



Name ji bo Mulazim Ozcan

Ezîzê CEWO

“Dem baş, birayê delal!

Bi rastî, eger ez ji te re bibêjim, ku ez ji agahiya girtina te zêde matmayî nebûm, bila neyê wê wateyê, ku dilê min neêşiyaye. Di nav gelê me de gotinek heye, dibêjin; “Mineta dijmin û qirşek!” Gelê me êdî ev derbaskirye. Û, bi dîtina min, tu van tiştan baştir têdigihîjî, ne ku... Na, birayê delal, ez baş dizanim, tu hîç hewceyê gotinên dilbaristaniyê jî nînî, tu di Welatê me de mezin bûyî, li ber agir û alava siyaseta tunekirinê ya rêjîma faşîst û di bin baskê tevgera rizgarîxwaz de qal bûyî, û te dizanibû, ger li ser zimanê Kurdî û bi zimanê Kurdî dinivîstî, di welatekî faşîsttirîn ê wek Tirkiyeyê de, tê çî wateyê...

Hema tenê di vê serdema me de, ji Apê Mûsa û Wedat Aydîn dest pê kir, heya bê derê van rojên me bi hezaran rewşenbîrên me hatine serwindakirin, bi dehhezaran dot û lawên gelê me yên here hêja di girtgehên dagerkeran de dirizin, di nav wan de, birêz Abdullah Ocalan, li girava Îmraliyê eva ji salekê zêdetir e, di tecrîda giran de ye; bi hezaran zarokên me yên girtî hene. Îro di girtgehên Îranê de derdorê sî kurdên welatparêz benda dardakirina xwe ne...

Û baristaniya van hemûyan jî di wê de ye, ku gelê kurd li ser pêyan e. Ji berê va hatiye gotin: “Gelê ku nexwaze bimire, tu kes nikare wî bikuje!”

Tu îro serbilind î! Li pişt te va bi mîliyonan kurdên xwedî şan û şeref û dilsoz sekinîne, bi tevgera xwe ya netewî va, bi hêza xwe ya siyasî va û bi hêzên xwe yên parastinê va. Azadiya te jî û ya hemû gelê me jî îro di destên gelê me bi xwe de ye. Gelê me di Başûr de gihîştîye mafê xwe yê netewî û berbi serxwebûnê va diçe, di Rojavayê welêt de ew li ser rêya destxistina mafên xwe ye, di Rojhilatê Kurdistanê de rewşa dîrokî digihîje, û gel li wir xwe ji bona roja azadiyê amade dike. Li Bakur jî... Bakur îro bûye KELA berxwedanê, û garantiya pîrsgirêka kurdî jî di wir de ye... Bi van hemûyan va, û di nav van hemûyan de, tişteki girîng jî derketîye hole, ew pêvajoya avakirina yekîtiya netewî ye...

Wisa ku, her kesek di nav vî gelî de rola xwe heye û her yêkê jî wê di vê pêvajoya dîrokê de cîyê xwe bigire...

Lêbelê ev ê têkoşîna vê serdemê her tiştek em hîn kirine:

Berxwedan, Berxwedan û dîsa Berxwedan!...

Berxwedan jîyan e!

Û di nava vê çarçeva Kurdistanî ya netewî de ez silavên xwe yên germ ji te û hemû berxwedanvanên hebs û zîndan ra dişînim.

Heya hevdîtina di roja Azadiya Mezin de.

Moskow-22 Tebax 2012
Birayê te, **Ezîzê CEWO**

Vîr

Fehmî KOÇ

Bi hezar serran o
tehmê sewtê mi vinî bîyo.
Nika roşn dalpa dalpa dalpeno verê kokimê mi
vengê çekûyanê vinibîyaye, newe
çilke çilk çilkeno rocanê cûyinê mi ser.

Emrêkeyo vinibîyaye bê herûnde
veristîya bê wayîre kamîrê bena ware?
Çend hesretî vîyarnay, çend birîynî kewênay.
Kamî rocê mi bejî, bedenê mi virrnik verda
zerrey mi beyar serrê mi estewrin, bê dewl
Nêzana.
Mi çend serrî, çend emrî verarey to de kan kerdî?
Bi emro bêwayîr, bi sewto bê tehm
bi ziwano ancûl, cûyinêke bê amînkerde!
Qiseyê bejî demman kerdeyê serdestan,
serbestî ra mihîyrî heskerdiş ra bêrî...
De vaco emro!
Ti çira warey xo de lete lete bibî?
Herûndey çend xenceran, çend rotişan
Sîney welatê mi de mor bibî
Teyna viroyê destan dirbintiya qeydan
Zingarey kelemçan, varnayişê hesran
marê mîras mendî.
Çinêbîyayîşê yewitîy bîy belay çend qirnan
çend dewî çend emrî çend hewî
çend kêyey o zilm ra bêpar mendî
Heme rriperê vîrê ma tertelan ra pirrê
Ganî bîyayîşê rista rista vîrê ma de zîl bidê.
Çimkî nûştêyê vîrekerdişî de
qirkerdişo sipey ro rîyê ma heweno

Eyro rocêke newe yo estîyey emrê ma de.
Ganî her rocey ma mûsayenek newe biwelidno.
Her rocê şefeqê xo de çekûyan amîn bikero.
Her çekû bi sewtê xo biwelidîyo fekê ma ra.
Her welidnayen bibo şitlê baxçey bido sibay ma.
Ganî ma zergunbîyayîşê kokimê xo bivîn û verare bikerê

Gelawêj 2012/ Girtîgeha Tokatê

Reşoyê çargurcîk

Cîhan TÛRAN

Mala Nîzoyê Quto êleke (eşîreke) mezin bû. Nîzo û çar birayên xwe jî bi navê Quto ango bi navê bavê xwe dihatin naskirin. Reşo lawê Nîzo bû. Reşo yekî belagîr bû û bela xwe di xelkê dida. Bê tiving nedigeriya û gelek caran jî bi gundiyan re şer dikir. Bi kê dikaribûna zordestî li wan dikir. Aliyekî wî yê mêrxasiyê jî hebû lê qeşmerî jî jê kmê nedibû. Reşo gelek kes tirsandibû, jê ditirsyan. Kê bigota pozê sola te xwar e pê re şer dikir. Piştî xwe dabû êla xwe û xelk jî siya xwe didan tirsandin. Eşîra wan him mezin bû, him jî dewlemend... Di gund de kê kes bi qasî wan an jî wan zehftir dewlemend bû. Erd û zeviyên wan gelek... Ji xeynî vê xwedî gelek gayên xurt î reşbelek bûn. Cotê wan bi nav û deng... Mala Nîzoyê Quto wek gundiyan xwe bi gelemperî ceh û genim diçandin, bi saya gayên xwe yên xurt û jêhatî hilberîna wan zêde bû. Lê Reşo dexesî dikir û hizûr jî gundiyan re nedihîşt.

Mala Zîver jî têra xwe mezin bûn lê ne bi qasî Mala Nîzoyê Quto. Du kurên Zîver bi navên Cesîm û Qasim û gelek pismam, birazê û neviyên wî hebûn. Zeviyên wan hebikî kê... Ji ber vê wan pez û dewar xwedî dikirin. Tu şer û doza wan bi gundiyan re tunebû û gundî jî ji wan xweş bûn.

Di gund de çend êlên dinê jî hebûn, hinek ji wan mezin hinek ji wan biçûk. Ew eşîr jî di halên xwe de bûn. Demên berê ciyên ku bandora dewletê lê tunebû yan jî bisînor bû, gel jiyana xwe li gorî çanda xwe, li gorî şert û mercên ku tê de ne birêve dibir. Lê belê ku dewletê bandora xwe çiqasî da hîskirin ên ku qaşo civak birêve dibirin ketin pey desthilatdariya xwe. Lê berê ne wisa bû. Herê berê jî desthilatdarî hebû lê ne bi qasî desthilatdariya dewletê. Lewra pîrsgîrêk derketana jî çend mirovên rûspî hewldidan ku pîrsgîrêk bi rêyeke maqûl çareser bikin. Dema pîrsgîrêk nehata çareserkerin şer û pevçûn derdiket. Piştî jî hêşirên çavan û xwîn dirijiya... Jixwe dewletê jî li ser axa kurdan xwe bi hêşirên çavan û xwînê dida jiyîn. Ango dewletê hin kes hildidan ba xwe û hin kes jî, yên ku li eslê xwe xwedî derdiketin, dida hemberî xwe û hebûna xwe bi vî awayî didomand. Welhasil, dewletê jî dixwest ku alozî çêbibe û li ser vê aloziyê xwe birêxistin bike...

Di gundan de demên hîlbijatina muxtariyê ango keyatiyê, demên dijwar in. Vê têgeha dewletê xistiye nav gel û kes nizane çend kes ji bonî vê têgehê hatine kuştin. Gotineke mezinan heye, dibêjin “sal bi sal xwezî bi par.” Ev jî wisa ye. Lerwa her ku diçû bi dehan kes ji bonî desthilatîyê dihate kuştin, ax bi xwînê dihat avdan! Di demên wiha de ewrên reş û

xeberên nexweş qet kê m nedibûn. Em jî devê xwe ji xêrê re vekin, hela çika bê Xwedê çi deriyî vedike.

Wextê hîlbijartinên muxtariyê hat. Di gund de miraqek bû ku destpê kir, gelo wê kî bibe berendam? Di gund de nîqaş li ser hîlbijartinê dihatin kirin. Hebû tunebû hîlbijartin, nîqaşên gundiyan tev li ser vê bûn. Qîz, li ser kaniyê diaxivîn “gelo berendam kî ye.” Xortan dev ji gerê berdabûn û ev nîqaş dikirin. Zarokan dev ji listikan berdabûn, li mala gotin li ser vê, çîrokbêjiya kalan jî ev vedigotin, bi tizbiya not û neh dengên li gund heyî dihajmartin. Piştî nîqaşên dûr û dirêj di gund de du kes bûne berendam. Yek Qasimê Zîver û yê dinê jî Nîzoyê Quto... Qasim ket nava hewldanan û bi çend êlên dinê re hevkarî danî. Nîzo jî bi hin êlên dinê re... Lê bi tenê êlekê soz da Nîzo. Du êl bêalî mabûn ango dengên xwe aşkere nekiribûn. Kal û pîrên Mala Nîzo bi libên tizbiyan dengên xwe û yên ku soz dane wan dihejmartin, piştî jî dengên Mala Qasoyê Zîver û hevkarên wan... Encam hima hima weke hev bû lê Mala Qaso hebikekî li pêş xweya dikirin. Encamê, wê li gorî bêaliyan teşe bigirtana. Mala Nîzo dev ji hewldanan bernedan û rojek beriya hîlbijartinê soz ji êleke bêalî girtin. Li gorî vê jî Mala Nîzo îca hebikekî li pêş xweya dikir, dîsa jî encam li ser rewşa êla bêalî bû, ew ê wan encam diyar bikirana.

Li aliyê dinê Reşoyê lavê Nîzo li çend gundiyan gef xwaribû û dixwest bi vê rêyê bi ser bikevin. Roja dinê hîlbijartin çêbû û qediya. Gundî jî mîna ku li ser sêla sor bin, werê li bende encamê bûn. Gupe-gupa dilê gel bû û digotin gelo wê kî bi ser bikeve? Ji heft salî heta heftê salî hemû kes li bende encamê bû. Di encamê de Mala Qasoyê Zîver bi çend dengên zêde hîlbijartin qezenc kiribûn. Ev êla ku rengê dengên xwe diyar nekiribûn, dengên xwe kiribûn du beşan û zehfên wan jî dengên xwe dabûn Mala Qasoyê Zîver, muxtarî nebû para Nîzo. Li ser vîna Mala Nîzo ji Mala Qasoyê Zîver dexisîn. Li aliyekî dewlemendîbûna Mala Quto li aliyê dinê muxtarî. Muxtariya Mala Zîver nîşaneyê desthilatdariya dewletê bû. Ji ber vê jî bi qîmet bû!

Malên wan nêzîkî hev bûn û kulfetê wan çiqasî zêde dibûn ewqasî malên nû çêdikirin û malên (xanî) wan diketin nav hev. Lê bi hev re qet nedixivîn. Keriyên pezên wan cuda, garanên wan cuda bûn. Tev ji ber hîlbijartinê... Rojekê Mala Zîver çûn xwestina qîza melayê gund. Dema ku Mala Nîzoyê Quto ev bihîstin ew jî çûn xwestina qîza mela. Armanc ne qîzxwestin bû. Jixwe mela qîza xwe neda herdu malan jî. Armanca Mala Quto heyfa windakirina muxtariyê

bû. Mala Quto dixwestin ku qeyranek derkeve û ew jî xwe bidin hîskirin. Ango dixwestin bibêjin; “dibe ku me muxtarî winda kiribe lê hêza me heye û em li vir in.” hêdî hêdî, gav bi gav ew dihatin hemberî hev. Mala Quto ev qîzxwestin ji xwe re kirin hinceta pîrsgirêkê. Digotin, “qîza ku me çûye xwestiye, hûn çawa diçin dixwazin? Hûn xwe çi dihesibînin, me çi dihesibînin, em ê wisa bikin ku vî gundî bikin gola xwînê û heft bavê we jî ji mezel rabe nikare we ji nav desten me xelas bike. bila her kes piyê xwe qasî bera xwe bavêje.” Mala Zîver dizanibûn ku rewş nazik e. Ji ber vîna jî xwe ji belayê bi dûr dixistin û ji nehe-qiya Mala Quto re deng nekirin. Ji wan re gotin, “mirov ji bonî qîzekê qet tê hemberî hev, jixwe mela qîza xwe neda û me jî dev jê berdaye.” Axir Mala Quto bi van gotinan jî aram nebûn û her ku diçû hêç û har dibûn. Tiştên biçûk dikirin mesele. Mûyek dikirin weris. Digotin, “çima mirîşka we hatiye ber deriyê me, qaza we çima tê ser bendera me, çêleka we çima di vira re derbas dibe...” Welhasil Mala Quto li şer digeriyan, li belyê digeriyan. Lê ji bonî şer sedem tunebû. Ji tiştên biçûk li gorî xwe mehne derdixistin.

Rojekê navbera Mala Zîver û êlekê li ser zevîçerandinê xerabû. Zaroyên Mala Zîver dema çûbûn ber dewaran, bêhemdî dewarên wan ketibûn zeviyên zad. Li ser vîna jî hatin hemberî hev. Nas û xizmên Mala Zîver li gundên derûdorê hebûn, ji bonî tevdirê çûbûn çekên wan anîbûn ba xwe. Lê gundiyan nehiştin şer û pevçûn derkeve, ketin navbera wan û ew li hev anîn. Qederekê şûn de Mala Zîver çekên ku anîbûn paşve birin.

Çekên Mala Quto hebûn û wan ji zû ve tevdira xwe ya şer girtibûn, lê ji xeynî çend tivingan pê ve yên Mala Zîver tişteki wan tunebû. Rojek piştî ku Mala Zîver çek paşve birin, Mala Quto îcar ji bonî dora kaniyê pîrsgirêk derxistin. Wan kerî û garan ji hev veqetandibûn, heger ji destên wan bihata wê kanî jî ji hev veqetandanan. Lê ev ne pêkan bû. Lewra di gund de sê kanî hebûn û kaniyên dinê jî pir dûr bûn. Herdu mal jî neçar bûn ku herin ser wê kaniyê. Axilbe yê ku pîrsgirêk derdixist jî Reşo bû, bêheq belaya xwe di wan dida. Kanî di nav gund de nêzikî malên Zîverîyan bû. Gundiyan jî ji sihara si-behê ve zû û hetanî êvarê dor bi dor misînên xwe û satilên xwe dadigirtin. Kî zû biçûya dor a wê/i bû. Li ser kaniyê her tim çend jin, qîz an jî bûk satil û misî-nên wan li kêleka wan, milên wan di binê çengên wan de li bende dora xwe disekînin. Beriya hilibjartî-nê dengên wan qet kêr nedibû û her yek weke bil-bilkî kor diaxivîn û derbarê hilibjartî-nê de texmînan dikirin. Qîz, bûk û jinên Mala Zîver an jî Mala Quto ji gundiyan re pesnê berendamên xwe didan. Wisa diketin nav xebirdanê û êdî dor mor ji bîradikirin. Carinan jî diya wan an jî zarokek dihat gazî wan di-kirin û digotin, “qaşo me te şandibû avê, lê tu çûyî

ser kaniyê ketiyî nav xebirdanê, porkurê ma ev wextê te ye, tu dereng mayî!” Lê piştî ku dihatin malê jî digotin, “de ka bibêje li ser kaniyê çi heye, çi tune, agahiyên li ser kaniyê çi nin...?” Lê piştî hilib-jartînan, kanî jî wek ya ku diçû ser wê, bêdeng dibû. Weke ku ava kaniyê nedixwest biherike. Êdî kes ne-diaxivî. Yek wê bibêje qey ew ne yên berê ewqasî ku dipeyivîn, bûn. Her kes ker û lal bû.

Wê rojê Reşo di ber kaniyê re derbas bû û lê ni-hêrî ku qîzên wan li bende dora xwe ne. Lê Reşo ne-sekinî û dest bi çêran kir, “hûn mexsûs zaroyên xwe dişînin ser kaniyê, ji bonî ku zaroyên me neyên. Ku hatin jî di vê germa havînê de bi saetan li ser kaniyê bisekînin.” Li ser vê jîneke Mala Zîver bi dengêki bi-lind nifir kir û got, “Xwedê qebûl neke, ev qeşmerê hanê dişa nasekine. Ya Rebî Reşo belaya xwe li ber lingên xwe bibîne!” Reşo her ku diçû hêç dibû. Wek conegayê ku bêhna xwînê hildide û dibe fişefîşa pozê wî û dike barebar, Reşo wisa har bûbû û dikir qare-qar. Li ser dengên çend xortên Mala Zîver hatin, wan jî çêrî Reşo kirin. Heçî yên ku li sert kaniyê bûn, ji kerba satil û misînên xwe hiştin û bi lezûbez çûn malê xwe. vê carê rewş pir xerab xuya dikir. Mala Nîzoyê Quto weke her carê, îcar jî xwe didan ber şer. Haya Mala Zîver jê tunebû ku ew ji şer re ewqasî di-ranê xwe tûj dikin û tevdira xwe girtine. Heçî yên ku dengên wan seh kirin, him ji Mala Zîver him jî ji Mala Quto, beziyan malên xwe ku rahêjin tivingên xwe. Ango Mala Zîver îcar xwe ji belayê bi dûr nexis-tin. Jixwe tu rê jî ji wan re nehiştibûn.

* * * * *

Mihoyê lawê Cesîmê Zîver li mala xwe rûniştibû. Haya wî ji tişteki tunebû. Mala wî jî qederê çend de-qîqeyan nêzikî kaniya gund bû. Ev nêzikî salekê bû ku zewicî bû û hevsera wî Gulperî ducanû bû. Ew ji bavê xwe nû cihê bûbû û maleke nû ji xwe re çêki-ribû. Ew û Gulperî di xewn û xeyalan de bûn ku ji bonî zaroka xwe dahatûyeke baş bîafîrînin. Gelek caran dia dikirin ku Xwedê kurekî bide wan. Digo-tin, “zarokê kur çiqasî hebin, wê em jî ewqasî hêzdar bibin.” Wext li ber nîvro bû û Gulperî weke her car, bi kêfxweşî quşxane di destan de hat ji bonî ku xwa-rina nîvro çêbike. Miho ji ber peş hatibû û gelekî westiyabû. Ji bonî ku bêhna xwe vede xwe dirêj ki-ribû. Bi dengê tivingê re veciniqî û rabû ser xwe, ber bi pacê ve çû ji bonî ku li derve binêre bê ka çi diqe-wime, çi dibe!? Gulperî jî, deng seh kiribû û ew jî bi awayekî miraşdar da dû hevserê xwe. Dengê gule-yeke dinê jî hat û piştî bû qiyamet... Gule di paceyê re hat û li serê Miho ket. Xwîn û mejiyê wî di paşîya serî re firîya ser Gulperiyê. Reng ji Gulperiyê çû, xwîna wê miçiqî, qirik lê ziwa bû, bêhna wê çikiya, ber çavên wê tarî bû û di cî de ket erdê û ji ser xwe çû. Wê guleya bêbext, wê guleya malmîrat mala Gul-periyê wêran kir. Gulperiyê bêheval, zaroka/ê di zikê

wê de sêwî hişt. Wê guleyê bêbextî kir, bextê Miho reş kir û Miho xiste xewa bêdawîn...

Ewrên reş li ser gund diçûn û dihatin, ji ewran ji dewsa baranê xwîn dibariya. Wan kalên ku bi tizbiya not û nehîn deng dihejmartin, îro bînavber selawat tanîn. Agirê ku ji devê tivingan derdiket ne agir bû, ew agirê dojhê bû. Kesî nedikaribû vê dojhê bite-mirîne, ne jî diwêriya. Xwîna ku ji ezmanan dibariya ev agir gur dikir. Gundî, ji heft salî heta heftê salî hatin secdeyê û kirin gazî; "Xwedê! Ev çi tofan bû hate serê me, Xwedê me çi kirbû, me cilên camiyan û werîsê rêwiyan dizîbû ku ev hat serê me." Lê dengên guleyan dengên gundiyan ditemirand.

Şer destpê kiribû, lê Mala Zîver bêsîleh bûn. Heçî yê hebûn jî bêkêr bûn, lewra zehf kevn bûn. Xortên Mala Zîver xweziya xwe tanîn. Lewra rojek berê ew-qasî sîleh paşve biribûn. Di Mala Quto de heçî yê ku destên wan tiving digirt, tev rahiştin tivingan. Herdu aliyan hevdu dan ber guleyan. Haya kesî ji kesî tunebû û gundiyan jî nikaribûn ber bi taxa wan a ber bi qada şer ve biçin. Reşo, tivinga wî di destan de û gule li ser Mala Zîver direşand. Ji malxerabo re westan tunebû. Halbûkî dema ku kar bikira, zû digot ez westiyam. Îca ne kar lê şer bû. Jixwe Reşo jî zengilê şer bû. Mêrekî Mala Zîver çawa serê xwe di ber **peyîn***ê re derxist, Reşo guleyek lê da û ew qulapt ser peyîne. Ji ber ku kesî newêrabû biçe cenaze hilde, ew bi saetan, hetanî piştî şer, li wira ma. Gundiyan derfet dîtî ku biçin bajêr û gazî mifrezeyê bikin. Heta ku çûn gazî kirin gelek kes hatin kuştin û birîndakirin. Hêdî hêdî cebilxaneya Mala Zîver jî diqediya. Lê ya Mala Quto ne wisa bû. Malmîrata teqîna wan qet kêr nedibû. Te digot qey brûsk vedide. Jixwe Reşo di ciyê xwe de nedisekinî. Xwe jî vê qulê tavê wê qulê, jî vê qilçê diçû wê qilçê û gule dibarand. Tavê lezek berê xatirê xwe xwestibû. Mîna ku bibêje, "min îro tu xêr nedît." Roj bi dilşewatî çûbû ava. Axir di dawiyê de mifreze hat. Lê dereng hatibû. Heke ku bixwestanan zû werin, ew li kerê jî siwarbîbûnan wê xwe zûtir bigihandanan gund. Heke zû bihatanan dibû ku ewqasî kuştî çênebûnan. Bi hatina mifrezeyê re şer qediya.

Piştî ku mifreze hat Reşo firar kir û nehate girtin. Jixwe dewletê jî neda pey. Ji mala Nîzoyê Quto çend kesên din jî reviyên lê ji keynî Reşo tev hatibûn girtin. Ji Mala Zîver yazdeh kes hatibûn kuştin û pênc kes jî birîndar bûbûn. Ji vana pênc kes bi guleyên Reşo miribûn. Ji Mala Quto jî sê kes hatibûn kuştin. Qasimê Zîver jî ji newqa xwe birîndar bûbû lê haya wî jê tunebû. Ew bi biraziyê xwe re eleqedar dibû. Wî nizanibû ew ê li ser kê bigirî. Haya wî ji Miho jî tunebû. Nizanibû ku biraziyê wî Miho, Mihoyê Simbêl Qeytan bi xaniyê xwe yê nû re miraz nekir, nizanibû ku pezê Miho bê şivan maye. Dema ku jê re gotin ew matmayî ma. Nizanibû wê çi bikira, çi bi-

gota. Nizanibû çi xwelî li serê xwe bikira, wê şîna kîjan mêrxasê xwe bigirta... Gundiyan ew û birîndarên dinê li romorka motorê siwarkirin û birêketin ku biçin nexweşxaneyê. Lê zehf xwîn ji Qasimê Zîver çû û di rê de ew jî mir. Du sê birîndarên wan jî wê seqet bimanan û wê heta dawiya emrê xwe jî bi vê êşê bijiyanan. Nîzoyê Quto piştî vê bûyerê çendî xwest bireve jî derfet nedît û hat girtin. Ew jî ji kirinên xwe poşman bû lê êdî fêde nedikir. Ew berpirsiyarê panz-deh canên ku ketibûn bin erdê bû. Wî û kurê wî Reşo zarok bê bav, bav jî bê zarok hiştibûn. Bûyerên ku qewimî bûn yek bi yek dihatin ber çavên wî. Ew çiqasî dihatin bîra wî, wî jî ewqasî li serê xwe dida û poşmaniya xwe dianî ziman. Zêde dem derbas nebû, di girtîgehê de bihecî û mir. Mala Quto malên xwe barkirin û her yek ji wan bi ciyekî ve çûn. Kesek ji wan di gund de nema. Erd û zeviyên wan ji Mala Zîver re man. Reşo firar bû û tîrsa wî li ser Mala Zîver hebû.

* * * * *

Tava payîzê li ber perên asîmanan silav dida axê. Germahiya havînê çûbû henikayî hatibû dewsa wê. Lê havîna derbasbûyî, germahiya xwe ne ji tavê, ji agirê ku ji devê çekan diçû hildida. Gundiyan benderên xwe hilanibûn û li erdê ji xeynî qirş û qalan pê ve tişteke nemabû. Çol tije ajal bûn, her der ji wan re mabû. Halbûkî di salên derbasbûyî de van çaxan millet tev cot dikirin. Lê gundiyan bandora bûyerê ji ser xwe neavêtibûn. Bi tenê çend gundiyan karê xwe dikir, çend gundiyan dinê jî li benda baranê bûn, lewra ku baran bibare wê ax nerm bibe û wê baş bê ajotin. Baran îsal para wî gundî neketibû û ji dewsa baranê hêsirên çavan ax şil kiribû.

Reşo jî nevalê derket û çû serê gir. Li ser kevirekî rûnişt û li rasta gund mêze kir. Rastek dirêj û fireh... Çend meh berê vê rastê, bi rengên kesk, sor û zer ve xwe xemilandibû û dîmenekî xweş bexşî mirov dikir. Zeviyên ceh zer, yê genim sor û ciyê çêrê jî kesk xweya dikir. Lê niha ji erdek virt î vala pêştir tu tişt nemaye. Rasta gund rasteke zehf mezin bû. Di dawiya rastê de çiya û di quntarên çiyê de çend gund xweya dikirin. Di ser gundan re çiya, di ser wan re jî çiyayekî mezin xweya dikir. Vî çiyayî bi esaleta xwe deng vedabû û bûbû ciûwarê Siyabend û Xecê. Ev çiya Çiyayê Sîpanê bû. Li ser çiya hinekî berf ji sala par de mabû. Wê berfê bi spîbûyîna xwe regekî dinê dida çiya. Li hember vê dîmena xweş Reşo vecinîqî, miin hate bîra wî. Tivinga xwe da ber rûyê xwe û ponijî. Mirovên ku kuştibûn yeko yeko di ber çavên wî re derbas bûn. Çend hêsirên xwe berda ser rûyê wî. Herî dawî kengî hêsir ji çavên wî hatibûn, nehate bîra wî. Gelo qet giriya bû? Wî jî nizanibû. Fikirî û ji xwe re got, "gelo ez bûme sedema hêsirên çavên çend kesî?" Ji berê ve ew firar bû, lê îcarê ne weke carên dinê bû. Vê carê gelek kes kuştibûn, vê

carê ji xwe re nedigot mêrxas. Dewletê jî ev çendeke ku mifreze derxistibû gundên derûdorê. Ji aliyekî dewlet, ji aliyê dinê jî yên ku wan kiribû dijmînên xwe li pey bûn. Dixwest ku ji van deran bi dûr bikeve, lê wê biçûya ku derê nizanibû. Bêhemdî wî axînek kûr ji dilê wî hat û ji xwe re cixareyek pêçand û vexist.

Riya wî gelekî dirêj bûbû. Ji dema şer û vir ve ketî û porê xwe kur nekiribû. Por û rî tev li nav hev ketibûn û ev çendeke jî ku birçî bû. Wî jî nizanibû ku ev çend roj in xwarin ne xwariye. Kesek di rê re jî derbasnedibû ku biçê pêşiya wan û nan ji wan bixwaze. Heger nan bixwesta jî divê xwe nedana naskirin. Lewra gelek kesî nifir lê dikirin. Heger wî nasbikiran dibû ku ew îxbar jî bikiran. Reşo li xwe nerî, li tivinga xwe nerî, li hespê xwe nerî... Xwest ku ji vê derê bi dûr bikeve lê taqeta wî nemabû ku rabe ser piyan.

Ciyê ku xwe tê de veşart ji aliyê gelek gundiyan ve dihat zanîn. Gundiyan gelek caran li wan deran nerîbûn lê kes nedidibûn. Her çiqasî Reşo car caran ciyê xwe diguhert jî, lê belê gelek caran ji neçarî dîsa dihat ciyê xwe. Navê ciyê ku xwe tê de vedişart, Kaniya Bêmiraz bû. Kaniya Bêmiraz her tim jê re bûbû sî û star, ew veşartibû, lê vê carê piştî xwe dabû Reşo. Jixwe navê wê derê bêmiraz bû, wê çawa bihiştî yekî weke Reşo tê de bimiraz bibe! Mala Zîver heyfa xwe ji Reşo nesitendibûn lê Kaniya Bêmiraz heyf jê dtend. Tiştên ku Reşo kiribû, xwezayê di pozê wî re tanî. Reşo jî gund, bi meşa hespê xwe, bi qasî çil pêncî deqîqeyî dûr bû. Li pêşberî wî çend gundên derdor xweya dikir. Kaniya Bêmiraz di newalê de bû û newal li jorê digihaşt hevdu. Li ciyê ku newal xelas dibû, li ser palê, girek ji zinaran heye. Di nav wan zinaran de çend şikeftên biçûk hebûn. Ji ber ku Reşo berê jî firar bû, xwe di nav van zinaran de vedişart. Hinek gundiyan jî navê wî girî danibûn "Girê Reşo."

Reşo bi mêrxasiya xwe jî nav dabû û wisa dihat naskirin. Hin kesan ew weke leheng, hinekan jî weke eşqiya didît. Ên ku weke leheng didît digotin, "çar gurgikên wî hene." Ji bonî wan kesan pîvana lejen-giyê, nişana mêrxasiyê "bi çargurgikbûn" ango bêtirsbûn bû. Wan kesên ku jê re digotin mêrxas, dibe ku qet mêrxas nasnekiribûn. Dibe ku navê Dewreşê Evdî nebihiştibûn, wî nasnekin. Mezinê me dibêjin, "li gundekî ji tunebûna mêran, navê dîk kirine Evdirihman..." Dibe ku ew jî wisa bûya. Lewra neheqî li xelkê kiribû û navê wî danibûn, mêrxas! Neheqî li gelek kesan kiribû lê navê mêrxasiyê diket pêşiya wan...

Reşo xîret kir, li hespê xwe siwar bû û berê xwe da gundê herî nêzik. Ew berê jî bi dehan car çûbû van gundan, lê îca divê bi baldarî tevbigeriya. Li vî gundî xizmên wî hebûn, lê neçû mala xizmên xwe. Lewra tirsîya û got, "ku ew jî weke Kaniya Bêmiraz

piştî xwe bide min, ez ê çi bikim?" Reşo êdî ferqkiribû ku nikare piştî xwe bide newal, gir, kanî û kesan. Ku zimanê xwezayê hebûna wê ji Reşo re bigota, "te ez bi xwînê avdam, ez ê çawa te xwedî bikim!" Reşo çû li ber deriyê malekê sekinî; pêşîn mal û derûdora malê sax kir. Mal mezin dixweya û hewşa wê jî mezin bû. Wisa dixwuya ku xwediyê malê dewlemend bû. Reşo ket hewşa malê, ji hespê xwe peya bû û hespa xwe bi koza pez ve girêda. Hal tê de nemabû. Bi awayekî bêhal xwe gihand ber deriyê ku diçe hundirê malê û li derî xist. Lawê xwediyê malê derî vekir û çawa ku wî dît veciniqî û piştî jî bi lez çû bangî bavê xwe kir. Xwediyê malê hat, lê niherî û dilê wî bi halê Reşo şewitî. Reşo bi wê bêhalbûna xwe fêhmîkir ku dilê mêrik pê dişewite, di dilê xwe de got, "ev ez bûm ketim vî halî." Mêrik qet deng nekir û ew hilda malê. Lawikê mêrik ê biçûk çû test û misînek av anî, ji bonî ku ew dest û rûyê xwe bişo. Piştî jî jê re xwarin anîn. Xwediyê malê fêhmîkiribû ku ew yekî firar e, lê qet deng nekir û ji xwe re got, "mêvan mêvanê Xwedê ye, ser seran ser çavan." Piştî xwarinê zêde mijûl nebûn, lê Reşo xwe da nas-kirin.

Roja din ber esirkî lawê xwediyê malê bi lez û kelecane keti hundir û got, "bavo mifrezeyê avêtiye ser gund û ber bi vî aliyê tê." Reşo bi lez û bez rabû ser xwe û got, "zû hespê min bînin!" Her çiqasî xwediyê malê got; bisekine em ê te veşêrin, em te nadin dest û tu dikarî xwe di goma pez de veşêrî jî ew qanîh nebû û dîsa hespê xwe xwest. Çûn hespê wî anîn, wî tivinga xwe kontrol kir, gule da ber devê tivingê û li hespê xwe siwar bû, berê xwe da deriyê ku derkeve derveyî hewşê û da çar gavan. Lê lêşker zehf nêzik bûn û wî ji nişkê ve hefsarê hespê kaş kir. Hesp sekinî û hindik mabî wî ji ser xwe bavêje. Berê hespê vegerand û di aliyê din re hesp ajot. Hespê xwe di ser dîwarê hewşê re avêt aliyê dinê. Hespa wî ew bi tenê nehiştibû lê lêşker zehf nêzikî wî bûbûn û gule bi ser de barandin. Reşo jî berê tivinga xwe da wan lê nedixwest neferan bikuje. Nişanî serbazekî kir û berdayê, ew di cî ket û mir. Lê ew bixwe jî birîndar bûbû. Ji her aliyê cendirme dihatin. Reşo bi nişanî bera yekî dinê jî da, ew jî da erdê. Bi dehan gule li Reşo ketibûn, ew hespê xwe deverûyê erdê bûn. Êdî hatibû dawiyê û nifirên xelkê qebûl bûbûn! Êdî Reşo nikaribû neheqiyê li kesî bike. Wî gelek xwîn rijandibû, lê îcarê xwîna wî dirijîya. Xelk hatin li ser cendekê wî kom bûn. Xwediyê malê got, "ew mêrxasek bû." Kalek ji wir de hat û got, "naxêr, wisa nîne, ew mêrxasekî çar gurgik e!"

***: Peyîn;** tersequl, qersequl, zibilê ku bûye toz. (Di vira de qûça zibilê ku bûye toz, ji bonî wê hatiye bikaranîn.)

Girtîgeha Kiriklarê /Îzmîr

Mirovê hemû deman

Nihayet TAŞDEMÎR

Di kûr û dûrbûna dîrokê de veşartî ye hemû wateyên pîroz. Pîrozbûn jî wateyên zanyara qedîm e. Her zanyarek çîrokeke wê/i heye, lê çîroka te ya hemû deman e.

Çawa hemû dem di jiyanekê de kom dibin, çawa dibe ku jiyanek di nava xwe de hemû jiyanan dihebin, ev jî nehêniya te ye ku di dîrokê de veşartî ye.

Me te di dîrokê de dît.

Tu di dergûşê de bûyî, li dora dergûşa te hemû xwedawendên pîroz, yekê nav li te dikir, navekî qedîm, yekê jî wan di guhên te de sirên xwe yên veşartî digot, li dora te bi rîtualeke pîroz werdigeriyan. Hava, dayika te ya kevnar di rûyê te de rêya te didît, rêya te û rêwîtiya te ya bi tenê, lê ew ê jî dizanibû tenêbûn herwiha xwediyê qedera xwebûnî ye, tenêbûn di fezayê de yekbûn e. Tu çiqasî mezin bibûyayî, tenêbûna te jî ewqasî mezin dibû, lê evîna te ya efsûnî, coşa te ya bi wate her tim bi te re bû...

Me te di dîrokê de dît.

Tu ciwan bûyî di nav şerekî bê nav de, te berê xwe dabû kê te pê re şer dikir û tu bi ku va diçûyî di destê te de çîrûskeke agirê Zardeştê Kal. Kengî tu bibûyî mêvanê wî û ku jî ser sifreya wî rabûyî, Zardeşt li pey te destên xwe bilind kiribûn ber bi rojê ve û gotibû; “hêviya min tu yî, min jî devê van nezanan, ji devê vê nezantiyê xelas bike...” Tu dimeşiyayî, na na tu direviyayî, her roj hezar salî mezindibûyî. Bi rastî jî tu çend salî yî? Dem li dû te mabû, meşa demê çima ewqasî giran dibû, li ber te nedihat zanîn çi dem e, kî yî, li ku yî!

Me te di dîrokê de dît.

Li bajarê Brahîm, li dewsa şopa lingên wî, şopa lingên te hebûn, tu dimeşiyayî li ser şopa Brahîm, te berê xwe dabû hemû frawûnên cîhanê, lê li pey te ne qebîleya te hebû ne jî karwanan tê. Tu bi tenê bûyî, li dû te bi çavên hêvî û tirsonek qebîleya te ya bînav, bîziman û bîdeng mabû. Tu dimeşiyayî di çolê de, wek yekî livqûm bûyî bi bayê re, dibûyî mîna bahozekê li hember nemrûdan... tu dimeşiyayî bi ber warê nemrûdan ve... Ew kî bû li ser rêya te? Mûsa!!! Mûsa bû, li çolê, li warê xwe yê windabûyî digeriya, te pê re hevaltî kir di bin azmanê bêsînor de, lê tu bi lez bûyî, meşiyayî ber bi rêya xwe ve...

Me te di dîrokê de dît.

Tu di nav cengî de bûyî, li aliyekî te Spartakûs

hebû li aliyê te yê dinê dengê bindestan, çavên Spartakûs tim li te bûn, ji bo te û wî dem tunebû; hûn di hemû deman de bûn... Tu dimeşiyayî ser axa kevnar, berê te ketibî warê pîroz... te Îsa didît li ser girê Golgotayê, tu ketî binê çarmixa wî; îro êdî çarmix li ser milên te ye.

Me te di dîrokê de dît.

Tu li cem Hallac bûyî, birînên wî derman dikir. Bedredîn ava heqîqetê dida destên te, te jî belav dikir. Te agirê ku pêsêran dişewitand dît û sekiniyî, lê te nikaribû bimeşî. Sira dayika te kete bîra te, cara yekemîn bû ku tu digiriyayî, te bi hêsirên xwe agir vemirand.

Me te di dîrokê de dît.

Tu li ser piştê hespekî yî, bi çargavan li Deştê Musilê di bezê de, Dewrêşê birîndar tavêjî pişt xwe û te berê xwe dida çiyayê Zagrosan, ciyê xwedawendan. Te Dewrêş li ber konê Êzdiyan peya kir û te bi Edûlê re strana Dewrêş digot...

Me te di dîrokê de dît.

Mezopotamya xemgîn bû, herdu çavên wê mîna ava Dicle û Firatê hêsir dibarandin, digot; “min rêwiyê xwe wînda kiriye, rêwiyê min î azadiyê, hêviya min î mezin windabûye. Dibêjin rêwî bê rê maye, rêwiyê hemû deman bi tenê maye...” dîrok pê dikeniya û digot; “Hê Mezopotamya, rêwiyê min tim bi tenê bû, bitenêmayin qedera rêwiyê min e, ew bi tenêbûna xwe rê ava dike. Roj kengî di bin siya ewran de windabûye, rêwiyên azadiyê kengî bê rê mane...”

Me te di dîrokê de dît.

Lê tu niha li ba me yî, li ser sûrên Amedê dimeşî, li derûdora te zarokên rojê xewna te ya dîrokî dijîn...

Tu dimeşî, em li pey te ne...

Girtîgeha Amedê

Navê te çi ye?

Kurdjan SORÎ

Ji bonî tiştêk ji tiştên din bê veqetandin an jî kesek ji kesên din were veqetandin, nav li wan tên kirin. Di zimên de cûreyên navan pirin, lê yên herî giring **serenav** in. Navên mirovan jî **serenav** in. Heta di nav serenavan de yên sereke navên mirovan in. Ji ber vê, di nav neteweyan de navê mirovan gelekî girîng in. Ji lewre **navê mirovan nasnameya wan e**.

Her mirov ewil, bi navê xwe tê naskirin. Paşê bi neteweya xwe, welatê xwe, ola xwe û hwd. Ji ber vê, ji mirovan re nav gelekî girîng e. Ji her neteweyan mirov, dema navan li zarokên xwe dikin peyvên watedar dibijêrin. Peyvên ku ji zarokên xwe re dikin nav, divê gotina wan xweş be, watedar be û di hişê mirovan de bimîne. Nav, li gorî demê û jiyana mirovan jî diguherin. Ev di çanda hemû neteweyan de heye. Mînak; di serdemekê de kesekî/ê lehengiye kiribe û gel jê hes kiribe, navê wî lehengi/ê di nav wê civatê de dibe weke modeyê û herkes navê wî/wê lehengi/ê li zarokê xwe dikin. Ev lehengên me, carinan kesên olî (wek pêxemberan, eshabeyan û zanyarên olî), carinan kesayetên siyâsî, carinan jî tiştêkî din in. Heta carinan navê van lehengan jî welat û neteweyan diborin û dibin navên navneteweyî û gelek caran wateya wan peyvên jî nayê zanîn. Îsa, Mihemed, Ernesto navê wisa nin.

Gel, çawa dayîn û standinê bi hev re dikin, ziman jî wisa dayîn û standinê bi hev re dikin û peyvên didin hev û ji hev distînin. Bi têkiliyên neteweyan, dayîn û standinê çêdibin û bi van dayin û standinan re, bivê nevê dayîn û standinên zimên jî pêk tên. Vê navê re navên mirovan jî, ji zimanekî tevli zimanê dinê dibin. Ev tiştêkî asayî (normal) ye. Ji lewra ne bi zorê ne jî bi xapandinekê derdikeve holê û têkiliyeke xwezayî ye. Ji ber vê jî di Cîhanê de tu zimanên xwerû anglo saf tune ne. Di nava her zimanî de teqez peyv û navên biyanî hene. Ev yek, ji zimanan re ne kêmasiye. Lê heke di nava gelekî de navên mirovan, zêdetir bi zimanên biyanî bin, di nava wê civakê de pirsgrêkek mezin heye.

Van salên paşîn, her çiqaşî di nav kurdan de helwest guherîbe jî lê hêca jî di nava kurdan de piraniya navên mirovan navên biyanî û bi teybetî jî Erebi ne. Ne hewceye bê gotin ku ev ne tiştêkî asayî ye. Heta em dikarin bibêjin; ji bo kurdan ev malxirabîyek e. Lê mixabin hêca jî gelek kes bi vê yekê nehesiyane.

Me got; NAV, nasnameya mirovan e. Mirov, bi navan hev nas dikin. Dema em navê kesekî seh dikin, reng û şêweya kesekî tê ber çavên me û di binhişê me de neteweyek, çandek û welatek cihê xwe digire. Ji lewra navê mirovan piranî ji zimanê wan tên. Her çiqaş navên navneteweyî hebin jî exlebeyê neteweyan, ji zimanê xwe peyvên dibijêrin û ji zarokên xwe re têxin nav. Mînak; dema em navê “Hans” seh bikin kesekî Elman tê ber çavên me. “Boris” Rusyayê, Ebubekir Ereban tîne bîra mirov. Ji lewra ev nav bji zimanê wan neteweya ne û ji wan miletan re bûne weke marqeyekê.

Weke me li jor jî gotî, mixabin di nav me kurdan de, navên kurdî zehf kêmtir in. Piraniya navên kurdan bi zimanê biyanî û bi teybetî jî Erebi ne. Ji ber vê jî em bi navên xwe nayên naskirin. Piraniya navên me; Ehmed, Mihemed, Eyşê, Zeynep û hwd. in. Exlebê van navan jî Erebi ne. Ji ber wê jî dema li welatekî biyanî, kesek navê me dibihîze vê pirsê ji me dike; Tu Erebi î? Piştî vê pirsê, divê em berfireh qala xwe bikin ku heta ew kes, me nas bike û bizanibe ku em kesekî/e kurd in.

Bingeha vê malxerabûniyê jî ev e; Di nav me kurdan de gotinek **“navê axretî”** heye ku tiştêkî bê bingeh û bê wate ye. Ji lewra, heke em li gorî baweriya Îslamê bifikirin; Xwedê hemî ol û netewe afirandine. Li cem Xwedê tu ziman jî tu zimanî ne girîngtirin û tu netewe jî ji tu neteweyan ne çêtirin. Bi tenê ji aliyê baweriyê û qenciye ve ji hev tên veqetandin. Ango ne Xwedê, ne jî pêxember ne gotiye navên Erebi li zarokên xwe bikin. Heke di Îslamê de tiştêk wisa hebûya, divê di wextê Pêxember de hinek nav hatibûna guhertin. Ji lewra gelek kesên ne Erebi, bawerî bi pêxember anîne û misilman bûne. Lê belê pêxember navên wan neguherandiye û navên Erebi li wan nekiriye. Demekî **“navê axretî”** derewek mezin e. Ji ber vê yekê, baweriya wan çi dibe bila bibe divê e her kurd, navên Kurdî li zarokên xwe bike. Qene ew zarok, dema mezin bibe xwe û neteweya xwe nas bike. Gelo we, kesekî erebi ditiye ku navê wî Zana, Ronî, Kanî, Şiyar an jî Rênas be? Yan jî di nav tirkên de gelo çend navên Kurdî hene?

Di vê mijarê de xalek dinê jî heye ku pêwîste mirov balê bikişîne ser wê. Di dayîn û standina navbera zimanan de, dema peyv ji zimanekî dikeve zimanê din, li gorî wî zimanî reng û dengê xwe diguherîne. Peyvên ku navê mirovane jî, vê

guherbariyê di hundurê xwe de dihevin in. Weke me li jorê jî got, ev peyvên ji zimanê biyanî (Erebî) ketine nav zimanên me, li gorî dengên Kurdî hinekî guherîne. Pêwîste ku li vê derê em ji van navan hinek mînak bidin;

Reseniya wan

Muhammed
Ebdellah
Huseyîn
Îsmail
Suleyman
Omer
Îbrahîm
Mahmûd
Aîşe
Fatîma

Di Kurdî de bilêvkirina wan

Miheme(d)
Evdila
Husên
Smaîl
Slêman
Emer
Brahîm
Mehmûd
Eysê
Fatimê

Em dikarin vê listeyê gelek dirêj bikin lê armanc ne ew e. Her çiqasî di van salên paşîn de qismek ji kurdan di vê mijarê de hişyar bûbe û bi xwe û navên xwe hesiyabe jî; qismek dinê heye ku ji berê xerabtir bûye. Ango navên Erebî li zarokên xwe dikin û ew navên ji Erebî ketine nav zimanê Kurdî jî li gorî reseniya wan dibêjin û dinivîsin. Ango nabêjin Evdila, Miheme û Brahîm. Bi temam li gorî bilêvkirina zimanê Erebî dibêjin: Ebdellah, Muhammed û Îbrahîm.

Vê jî têra wan nekiriye, navên Erebî yên tu carî li zarokên kurdan nehatin kirin li zarokên xwe dikin. Heta belkî Ereban jî ev nav li zarokên xwe nekiribin. Mînak; Hîra, Hîranûr, Esmanûr, Eleyna û hwd.

Pêşniyazeka min ji van kurdên me re heye; Bila Ereb navên zarokê xwe bikin Rojan, Zelal, Rênas û Çiya. Em ê jî navê zarokên xwe bikin Hecer, Cebel, Aîşe û hwd.

Encam; em bi destê xwe êgir berdidin mala xwe. Hêvîdar im ev agir zû vemire.

ÊLIH / 29 Rezber 2012

Folklor a Kurmancan

Mehmet Şirin FÎLÎZ


Ji demên kevnarê heta niha di bingeha wêjeya gelan de folklor heye. Bo nimûne di bingeha Romeo û Jûliet a Şekspîr de çirokeke gelerî heye û ev çîrok ji hêla çîrokbêjekî Îtalyanî Bandoello ve hatiye nivîsandin û bûyereke rasteqîn e. Folklor di pêşvebirina wêjeya gelan de xalekê herî girîng e. Di derheqê vê meselê de Vlademîr Propp wiha dibêje: “Folklor jêderka wêjeyê ye, folklor beriya tarîxa wêjeyê ye. Ji ber vê jî pêvîste ku tevahiya wêjeya gelan li ser hîmê folklorê were lêkolînkirin.”¹ Heke em mînanî Propp bifikirin pêvîste ku em wêjeya xwe li ser mîrasa xweyî gelerî ava bikin. Di derheqê vê meseleyê de Qanatê Kurdo wiha dibêje; “*Eşqereye ku wêje û zargotîna her miletî bi hevra girêdayîye, hevbendiya wan bi hevra heye. Zanyarên Kurd û kurdnas di xebatên xwe de dinivîsin, ku di tarîxa peydabûn û pêşveçûna wêjeya kurdî de zargotîna cimaetê (çîrok, hekyatên tarîxî, serhatî û serpehatiya merivan, beyt, kilam) kaniya wêjeya kurdî bûye*”². Bo nimûne ji bona Ehmedê Xanî destana Memê Alan ji bona Erebbê Şemo qehremaniya Kela Dim Dim bûbû çavkani.

Heke em îro berê xwe bidin folklor a kurdan em ê rastî dewlemendiyek bêhempa bîn. Folklor a kurdan gelek qedîm û dewlemend e. Ne ku ez ji bona propagandayê bikim wisa dibêjim. Ev rastiyeke. Lewra Heciyê Cindî di folklor a Kurmanca de wiha dibêje;

“*Xerîbên ku hatinê di Kurdîstanê re derbaz bûne, ewqasî li ser xwezaya wê ye bedew, dewlemendiya wê ya ser erd û binerd, xêr û bêra wê ecêbmayî mane, çiqas ji zenginbûn û nazîkaya ruhê gel, zargotîna wê bandor wergirtine.*

Eva deredevî du sedsala ne efsaneya folklor a kurdî ye dewlemend, di guhdariya rêwî, diplomat, mîsyoner, zanyar, rojhilatzan û pêşekzanên Cîhanê yên cûrbicûr da ne. Ev dinivîsîn, ku kurd wek gelekî qedîm, kevnar û xweyê tradîsyonên medeniyata ruhî zengîn, emekê xwe yî mezin kirine di nav dîroka pêşdaçûyîna medeniyeta gelên Asya navîn û şarîstaniya Cîhanê. Bi pesîn behsa zengînbûna civaka kurd, ya ruhî, kilam û reqasên wan ê gelerî dikin û wan di nav Rojhilata Navîn de ‘hêzeke kultur û rewşenbîrî ya bi qewet’ dinirxînin kîlîta vê hêzê di nav zargotîna wê yê zengîn da dibînin.”³ Folklor a kurmancan ne tenê ji bona kurdan bûye çavkaniyek sereke. Her wiha ev folklor ji bo netewên cîran jî

bûye çavkaniyek sereke. Heke em îro dêhna xwe bidinê di wêjeya Tirkî di, di muzîka Tirkî de, di sînemaya Tirkî de, di stranên Tirkî de em ê rastî kurdan û zimanê kurdan bîn. Bo nimûne Namîk Kemal dema “Vatan yahut Silistre” nivîsand çiroka Fata Reş ji xwe re bijarti bû ku ev çirokeke kurdan bûye. Yaşar Kemalê me ku şarezeya wêjeya Tirkî ye ji xwe re folklor a kurmancan kiribû malzeme. Jixwe muzîka kurdan tune be mirov nikare qala muzîka Tirkî jî bike. Gelek stranên gelerî yên kurdan hatine wergerandin bi peyvên Tirkî tîn xwendin. Celal Guzelses ku wekî Bilbilê Şerqê jî tê naskirin bi dehan stranên gelerî yên kurdan wergerand zimanê Tirkî ku ev stran êdî wek stranên Tirkî tîn zanîn. Ne tenê Celal Guzelses bi



dehan hunermendên vî rengî hene. Heta Super stara tirkan Ajda Pekkan straneke gelerî ku ji hêla hunermendeke kurdên Îranê ve Marjan(Mercan) hatibû xwendin a bi navê Kevirê Dil strandibû. Mirov dikare van nimûneyan zêde bike lê em ê li vir kurt bihêlin. Bi tenê em dixwazin bêjin ku em li ser xezîneyeke rûnîştine lê hayê me jê vê xezîneyê tune. Di berdila me de kesên biyanî li ser vê xezîneyê wêjeyê bêhempa ava kirin û dîyarî wêjeya Cîhanê kirin. Mohra xwe li ser folklora me xistin û kirin malê xwe.

Heyf û mixabin em xwedî li vê xezîneyê derneketin. Beravajî vê em ji bonî biyaniyan ketin pêşbirkê, di talankirna vê çanda me yî qedîm de. Hevce nake ku em bi nav bikin lê îro gelek nivîskarê me yê şareza ku bi eslê xwe kurdin bûne pîspore wêjeya Tirkî helbest, roman û çîrokê wan di nav wêjeya Tirkî de ciyekî giring digirin. Heta hinek ji wan qaşo xwe wek welatperwer dibînin. Lê ji bonî gelê xwe yê bindest bi zimanê Kurdî nikarin ne romanekê, ne çîrokekê ne jî helbestekê binivîsin. Xwe davêjin doşeka rehetîye û dibêjin ez bi Kurdî nizanim. Ê law hûn Tirkî dizanin Îngilîzî dizanin, keys bikeve Farisî û Frensîzî û Erebi jî dizanin, gelo çima Kurdî nizanin. Ev ne nezani ye, gotineke pêşiyê me heye ku dibêje 'nizanim rehetiya can im.' Lewra dema ku ew bi Kurdî binivîsin wê romanê wan çîrokê wan û helbestê wan neye xwendin û di nav gel de neyin naskirin û nivîsandina bi Kurdî tu şan û şohretê nade mirov.

Lê îro li ser me ferz e ku em xwedî li folklora xwe derkevin. Hela dev ji xwedî û nivîsandina wêjeya Kurdî berdin axaftina bi Kurdî jî hêdî hêdî ji holê radibe. Heta em nikarin Kurdî hinî zarokê xwe jî bikin, em mecbûr dimînin ku têkiliyê xwe bi zarokê xwe û bi malbata xwe û derdora xwe re bi zimanê Tirkî deynîn. Piştî çend gotinên Kurdî ziman vedigere ser Tirkî û bi vî awayî em dibin êsîrê zimanê Tirkî. Berî niha bi çend salan, kal û pîrê me hebûn, em bi saya wan hinî ziman û folklora Kurdî dibûn. Dema hûn li kêleka wan rûniştina hûn ê çend peyv û gotinên Kurdî û çîrok û çîrvanokan hîn bibûnan. J i ber wê ji min her dem dixwest ku ez li kêleka wan rûniştina û ziman û folklora xwe hîn bibûma. A niha ew kal û pîrên me hêdî hêdî serê xwe dîtînin ser axa sar. Roj tune ye ku ez xebera mirina kalekî temen dirêj nebi-

hisîm. Bi mirina wan em jî dimrim, zimanê me û folklora me jî dimre. Xwezî min hemû axaftin û gotinê wan qeyd bikirina. Lê mixabin hafizaya min jî bi qasî ya wan ne qewîye ku ez bibîr bînim peyv û gotinê wan. Birano, dostno, kalê me dimrin, zimanê me dimre û folklora me dimre. Hewceye ku em demildest li vê folklora xwe ya qedîm û dewlemend xwedî derkevin û dest jê bernedin. Ev folklora me yî qedîm di pêşvebirina wêjeya me de wê ji me re bibe bingeh û stargehek.

¹ Vlademîr Propp, *Folklor Teorî ve Tarîh, Weşanên avesta, r.26*

² Prof.Dr.Qanatê Kurdo, *Tarîxa edebiyata Kurdî, Weşanên Özgü, Ankara, 1992, r.21*

³ Heciye Cindî Emînê Evdal *Folklora Kurmancan, Weşanên avesta, r.26*

Ehmedê Xanî û banga tifaqa kurdan

Cengîz NAMO

Zanyar û fikirmendê mezin Ehmedê Xanî di van nivîsê xwe ye pîroz û bi niqûta pênuşa xwe ye zana de; bahsa neteweyekî belavkirî dike, qala parçebûna welat û warê kurdan û Kurdistanê dike. Ehmedê Xanî sînorê erda Kurdistanê di vê beşê de diyar û kişî me kurdan dike û nîşanî gelê kurd dike. Welatê kurdan Kurdistan, bê bi çî awayî û bi çî rewşê ketiye bin destê desthilatdariya rom(tirk)ereb û eceman, bi rastî Xanî baba li ser rastiya civaka kurdan a bê tifaqî û ya bê desthilatdariyê dinivîsîne, tesawîra xwe ya netewî didomîne û dibê eger ku hûn nebin netew-tifaqek ew ê herdem zilm û zext û zordariya evan miletên rom, ereb û eceman li ser serê we be û ew ê axa we Kurdistan bê dagirkerîn.

*Ez mame di hikmeta Xwedê da
Kurmanç-i di dewleta dinê de
Aya bi çî wechî bûne mehrûm
Bil cûmle ji bo çî bûne mehkûm*

*Bif-kir ji ereb heta ve gurcan
Kurmançî ye bûye şûphê bircan
Ev rom û ecem bi wan hesar in
Kurmanç-i hemî li çar kenar in*

Bi rastî Ehmedê Xanî teza xwe û tesawîra xwe netew-dewlet ji bo ku ava bike wî pir mînakên dîrokê di mejiyên xwe de honandiye. Ev mînakên yek jê teza Platon e ya ji bo yewnanan; a dinê jî teza Farabî ye ya ji bo farisan e. Platon di teza xwe ya navdar berhema 'dewlet'ê de; dadîbûn, leşkerîbûn, cotkarîbûn û karkerîbûnê wekî çînî diperijîne û dibêje divê ew hemû di hundirê pergalekê de û di tifaqiyekê de û di pêşengtiyekê de bi lihevkiyê aram, divê bêne meşandin. Angaştê Platon ya ji bo yekîti û tifaqa yewnanan li ser evan esasana hatibû lidarxistin.

Wekî dinê jî ji bo Rojhilata Navîn tezeke mînak a angaştê Farabî ya netew-dewletê bi pirayî ji pîrsa 'lijne û saziyên jor divê bi çî taybetiyan bêne avakirin' bi rê derdiket. Feylezof Farabî di teza xwe de, Xweda û desthilatdariyê niqas dike û alternatîf dihilberîne ji bo gelan. Lê belê Ehmedê Xanî li gorî feylezof Platon û li gorî feylezof Farabî hîn bêhtir bi serketiye, loma ji Ehmedê Xanî re mamoste Platon û mamoste Farabî bûne weke atolyekê û bûne materyalek dewlemend û xurt. Ehmedê Xanî jî xwe û fikr û ramanên xwe li ser van esasan hîn bi hêz û xurtir dike. Di dîroka cîhanê de hin nijadan, hin

miletan, hin neteweyan bi hinek şexsiyeta bi hinek kesayetan û bi hin pêşengan civaka xwe carinan ji hêla olî carinan ji hêla şer (pevçûn, şûr û çek) ve, bi yekîti tifaqek ava kirine û kirine netew-dewlet. Lê belê Ehmedê Xanî bi zanebûn evan tîştana hemûyan tîne ziman û bang î civak û gelê kurd dike û ji civaka kurd re dibêje; 'we çava ji van gelan û civakan îbret û mînak ne girtiye.'

Ehmedê Xanî bi derd e....Ehmedê Xanî bi kul e....Ehmedê Xanî dilê wî li ax û erda kurdan, li war û mîrateya kurdan li BOTAN diqîre.....

*Wan girtî bi şîrî şehre suhret
Texsîr kirin bîladê hûmnet
Her mîrekî wan bi bezlê hatem
Her mîrekî wan bi rezmê RUSTEM*

Dema mirov li dîroka bihurî ya kurdan dinihêre pêşengên wekî Selahaddîn Eyyûbî bi navdar derketine. Llehengekî wekî Rustemê ZAL di nav civaka wan de gihiştîye. Lê belê ji bona xwe kurdan û civaka xwe kurdan şer nekirine û hewld nedane. Ev jî weke kêmasiyekê di dîroka kurdan de cihê xwe girtiye. Pêşeng û lehengên kurdan û civaka kurdan desthilatdarî tu carî pîroz neditine û bi van fikrên xwe yên belavkirî û bê tifaqî; di kesayetan wan de gelê kurd vinda kiriye. Dema ku dilê Selahaddîn Eyyûbî û dilê Rustemê ZAL weke dilê lehengên kela DIMDIMÊ Şêro û Dosto biavêta wê demê ew ê axa Kurdistan belav nebûna û ew ê Kurdistan biviya AZA û ALA... Baba Xanî dibêje ku van şexsiyetana ji bo xwe kurdan nebûne çek, herdem ji bo mîletên din bûne çek...wêjekarê mezin û hêja û abadîn Dostoyewsky ji bo destgirtina desthilatdariyê dibêje 'ji bona mirov desthilatdariyê bistîne divê mirov hewld bide û bi zahmetî û destgirtin û destgirtina desthilatdariyê bike.'

Ehmedê Xanî di nivîsa xwe de dibêje; kurd cara ewil cara yekem di sala 1639'an de bi peymana Kasrî Şîrîn hatine du parçekirin û kurd jî bi vê du parçekirinê di navbera du otorîteyên desthilstdarên hov û hovane mane û vîna jî ji bo na gelê kurd bêavantajiyek mezin e. Disa zanyar û zanistê bê pîvan feylezof Ehmedê Xanî bi nivîsa xwe pir baldare û balê dikşîne ser vê xeta ku jêr dibên SERHAD, gelê kurd li vir li ser vê xetê bi eşîrên biçûk û bihêzên biçûk dijîn û ev jî ji bo na kurda qelsî û lewazbûnek e.



*Her du terefên wan qebîlê Kurmanc
Bo tîrê qeza kirîne armanc
Goya ku li SERHADAN kilid in
Her taîfe seddek in sedid in*

*Ev qulzemê rom û behra tacîk
Hindî ku bikin xurûc tehrîk
Kurmanc-î dibin bi xwîn mulettex
Wan jêk dikin mîsalê Berzex*

Dîsa zanyar û feylezof Ehmedê Xanî di nivîsa xwe de behsa neteweya îranê sînore wê diek, bahra tacîk nîşan dide. Osmaniyan sînore wê umana romê nîşanî me dide û sînore û tixûbê mekana û maka kurda ji SERHADA bilind heta Derya Sor (Kizil Denîz) nîşanî dide. Ev nîşan jî Ehmedê Xanî belasebep neaniya ziman, bi vê nîşanê bal dikşîne ser lehengên gelê cihû û Nebî MUSA....Weke em dizanin dema Nebî Musa li çola Sîna pêşengtî ji civaka cihuyan re dikir li Rojavayê Nebî Musa zilimkar Fireûn Ramses cî girtibû. Li rojhilatî Nebî Musa Hîtîtan bi artêşa xwe ve alîkarî bi Fireûn re dikirin. Di vê rewşa zor û zahmet de Nebî Musa ji bona civaka Îbranî yê cihû bû hêvî û civaka xwe ji vê aloziyê rizgar kir û wan ber bi axa waadkirî ya

pîroz meşand û axek netew –dewlet diyarî civaka xwe kir. Zanist û fikirmendê mezin Ehmedê Xanî bi lewnekê, xwe û civaka xwe kurdan û axa xwe Kurdistan dişibîne cihûyan û rewşa civaka kurdan dişibîne rewşa civaka cihuyan. Baba Xani li ser evan esasana peyitandin û analîzê xwe vediçirîne. Ehmedê Xanî di van peyitandinên (tespît) xwe de nexweşbûna kesayeta civak û gelê kurd dibîne û dixwaze bawariyekê bide gelê kurd û rewşwenbîr Xanî bi rêbazeke jêre dibêjin bi (zimanê tibbî) li ser civak û komela kurda pisîkoterapî bi kar tîne.. Ehmedê Xanî dema behsa axa Kurdistanê dike hundirê wî dişewite. Xanî di banga xwe de SERHAD nîşanî me dide û xaka Kurdistan ji vir ve hetanî Derya Sor dide nîşan. Wekî hûn jî dizanin Derya Sor mekanê Nebî Musa ye û ev kesayeta girîng û bêhempa di dîroka mirov û civaka de ciyekî giranbûha digire. Wekî hûn jî dizanin Nebî Musa li hemberî zilm û zordariya Fireûn yekîtî û tifaqa Esrael û cihuyan kire armanc û bû pêşeng û gelê cihû ji bin zilm û zorê derxist û wan gihand axa pîroz ya waadkirî. Ehmedê Xanî evan tiştana gişan bi zanebûn nîşanî me dide, serhad weke sînore û mejiyê Kurdistan tê hesêp û Xanî di despêkê de bi lêv kirina navê SERHAD bilindbûna axa û kesayeta kurdan nîşanî me dide, piştî jî li dilê Kurdistanê CIZÎRA BOTAN sêwira xwe yî bi motîfên kurdewar xemilandî dide listandin... Parçebûn û belavbûna axa û erda Kurdistanê dilê zanistê me baba Xanî diêşîne. Ehmedê Xanî bi dengê xurt bang li me dike û dibê werin lehengên kurd, rahêjin şûr û çeka û têkevin dilê pêşengên gelên xwe Rustemê ZAL û Guhderz û bibin parastvanê ezman û erda welatê xwe û werin em ev erd û axa pîroz bi hev re bi tifaqê biparêzin û AZA bi kin.

Ehmedê Xanî ji her hêl û bergehê xwe ve netewî ye... Ehmedê Xanî ji feylezofên din yê sêwirandina civak, netew-dewletê weke Pilaton weke T.Hobbes weke J.J.Rousso cuda ye. Ji ber ku ev kesayetana dema sêwirandina xwe û angaştê xwe afirandin û xulikandin tu car sînore gelekî, tixûbê civakekê û sînore netewekê nîşan nedan, lê zanyar û fikirmend Ehmedê Xanî; bi şênberbûn sînorekî, axekî, erdakî û gelekî nîşanî me dide û di mejiyê mirov de aşopiyek Kurdistanî diafirîne... Em jî vî tiştî weke zedekbûna bêhempabûna seydayê mezin Ehmedê Xanî dibînin.

Em dîsa weke niştecihên Kurdistanî em dibê sed cara şikir û spas ji pênûsa te ye pîroz seydayê mezin û bêpîvan EHMEDE XANÎ....

Ro bû sî li Roboskê

Songul KESKÎN

Ro, di tariya şevê de
 Xwe di paşila sî û çar CANan de veşartibû
 Germahiya xwe, dabû wan canên ku di sermeyerke qeşa de
 Bi rê ketibûn,
 Bi rêya qaçaxê,
 qaçaxa ji bo pariyek nan,
 ne qaçaxa ji ax!
 Ro bû sî,
 tarî bû her der, rê tarî
 Di rêya sinorên parçekirî de
 hêstirên wan, ji sermayê hêstir dibarandin
 ji çavên westiyayî
 Awirên wan hestiyar bûn, mîna ku ji bêzimanî
 bi çavên xwe peyameke bêyomî nîşan bidin.
 Lê kê bi wan dizanî...
 Ro bû sî û çar can
 Canê ku hîn temenekî dirêj ma nîvco
 Di devên qirêj de hate cûtin temen
 Temenê dirêj ma nîvco
 Bi bomberanan hate qurtandin temen
 Ev jî çarenûsa sî û çar canan bû qey?
 Çarenûsa ku ji destên Xwedayê dewletan ve hatiye nivîsandin.
 Hewaara, sî û çar caran hewar!
 Di xaka JANZA de dîsa
 Sî û çar Jan za...
 Can kuştin, Jan za...
 Ro bû sî
 Ro kete dilê sî û çar canî
 Sî ket rê, bû tarî
 Berf dibariya
 Piştî jî bombe barandin bi xayînî
 Bombe barandin, ên hezar lehnet li wan..!
 Bombe barandin, firiyan qijalkên birçî û bêyom
 Çarenûsa xwedayên xwe yên bêol anîn cî!
 Ro kuştin, ro bû sî,
 Tarî bû her der di berfa spî
 Sî û çar can,
 di tariya şevê de, bi hêstirên xwe re ketin ser axê.
 Axa sar û qeşa heliya
 Ro, li Rojhilat hila...
 Can rohnî bûn hîn
 Hîn hêstirên wan hêstir dirijandin
 Hêstirên bi xwîn...
 Meh meha Kanûnê
 Roj roja qanûna qirêj a xwedayên bêol!
 Berfanbar bû meh
 Berf dibariya bi xwezayî
 Bombe dihatin barandin bi gunehî!
 Ro, bû sî, li Roboskê
 Sî û çar Jan zan,
 di dil de bûn girî...
 Bigirî ROBOSKÊ, RO BÛ SÎ..!

28.12.2012/Girtîgeha Karataşê-Edene

Belgên hişk

Jacques PREVERT

Wergera ji Fransî: Şiyaro

Min çiqas hez dikir bê bira te,
 Ew rojên bextewar dema em hevalên hev,
 Wê demê jiyan îro xweştir û roj îro geştir bû.
 Belgên hişk her der girtibûn
 Tu dibînî min hêj ji bîr nekiriye,
 Belgên hişk her der girtibûn
 Bîrhatî û poşmaniyan jî.
 Û bagera bakur ew hildan û birin,
 Li nav şeva sar ya jibîrkirinê.
 Tu dibînî min hêj ji bîr nekiriye,
 Strana te ji min re distêra.

Ev stranek wek me bû,
 Te ji min hez dikir min ji te,
 Em bi hev re dijîn,
 Te ji min hez dikir min ji te,
 Û jiyan ji hev diqetîne aşiqan,
 Hêdi hêdi û bêyi teqereq
 Pêlên behrê ji ser xizê dibe
 Dewsa piyên aşiqên ji hev veqetiyayî
 Em bi hev re dijîn,
 Te ji min hez dikir min ji te,
 Û jiyan ji hev diqetîne aşiqan,
 Hêdi hêdi û bêyi teqereq
 Pêlên behrê ji ser xizê dibe
 Dewsa piyên aşiqên ji hev veqetiyayî

Belgên hişk her der girtibûn
 Bîrhatî û poşmaniyan jî.
 Lê evîna min bédeng û dilpaq
 Diçurise her dem û spasiya jiyanê dike
 Min ji te hin hez dikir tu hîn delal bûyi,
 Çima te divê ku ez te ji bîr bikim?
 Wê demê jiyan îro xweştir û roj îro geştir bû.
 Tu hevala min a herî xweşik bûyi
 Lê tenê poşmani man ji bonî in,
 Û wê strana te distêra
 Her dem li ber guhên min.

Bersivên Xaçepirsa Arjen ARÎ:

1)D 2)A 3)C 4)B 5)C 6)C 7)D 8)C 9)B 10)A 11)C 12)B 13)B 14)A 15)A